

HELBEST

MELA EHMEDE PALO



**DEWR Û GERA
KURDISTANÊ**

DEWR U GERA
KURDISTANE

MELLE
EHMEDE
PALO

2000

1994

BERGEH. REŞİD HESSO

DERHÊNAN MEHMÛD HESSO

Bi navê xwedayê diloan û mihrîvan

Bi nav û dengê mela Ehmedê Palo kurê Muhemed Mustefa levrîstarê kurd di hêla bajarê Palo, koka çiyayê Sipî, gundê Sêra Çûr, êla Kemalan ji dê û bavekî kurdê diloan û dilxwaz di 1920 ê zayî de ji tarî û nexweşiya tarîstanê berê xwe daye xweş î û ronahiya cîhanê, çawa ku ristên jêrîn wiha didin zanîn:

Di pê hezar û nehsed û bîstan

Min ji diya xwe ber daye bîstan

Gula baxê min di hingî geş bû

Bextê gelê min ne qenc û reş bû

Lê sed mixabin bav û dê herdû li ber çavan winda bûn, bi dîna wî şa ne bûn ma sêwî ji dê û bavan, li ber destê dapîr û apan:

Bavê min çû bû cenga kufar

Serbâz û leşker ji bo neyara

Min ew ne dîbû derdê dilê min

Jê bê xwedî bûn bax û gulê min

Piştî sê salan diya min diçû

Ez hiştim sêwî li ber dar û tû

Xuya dibe ku ji 1923 – 1932 an pir belengazî û perîşanî dîtiye çiko wî bi xwe goti ye:

Jar û belengaz, pêxwas û tazî
Nîne ji bo min hawar û gazî
Xeman didêrim, kulan dihêrim
Bê bav û bê dê dor xwe dinêrim

Pîştî çaxekê hinek ji hevalan ew xapandin ji cihê bav û bapîran da qetandin û anîne bajarê Siwêrekê, û apê (Xalid) da ser şopê û girtin vegerandin malê, lê carekî din ji ber lêdanê bi çolê ket û hew wêrî bû ku vegere:

Rojek ez rabûm berê min li jêr
Dilê min bi tirs, destê min li dêr^(*)
Ketim newal û kortal û cala
Zinar û devî, hevraz û pala^(*)
Diçim ser darê gava dibî şev
Pelê darê ez li xwe didim hev

Imrê wî li dewra «15» salî riya dûrî girtî ye î pêxwas û birçî tê de berjêr bû ye ji vir û ji wir heya gihiştî ye zevî yê^(*) Sûrî, bi perîşanî paş vegeirî ye, serxet bû ye û çûye bajarê Mêrdînê û nexweş ketiye li dor du mehan li nexweşxana Mêrdînê ma ye:

Gihome Mêrdîn ketim nexweşî
Can û dilê min tali dinoşî^(*)
Du meh li ser hev li wir dimame
Li rasêrê min toz û xemame

Ji nexweşxanê derketîye û di 1935 an de binxet bûye ji Derbasiyê hatîye Qamîşlo û ji wir hewaketiye û çûye Wêskê û bûye sivan. Di 1937 an de berê xwe daye xwendinê her weku dibêje:

Ketî dilê min herim bixwinim Kula dilê xwe de ez hilînim

Û çûye Xizna û ketiye Hucra feqiyan û wek meleyên kurdan
xwendina xwe xelas kirîye lê divê çaxê de pir dildarê zimanê kurdî
û farisî û toredarî û ristari bû di 10. 9. 1946 an de nûşokî^(*) danî û
jina xwe tanî:

Çûme Wêşikê ketî dilê min Daku xuya bin bax û gulê min
Nûşokê dênim bibim xwedî mal Bo xwe vejînim nêroz û sersal

Di 10. 9. 1948 an de derketîye melatî û ji wir û pêva dest bi
ristên kurdî kirî ye û li ser welatparêzî û mafê kurdan çend pirtok
û dîwane çekirine yek ji wana eve «2» ku binavê DEWR Û GERA
KURDISTANÊ ye xuyaya bi guman û tefkîr du geran di nav
Kurdistanê gerîyaye:

1 — Gera welat çawaku dibêje:

Carekê hatî gumanim dakevim warê biha^(*)
Ka gelo ez sermiyanim ew gula qad û ciha
Da bibînim warê bava rind û şêrîn û delal
Ronî daye rengê tava hêrik û deşt û newal^(*)

2 — Gera nav gele:

Min berî da warê şêrîn da bizanîm qenc û baş
Jîr û serbaz û hunerçîn rî dirêj û ser bi şaş^(*)
Bê felat û jar û xemgîn girtî yû hov û qeraş
Pate xwar û dûv û bê dîn pîs û murdar û kelaş

Di sakarî û zimanê kurdî de jîr û serbest xuyaya çawa ku ji
ristên wî tê zanîn û hem xuyaye ku pir pirsê cihê kurdan kirîye:

Gund bi gund û hêl bi hêla şehr û bajar û civat^(*)
Gol û derya cok û pêla Dicle û ava Furat

ji ber doza kurdîti û welat parêzi şeyx û melayê kurdan neyarîya wî dikirin lê ew bi xwe bêtir pêş diket û bi dilekî paqij di hat meydanê ji dozê paş ne diket:

Hingî ta niha min qêr û denge	digel tembelan halan û cenge ^(*)
Kîne bi nêre dibîni tevan	ronî ne dîne liempari şevan ^(*)
Koma kevnokan benda xwe danin	puşt û bê kokan riya xwe tê dîn ^(*)

Nemaze gava ku givika şeyx û melan 9. 5. 1957 ê zayî bera ber bi 1376 ê koçî bi destê E'bdilHemîd Serac di Cizîrê de hate çekirin hingî mala şex Ehmed doza pêgirtinê lê dikirin lê wî xwe jê dida paş û ne bû heval çawa ku komela Ixwana û hinên din berge li pêşiya wî vegirtin ji ber ku didîtin karê vana ne ji bo kurde, lê gava ku komela (zanistî û alîkarîya kurd) di 1955 an de hate çekirin wî xwe gihand wan û tede hate hîlbijartin libat.

Saleke du wiha dirbaz bûn komelê karê xwe sekinand dixwest ku bikevî Partî lê hevalan ne hişt dûra Partî hat parçe kirin jê û virde bi gora bîr û bawerên wî tu kes karekî paqij û hêja nake ji ber vê ne xwest ku bikevî tu komelan:

Komelî	dolar	û	dînar	madine	kurd	û	welat
Rûpelê	pirtok	û	kovar	xistine	ar	û	şewat
Ez	dibînim	inê	sê car	têne	der	xîzê	neyar
Tîpê	kurdî	mane	bê kar	qet	xuya	nabin	ji war

Çawa ku karê melan didîti ji bo nan:

Parsekan	kîsê	zikatê	dîtime	nabin	xuya
Ta	hebin	nakin	xebatê	ketne	benda gundiya
Ber	derê	pîrê	beratê	wek	pepûk û sêwiya
Çêdikin	kom	û	civatê	jê	dibînin xweşiya

27. 4. 1981 ê zayî.

P. Zerwan

GERA WELAT

Di 5. 2. 1975 an de hatîye çêkirin.

Carekê hatî gumanim Ka gelo ez sermiyanim Ya hejar û bêxudanim Raserê çol û çiyanim Dicle û ava Furatê Jor û hevraz û kelatê Senger û derbend û latê Merkez û kom û civatê Da bibînim warê bava Ronî daye rengê tava Her dem û dewran û gava Kungera kar û delava Hêdî hêdî ber bi gundan Her dibînim mar û kundan Xênê ser şaş û qulingan Ber bi derbend û zivingan Rengê dîna ez dinêrim Tu dibê qê ez newêrim Koh û berpâl û zinêrim	dakevim warê biha⁽¹⁾ ew gula qad û ciha? mame ber tîrê ziha? bende warim nagiha ku diçin warê neyar⁽²⁾ cîgehê ceng û hewar şop û rêçê burc û xar pehlewani û xwendewar rind û şêrîn û delal⁽³⁾ hêrik û deşt û newal jê derin avê zelal gewher û dur û lual daketim mame tenê⁽⁴⁾ tu mirov tê nabê hê hatine hev xîst û kê bê gumanê da ye rê dewr û madorê welat⁽⁵⁾ xwe bigînim rohelat? tev dibin ar û şewat
--	--

1— War: welat. Qad: zevî û meydan. Hejar: feqîr û belengaz. Ziha: ejdeha marê mezin. Nagiha: niha û naka. 2— Hevraz: berwar û jor. Ceng: şer. Senger: asêgeh. Burc: qesir û kelat. Xar: şikeft û mixare. Hêrik: girên koka çiyande. Kungêr: merkez. Delav: deriyê avê. Lual: yaqût û morik. 4— Kund: wêranker. Key: dax. Ziving: şikeft 5— Mador: hawîrdor. Rohilat: şoreşa kurdî. Koh: çiya. Zinêr: zinar. Dilêr: mêr û gernas.

Ger çiqas şêr û dilêrim
Pêlekî ber bi zinara
Berqef û gor û mezara
Şîlê bax û dehl û dara
Çir tenê mame di para
Xulxula avê çemane
Ez dibînim bê xudane
Colê pez tev çolê mane
Leşkerê dijmin xuyane
Bêrivan kanî li kûye
Kes tunîne bêjî dûye
Dewra min burkan vebûye
Ew dema kevnare çûye
Cok û kanî mêrg û zozan
Hêrik û derbend û meydan
Ê ku jêne mane bê nan
Herne kû jar û perîşan
Erdê çolê tev beyarin
Dijmin û bêcî li karin
Êrîş lêdan û xaran
Ejdehak û koremarin

her divê kar û xebat
sirt û kendal û devî^(*)
kort û koncal û kevî
tûmê ser erd û zevî
nîne dad û wek hevî?
pel ji dara hilweşîn^(*)
bê civat û bê civîn
bêrivan ber derd û şîn
tev xudanê zor û kîn
qet xuya nabî şivan?^(*)
jar û bindest û nezan
vane em navê diman
ev dema topê giran
bê sewal û koç û kar^(*)
kungera hov û dewar
par û pişk û tar û mar
dîlê destê koledar
bê berin bistan û dar^(*)
raserê lat û zinar
bê hedan û bê qîrar
bo me Kurda bendewar

1— Pêlekî: demekî û çaxekî. Sirt: ji serê çiyayê asêre tê gotin. Kendal: kort û newal. Devî: newalên kûr û teng. Berqef: ber mîna û ber talde. Gor: tirb, mezar, mezel. Şîlê: dar û şînahiyên ku nû diçînin. Tûm: kokê giya û daran. Zevî: erd. Dad: edalet. Col: kerî. Bêrivan: pezdos. Xar: êrîş. Qîrar: tebat. Ezdehak: ziha û marê mezin.

1— Ber: kevir û mêwe. Sernexûn: ser tewîn. Felat: rizgarî. Xar: şikest û mixare. Koh: çiya. Bend: berberî. Senger: burc û asêgeh. şermisar û fîhêt ker. Bendexan: zindan û heps. Ziyan: zirar. Vejîndar: welatparêz û jînkaren welat. Berwar: hevraz. Êl: qebîle. Gurc: sipehî ji kurd hatiye çêkirin. Narîn: delal. Qeşeng: xweşik. Derya: behir. Robar: çemê mezin.

BER SIFA WELAT

Di 3. 4. 1973 de saz bûye.

Di vê levrîstê de levrîstar û welat bi nîşana (r) û (w) dikevin pêsîra hev û kul û derdê hevdû didin xuya kirin.

P: Ez dibînim dar û ber tev
Bê ziman û zar û bê dev
Ka gelo ez mame der şev
Ku hemî pevra dîkin rev

Teq teqa derbend û xara
Gum guma koh û zinara
Qêre qêr û zare zara
Gazî yû deng û hewara

W: Rê nen as û bê civatin
Senger û burc û kelatin
Pehlewanê ro hilatin
Bo xebata xwe ne hatin

Dost û yarê cî sitanin
Şopgerînên dijminanin
Girtî yû der bendixanin
Hin diz û hin sermiyanin

P: Kanî ew mîrên vejîndar
Ew kelat û çol û berwar
Êl û bavik, gund û bajar
Av û derya, gol û robar

ser nixûn ser bi jêr^(*)
bê hejîn hêre hêr
bê felat û xeyr û bêr?
ber kelat û ber zînêr

çik çika dar û kevir^(*)
tê xuyane bend û cîr
pîr û kal û hûr û gir
jê diçûne bir bi bir

dûv û destin bo neyar^(*)
ser sînora bendewar
roja tengî zû hewar
her xuyane şermisar

pesnedarê bê ciyan^(*)
çê din xaçe rîyan
xwe didin ber hîviyan
darê pevçûn û ziyan

rengê Ristim dane deng?^(*)
dehl û baxê rege reng
gurc û narîn û qeşeng
leşker û salar û ceng

1— Ber: kevir û mêwe. Sernexûn: ser tewîn. Felat: rizgarî. Xar: şikeft û mixare. Koh: çiya. Bend: berberî. Senger: burc û asêgeh. şermisar û fihêt ker. Bendexan: zindan û heps. Ziyan: zirar. Vejîndar: welatparêz û jînkarekî welat. Berwar: hevraz. Êl: qebîle. Gurc: sipehî ji kurd hatiye çêkirin. Narîn: delal. Qeşeng: xweşik. Derya: behir. Robar: çemê mezin.

P: Şoreş cengarê Kurdan
Dîtin û hevdîn û serdan
Tevger û hîn û xeberdan
Dar û arê êş û derdan

Xwende û zana û rêber
Şer û rimbaz û dilawer
Pîlegêrê kar û tevger
Ka xuya nabin sera ser

W: Tev bi destê te diçûne
Vane ber tofan û dûne
Malikê dijmin vebûne
Ejder û kevnar û lûne

Kanî kevnarê meçîta
Xwe dixin rêza egîta
Bende bazê ser şerîta
Destik û dildarê şîta

P: Dêr û camî rê ne nasin
Reş diboş û ser bî şaşn
Parsekê nanê belaşin
Her wekî qîrê tewaşin

çê dibûn, winda dibûn^(*)
nav gelê me radibûn
bê xwedî ber ba dibûn
Ka çilo pêda dibûn?

jîr û ristar û şiyar^(*)
bo welatim kar û bar
kom civînê gund û şar
ser pelan û ser hezar?

ber bi nalîn û girîn^(*)
bende warê derd û şîn
lê bi navê ol û dîn
em dimane dil birin

tewbedar û rî dirêj^(*)
hûr û gir tev kirne gêj
tim dîkin pars û nimêj
radîkin gend û qîrêj

ê ku têda bê hişin^(*)
toleê gan û kisin
hê bi kîn û qayişin
nalenal û fişîşin

1— Şoreş: şer. Cengar: şerker. Hîn: zanyarî û zanstî. 2— jîr: jihatî. Ristar: şair. Dilawer: gernas. Pîle: tevdir. Şar: bajar. Seraser: Hemî. Ser hêz. 3— Tofan: baran û lehî. Ejder: marê mezin. Lû: rovî. 4— Meçît: mizgeft. Egît: pehlewan. Şit: pîs û kirêt. Gend: gemar. 5— Dipoş: lixweker. Gan: kutan. Kis: quz.

P: Vaye koman tene cem pîr
Hin bi qeyd û hin zincîr
Bê ber û zanîn û tevdir
Darê dijmin emê bergîr

W: Ez dibînim ew dibêjin
Pirs û gotara dirêjin
Dilgamar û dil qirêjin
Gotinê vala dibêjin

Qê bi çavê dil dibînin?
Nik me ew pîr har û dînin
Ser tewîn û ser hejînin
Nejdî yû hem komirçînin

P: Destê xwe nade şewatê
Tête mizgeft û civatê
Cem xwe dertine beratê
Xweşiya kar û xebatê

Gel dihiştî tengezarî
Dûv û destê koledarî
Ronî rakir tarî danî
Her wekî dîna dizarî

ka tu havil dîtiye?^(*)
ser dilê wan girtîye
ew peyar û mihdîye
hê hewar û hîvîye

em diçin erşê mezin^(*)
bê welat û bê rezin
rengê Tat û Çerkezin
bê felat û bê dezin

seyd û nêçîrê dîkin^(*)
gerçî navê çikçikin
filê ser text û dîkin
tevda rengê lalîkin

agir û dar û ziyan^(*)
rengê şah û sermiyan
dad û destûr û rîyan
xistî bin dest û piyan

bê dibistan û sera^(*)
pesne darê qeşmera
bendewarê ker kera
deste gêrê nokera

1— Pîr: şeyx. Havil: feyde. Peyar: mihdî. 2— Gotar: gotin. Felat: rizgarî. Dez: degeh. Nik: cem. Har: serxweş. Komirçîn: Tîrk. 3— Zîrar. Dad: edalt. 5— Gel: millet. Tengezarî: perîşanî û belegazî. Dibîstan: mektebe û xwendgîh. Sera: cihê ronîştina serokan. Dûv: tîrî. Dest: hevalbend. Kerkere: serserî. Nûker: dûvik.

W: Ma tu nabîni cihanê
Pê ne zanîn û gumanê
Te dibe ber dest û xanê
Ew ji dil kundê zamanê
Cenet û baxê bihiştê
Te dixê dîr û kenîştê
Arî kar û dest û piştê
Çê dike hefsar û listê

P: Mame ber palê dinêrim
Kavil û kox û zinêrim
Tevrik û engaz û bêrim
Balte û torzîn û kêrim
Xaniyan vala dibînin
Ew ne mane ez ne dînim
Ez tenê bê cî dimînim
Ta wîhabim dil birînim
Ez ji dar û ber dipîrsim
Ger çîqa ez pîl û gîrsim
Nav giya û qal û qîrşim
Xincer û şîmşêr û tîrsim

ka gelo wek heye? (*)
tu hejar û ew keye
hê vejîndarê te ye
gor nebaş û şaneyê
xizmet û karê wîye (*)
hê ji bo te hîviye
bes ji bo xwe dîtiye
tu nizanî ev çîye
rast û çep, dûr û dirêj (*)
tevda bê gotar û bêj
toz û zingar û qîrêj
nav lepê sersam û gêj
ka xwedî mane li kû? (*)
hûr û gir tev dane dû
ber dek û lêdan û tû
ber birûsk û ar û dû
bo çî hon mane tenê? (*)
nayê min dengê herê
bendewarê kewserê
mane der koxa kerê

9 1—Ma: gelo û qê jibo xwe berxistne. Hejar: feqîr û belengaz. Keye: mezin. Vejîndar: saxker. Kund: wêranker. Gornebaş: gorvedok û kefen diz. Şane: ê ku bês distîne. 2—Cenet: buhişt. 3—Kavil: şikêr. Ziner: zinar. Gotar: gotin. Pêjhiş. Engaz: alet. Tewrzin: qazme. Sersam: hov û serserî. 4—Dek: xap û hîle. 5—Pîle: mezin. Qal û qîrş: pûş û palax. Bendewar: berbend. Şîmşêr: şûr. Tîrs: mertal.

Dûr dinêrim burc û xanî
 Cok û cobar, mêrg û kanî
 Têne berjêr çem ji banî
 Ber kul û derdê biyanî
 Berx û karik bare barin
 Jev bila û tar û marin
 Ser çem û deşt û zinarin
 Mêr û jin tev bê hewarin
 Alîyê berjêr dibînim
 Vê gumanê ez dixwînim
 Bo çi ez koxê dimînim
 Hêdî hêdî xwe digînim
 W: Ma ne şerme tu wîhabî
 Pêvdayê ejdeha bî
 Mar û mûr laşê te şabî
 Hê tu bê qedr û bihabî
 Çawa herkes ser bilinde
 Herwekî polad û hinde
 Ew delal û xweş û rinde
 Warê te bin destê kunde

tev xuyane bê mirûv^(*)
 tê dixwînin kund û kûv
 mane bê zad erd û şûv
 Çam û serwa bûne kûv
 nav gul û dar û devî^(*)
 ketne kortal û keví
 tu mirov tê naleví
 çawa bê cî denkevî?
 burc û bala û bilind^(*)
 tav çirax û mûm û find
 sêwiyê bajar û gund
 dijmin û kevnar û kund
 dergevan û şev dera^(*)
 nav dirîk û qembera
 zaro ber dest û dera
 bê bitaq û teskera
 tu tenê bê dîn û ol?^(*)
 tu li ber pêl û şepol
 tu ne gêjî heyf û tol
 tu di nav çiraf û hol

* * *

1—Birc: koşk û qesr. Cobar: coka ava baranê ya coka ava buharê. Kund: wêranker. Kûv: kovî. Biyanî: ejnebi. Kûv: tewandî. 2—Devî: newalên kûr. Jev: ji hev. Tar û mar: bitawila. Nalivî: nalebitî. 3—Ejdeha: ziha, marê mezin. Mûr: gêrik. 5—Hind: nîşke ji polaye. Şepol: pêle avê. Tol: heyf. Kund: dijminê wêranker Hol: herî û çiraf.

GERA GELÊ WELAT

Di 7. 5. 1976 de hatiye çêkirin.

Min berî da warê şêrîn
Jîr û ser baz û hunerçîn
Bê felat û jar û xemgîn
Pate xwar û dûv û bê dîn
Gund bi gund hêl bi hêla
Nav mirov û bav û êla
Ser mezar û ber bi kêla
Gol û derya, cok û pêla
Ro hilat û ro di ava
Kar û pitrol û delava
Ku bidim pesn û silava
Mame ber tîrêjê tava
Rengê dîna ez dinêrim
Her divê ku xwe veşêrim
Tu dibê qê ez ne wêrim
Lê ji dil Kurdê dilêrim

da bizanîm qenc û baş^(*)
rî dirêj î ser bi şaş
girtî yû hov û qeraş
pîs û murdar û kelaş
şehr û bajar û civat
koh û derbend û kelat
çol û dest û burc û lat
Dicle û ava Furat
jor û hevraz û devî^(*)
kort û koncal û kevî
bo civîn û wek hevî
min divê ro dakevî
dewr û madorê welat^(*)
ber ziyan û ber şewat
dakevim dewra xebat?
roja nû bo min helat

* * *

Min di ku xwende dixwîn
Bê xebat û bê çivîn
Her wekî serxweş û dîn
Zarê zik makî dixîn
Tîp û pîtokê nejadî
Xweş yû destûr û dadî
Miftî û îmam û qadî
Arî yû Kurdak û Madî
Zarê ku îzdan didaye

bo neyar û bê ciyan
hendewarê faşîyan
mane ber xaçe rîyan
ber şek û dest û piyan
dane xîzê dijminan^(*)
xame û zar û zîman
perwer û şêr û beran
tev di xistin ber ziyan
pê xuyame der cihan^(*)

1—Jîr: jihatî û bîr bîr. Serbaz: ser vekirî û serbilind. Hunerçîn: hunermend.
Felat: xelat. Pate: parî. Murdar: murar. Şehr: bajar. Koh: çiya. Mezar:
mezel. Kêl: nişana tirba mirîyan. Derya: behr. 2—Hevraz: berwar û cihê bilind
û ber bi ro. Delav: deriyê avê. 3—Mador: hawîr. Dilêr: mêr û gernas. Roja nû:
ramanê kurdanî. 4—Faşî: zorker. Zar: zîman. Zikmakî: xursîkî (tebîî).

Rewşen û roj û çiraye
Vaye fro bê bihaye
Kortika tarî dimaye

ronî daye her deran
cem civata xwendevan
nagî zaravê dizan

* * *

Komeli Dolar û Dînar
Rûpelê pirtok û kovar
Zarê bê war û sitemkar
Her dinava gund û bajar
Gava ku têne civanê
Pê didin tîr û kevanê
Xwe ne dîne bendexanê
Şa dikin kundê zemanê
Ez dibînim inê sî car
Tîpê Kurdî mane bê kar
Wek me ew jî mane bê par
Roja fermanê civîndar
Pîrê mizgeft û gumanê
Xênî tac û têlesanî
Pîrs û pêvê pê vedanê
Bo xwe nabînî jiyanê
Ew dixwaze gel sera ser
Wî bikî rêzan û rê ber
Jêre pişteban û leşker
Çolê ber baran û şevder
Qedr û qîmet bo xwe dîne
Hûr û gir tevde dizîne
Dewrê dîn û ser serîne
Vane fro ejnebîne

nadine Kurd û welat^(*)
xistine ar û şewat
bo xwe dîne qurm û kat
dîtine qedr û berat
Hemberê zarê derî^(*)
bend û kîn û berberî
ber tinaz û qeşmerî
da bigînin serwerî
têne der xîzê neyar^(*)
qet xuya nabin jî war
ya ne hatin gund û şar
bê gumane şermîsar
ser tewîn û ser hejîn^(*)
xewn û dext û bend û kîn
cezb û nalîn û girîn
tevger û tevdîr û hîn
ber bi mînî ser piyan^(*)
dest gêr û ser miyan
nijdevan û dergevan
jê bikî her hîviyan
nadî ser warê zerî^(*)
karê wî her nû kerî
dûr dibînin xwêserî
jev di bûne sed kerî.

1—Tîp: herf. Pirtok: kitêb. Nejladi: kokî. Xîz: xet. Dadi: edalet. Xame: qelem.
Îmam: pêşewa. Qadi: fermanîder. Perwer: parêzker. 2—Îdan: xusê. Zarav:
şêwe. 3—Kovar: rojnama mehanî. Sitem: zor. Qurm: kok. 4—Derî: zimanê
kurdî ê el û gundiyan. Serwerî: serokatî. 5—Şar: bajar.

Parsekan kîsê zikatê
 Ta hebîn na kin xebatê
 Ber derê pîrê beratê
 Çê dîkin kom û civatê
 Xwendin û tîpê biyanî
 Xizmet û karê xizanî
 Bûne darê bê Emanî
 Bin rî yû şaşê deranî
 Navê seydaî dibîne
 Qet nizanin ejnebîne
 Bê xebat û war û cîne
 Hin kirîn û hin dizîne
 Lewra kurdanî dihêrin
 Bo me Kurda şûr û kêrin
 Tevrik û engaz û bêrin
 Cem jîna gernas û mêrin
 Gundî tevda bê zevîne
 Hin diçin hin bê xwedîne
 Lew xuyane ser serîne
 Puyî, tolazî di dîne

dîtime nabin xuya^(*)
 ketne benda gundiya
 wek pepûk û sêwiya
 jê dibînin xweşiya
 kirne destûr û zîman^(*)
 dîtime barê giran
 jêderê derd û xeman
 agir û toz û duxan
 xweş û şêrn û delal^(*)
 tembel û sist û betal
 çol û derva nalenal
 şop û destûra Kemal
 hûr dîkin ber ba dîkin^(*)
 der hinavê çik çikin
 bend û peyçpun û rikin
 her jî keyfa lik likin
 mane bê kar û civîn^(*)
 bê felat û zar û hîn
 her wêlî serxweş û dîn
 doz û dawwaz û evîn

Taximê muxtar û axa
 Xisane ber eş û qaxa
 Her dem û dewran û gava
 Bo dîza find û çiraxa

palene bo koledar^(*)
 milletê dîl û hejar
 bo neqencî kar û bar
 pê dixin ser lat û xar

1—Pîr: şeyx. Dexs: hesed. Bend: berberî. Jiyan: xweşi û saxî. Tevger: liv û lebt. Hîn: zanistî. 2—Gel: millet. Seraser: hemî. Pişteban: piştger. Nejdevan: çete. 3—Nûkerî: dûvik berestî. Jev: jî hev. Kerî: parçe û celeb. 4—Bend: girtok û zindan. Pepûk: perişan û şepirze û melûl. 5—Tîp: herf. Biyanî: dijmin. Xizanî: hejarî.

Gundî tev bê nan û xorin
 Ser serê wan qore, qorin
 Raste ku girtok û torin
 Bo me Kurda darê zorin
 Xîret û wijdan û ne dîne
 Dijminan tevde kirîne
 Pendê huşyarî birîne
 Xîp û bizmar û dirîne
 Jar û bindesta dihêlin
 Destik û nîşan û kêlin
 Xwestek û pîs û qirêlin
 Ber şek û gerav û pêlin

hiştine lew kolene^(*)
 tu dibê qê tolene
 bo xirabî bendene
 em nexwş û xestene
 agirê dewra jinan^(*)
 ketne rêza xainan
 dane destê bê binan
 mîna top û mayinan
 rê nenas û hov û dîn^(*)
 bo neyaran dîre bîn
 tim didêrin bend û kûn
 yawer û dost û emîn

* * *

Rist û tore bê xelatin
 Hin di benda rohelatin
 Hin li ber ar û şewatin
 Tu dibêjî hê nehatin
 Hê digel vê payedarin
 Ser hejîn û bendewarin
 Hin ne zan û hin dewarin
 Dîl bijok û rû gemarin
 Pîr ji Kurda bûne şa'ir
 Ber bi jêr û ber bi bakur
 Çê dikin bo qedr û xatir
 Dane ser deyaê bê pîr

ka li kûne toredar?^(*)
 hin hevalê koledar
 jev dibûne tar û mar
 ya dimane tengezar
 jîr û zana, rê bijar^(*)
 feylesûf û xwendewar
 qare qar û bare bar
 dane ser şûv û beyar
 lê dibînim bê berin^(*)
 sor û şîn û esmerin
 raste ronî şevderin
 ew li nik xwe perwerin

1—Tembel: sist. War: welat. 2—Hinav: hindirê zik. Engaz: alet. Bend: berberî. Rik: kîn û cir. Liklik: ken. 3—Zevî: erd. Felat: xelas. Zar: ziman. Hin: zanyarî. Puştî. Tolaz: kurê tolê. Evîn: heskirin. 4—Taxim: celeb. Koledar: zorker. Dîl: bîn dest. Hejar: feqîr. Find: derbîk û şixate, çira. Girtok: dav. Tor: masîgêr. Bende: berbend.

Vaye Kurdistan dima ye
 Bê ziman û xwendega ye
 Ger çi zengîn û bihaye
 Bê heval û xweda ye
 Kanî rist û toredarî
 Ya tune derman û darî
 Sor û reş hatin ji tarî
 Kurdê bê cî hew dikarî
 Xîz û xame bê kitêbin
 Nexş û name wa dicêbin
 Hesp û suwarî bê rikêbin
 Navê ristê kurdî çê bin
 Ev bela min anî meydan
 Ber didame xap û keydan
 Xendeq û kortal û xeydan
 Her ji bo min şop û reydan

ber tîfing û qembera^(*)
 xwendevan û ser wera
 merkeza kar û pera
 paseport û teskera
 wî kuta nakin ji dil?^(*)
 bo birin û derd û kul?
 ejder û marê qizil
 destê xwe bavêjî gul
 têpê kurdî agirin^(*)
 der hinav û hindirin
 dijminan tev da birin
 bes tenê qal û qirin
 pê dimamae bê serî^(*)
 çal û derbend û derî
 bes dibînim nû kerî
 rêçenasî tevgerî

* * *

Kî bû dest pêkê-wîhakir
 Dijminê bê cî xuya kir
 Bê hiş, gendî bela kir
 Ber der û destê dizakir

ta ku ev rê hatî der?^(*)
 em dihiştin ber qeder
 derd û kovan û keder
 warê şêrîn û şeker

1—Qembera: naricok. Xwendega: cihê xwendinê. Kar: maden. Paseport: rê bwar. 2—Kuta nakin: xelas nakin. Darî: derman. Ejder:ziha. Qizil: sor. 3—Xz: xet. Xam: reşbelek û pirtok. Rikêb: zengo. 4—Keyd: fenas û hîle. Derî: newal. Xendeq: kortal. Xeydan: dehlan. Nûkerî: dîvik perestî. 5—Dest pêk: pêşî û ji rêva Gendî: gemarî. Kovan: kul û keder.

Mîr û pşayê me Kurdan
 Dîtin û dîdar û serdan
 Destikin bo êş û derdan
 Çê kerê sînor û perdan
 Hatine hev rengê gurkan
 Bo welatim arê burkan
 Jev qetandî rengê mişkan
 Her ji bona par û pişkan
 Hin di bê em Xalidînin
 Hin xudanê ol û dînin
 Lê bi rastî har û dînin
 Xwe dixwazin xwe dibînin
 Tu dibê tiştê ne dîne
 Rê ne dîn û paşketîne
 Bendê azadî çirîne
 Ew ji ramanê birîne
 Ev nîzama ku deranîn
 Pê dixistin kort û kadîn
 Her di şûnê kînî danîn
 Xênî xişt û ax û amîn

kokê cidwayî diçand^(*)
 mîletê Kurdî tewand
 gel sera ser jev qetand
 darê xudbînê çikand
 hev dîkuştin bêjimar^(*)
 bo neyaran bendewar
 Êl û bavik gund û şar
 xistine bin dest û dar
 hin Ebasîne ji dil^(*)
 jev qetîne bûne çil
 her wekî marê qizil
 bo neyara pişt û mil
 mane bê zanîn û bîr^(*)
 her wekî kevnar û pîr
 bûne daş û deste gîr
 rêz û pîlana wezîr
 çewt û vajî bû xuya^(*)
 kes ne histin ser piya
 doza canê bê ciya
 ar û darê faşîya

* * *

1—Cidwayî: ji hev qetandin. Dîdar: ziyaret. Destik: hevalbend. Seraser: hemî.
 Xwudbîn: xwe xwestin û xwe naskirin. 2—Gurk: gur. An: nişana komê ye.
 Burkan: agirvjan. Bendewar: berbend. Şar: bajar. Pişk: par. 3—Xalidî:
 zarokê Xalid binî Welid. Har: gezker û serxweş. Qizil: sor. 4—Pîr: şêx. Azadî:
 serbestî. Raman: daxwaz û tevdîr. 5—Nîzam: destûr. Çewt: xwar. Vajî: ber
 meqlûb. Faşî: zorker.

BILBILÊ XEMGÎN Û WELATÊ ŞÊRÎN

Di 3. 9. 1965 an de saz bûye.

Carekê hati gumanê	hilkişîme ser çîyan ⁽¹⁾
Ronî da roja cihanê	jê dibînim her ciyan
Ku cihêk ava û şîne	rind û şêrîn û delal ⁽²⁾
Renga reng têda civîne	nîfşê daran û gulên
Tev şikeft û kort û çalîn	hêrik û lat û zinar
Cok û cobar û newalîn	ber qef û ser kaniyan
Nêrgiz û ryhan û mêrgîn	deşt û zozan û gelî ⁽³⁾
Dezgehê şêr û pilingîn	cîgehê hîn û jiyan
Gol û derya tene dorê	rengê Qizwîn û siya
Kaniyan da der ji Torê	colê berxan û miyan
Tê diçêrin ber bi banî	hêdî hêdî kom bi kom ⁽⁴⁾
Ku ji ber dengê şivani	mane ser av û çeman
Ez dibînim tê xuyane	gewher û zêr û dirav
Rewşen û ronî vedane	ser kelat û her deran
Giv giva bayê seba ^{51847e}	raserê çiyayên bilind ⁽⁵⁾
Xuş xuşa zad û giyayê	me'imea berx û miyan
Qirçe qirça qirş û qala	bin piyê şêr û beran
Zim zima dengê newala	lim lima avê çeman
Tip tipa sêv û hinaran	teq teqa berq û birûsk ⁽⁶⁾
Ding û dinga lat û xaran	gum guma topê giran

1—Hilkişîme: hewaketim. 2—Nîfş: dest cûre "qism". Hêrik: girên dewra çîyan. Berqef: mîna û talta. 3—Gelî: newala bi dar. Dezgeh: ji dest û geh bûye, sene't. Hîn: zanîn. Jiyan: xwî. Derya: behr. Siya: gola reş. Col: bir û kerî. 4—Dirav: pere. Der: deyer. 5—Seba: bayê rohelatî. Raser: jor. Meime: barbar. 6—Xar: mixare û şikft.

Çik çika belk û pelanc
 Gîm gîma xap û derdane
 Çinge çinga şûr û dasan
 Qij qija çûk û çivîkan
 Bax û bîstanek bijare
 Gulşenek tê da diyare
 Tu dibê tirmê mexîle
 Têra dewrê lile lile
 Lal û yaqût, dur û gewher
 Tê xuyane jîn û tevger
 Lew cihe bo keyf û şadî
 Alme û zêrê reşadî
 Bilbîlek tê da dixwîne
 Xem civîn û dil birîn
 Cara cara tête serda
 Fir dide xwe pel di devda
 Ronî yû rewş û çiraya
 Doz û daxwaz û divaya
 Min digo bo çi dinalî
 Ser cihê rind û delalî
 Gotî yara min bijare
 Jîr û serbaz û siyare

pir pira têr û tîlûr^(*)
 xur xura dar û berane
 zinge zinga hesinan
 xum xuma şîp û geran
 ser cemê ava Murad
 gul stêrê asîman
 ser serî ronî dide^(*)
 ya girêka sêwiyan
 parçe parçe bûne kom
 nîne wek wî der cihan
 xwendin û lîz û geşî^(*)
 tê rijîne ser cilan
 ser serê şax û gulan
 her dike ax û fixan
 dil kul û jar û melûl^(*)
 tête dewra xaniyan
 xwe bi niftê pê dixê
 xwe dike nav û nişan
 bilbilê jar û pepûk^(*)
 çir dikêşî derd û jan?
 dijminan winda kirî
 bax û kar û niştîman

Têr: firinde. Tîlûr: tîrên biçûk. Ber: kevir û mêwe. Bijar: neqandîye. Gulşîn:
 cihê gulan. Diyare: xuyaye. Tirmê mexîl: navê komekî sitêrane. Lal: yaqût.
 Lew: lewra. Alma: pelîk û zêrê mezin.

Min divê ku heyf û tola
 Der newal û deşt û çola
 Her ji dijmin zû hilînim
 Rengê şêra xwe bigînim
 Ya bidim ser sop û rêça
 Çê bikim dewran û pêça
 Rêzika pendan û şîret
 Nameya namûs û xîret
 Ev ne texmîn û gumane
 Ê divê rê da xuyane
 Min dizanî ev bi rastî
 Ya bi ceng û ya bi aşî
 Pişk û para nozde milyona
 Ne guman û ne bi xewna
 Xwende ev dilî ne are
 Milletê te tar û mare
 Deftêrê xwe tu hilîni
 Zadê bê cî tim biçîni
 Ser di berda istû xwarî
 Bê hiş û tevdir û korî
 Mêze çir nakî cihanê
 Tu tenê mayî di xanê

xwe bi vê zarê derî
 der kelat û ser hedan
 da nemînî derd û kul
 dehl û dar û kaniyan
 ku diçî baxê û bihişt
 zana rêkim berleman
 kar û tevdira mine^(*)
 bo mine zar û ziman
 milletê dil û ne zan
 ew diçin baxê cînan
 yek ji tayê bawerî^(*)
 xwe dibînim sermiyan
 eger çî tê heye
 pir di xama xwendevan
 tu dibînî ev zeman^(*)
 maye bin dar û piyan
 têxî taq û pencerê
 hilgirî barê dizan
 rengê pîrê ser gilok^(*)
 dost û yarê xergelan
 ku hemî serxwe dibûn
 mayî ber xaçe riyan

* * * *

Zar: ziman. Derî: ê gund û newalan. Hed: sinor. Buhuşt: cenet. Pêc tevdir û
 tevger. Pend: şîret. Name: pirtûk û kitêb. Dil: bindest. Cînan: buhuşt. Ceng:
 ser. Aştî: silim. Xame: qelem. Are: kirête. Millet: gel. Tar û mar: bilawila.
 Taq: şîbak. Pîr: sêx. Xergel: koma keran.

CIHÊ MIN BER DIDA XWÎNÎ

Di 5. 8. 1975 an de çê bûye.

Çira ya dewletê pêket
 Diva ya rûmetê rê ket
 Bi xîst û teplik û saza
 Bi bend û pîs û tolaza
 Bi hov û bê ked û kara
 Bi sist û gêj û ser sara
 Cihan tevda xudî zare
 Tenê warim birîndare
 Ji binava tête dêranê
 Di sirgum û di fermanê
 Melûl û jar û bê çare
 Hejarê destê bê are
 Serî ber jêr û balaye
 Tenê bê par û tataye
 Ji bo xwe nakî tevdîrê
 Bi şûr û xencer û tîrê
 Ketî ber top û sarûxa
 Hemî bê rûmet û rûxa
 Dibêjin em misilmanin
 Dinê da em perîşanin
 Gelê min bê ked û kare
 Gelê dewra me huşyare

cihê min ber dida xwîné^(*)
 gelê min ber dida kîné
 xuya bûye li dîwanê
 berî daye li xerçînê
 bi dîn û dîl û bin dara
 berî daye li kadînê.
 civat û merkez û kare^(*)
 diçe ber nan û birçîne
 ne nokaye dide canê
 di kêşe kuştin û şînê
 tim û tim ber şek û dare
 qe nagêjî tu mizgînî?
 bi ramana girêda ye
 qe carê na gî hevdiñê?
 di rav û seyd û nêçîrê^(*)
 dike dîdar û nêrînê
 kesek nabîni yazûxa
 didêrin bendera dîne
 ji bo me kûra derdanin
 dixwînin bendê amîne
 belengaz û sitembare
 gihiştê heyv û perwîzê

* * * *

Rûmet: şeref û qedir. Xercîni: kirêti. Dîl: bîndest. Ser sar: sist û bê hiş.
 Merkez: kunger. Noka: niha. Sirgum: welat bi dîr kirin. Melûl: bê kêyf. Ar:
 şerm. Rav: nêçîr. Dîdar: dîtin. Yazûx: guncê. Rûx: rû. Sitem: zor.

HÊLEK JI KURDISTAN

Di 6. 9. 1965 an de saz bûye.

Hêlek ji hêlê cihê me Kurdan
Çolek bi tarî ber ser dibarî
Top û firokan gumîn û zimîn
Berê tîfîngan dîkir fizîgî
Ro daketî ser ezmanê jêrî
Avê çeman tev ji ber zîwanin
Şev bûye tarî sitêr hatin xwar
Têr û tilûr û dewar û kovî
Çare ne dîtî riya mecalî
Gundên bi ava tev bûne kavil
Dexl û dax û cî mane bê xwedî
Çolê dimane laşê gernasî
Xana ne xweşan tîjî birîndar
Zîndan ji xortan tîjî dibûye
Zaro û zîç û jin tîn û birçînî
Zora ulo kes ne dî bi çavan
Ne Erminan dî ji dest Osmanî
Ne hatî serê Mecer tu cara

keyfek ne dîtî ji êş û derdan^(*)
lat û kevir tev dibûne arî
jehr û ber û gaz li erdê rijîn
na bîzîtin kes dengê girînî^(*)
arê cihennem germî didêrî
koh û kelatan mij û duxanin
ketin pîyê me xîp û mîx û tor
keftar û ker go xîzal û rovi^(*)
tevan ji wir xwe didane alî
bax û gulistan bê rewş û havil
pîr û pepûkan hewar û girî^(*)
gulî qusandin bûk û qerqaşan
keç û diyan tev ji ber zare zar
goştê dilê me dijmin di cûye^(*)
Kurdê jêr û jor tevda bê cînin
ne law û deyan ne kal û bavan
ne dî Ceza'ir wiha xizanî^(*)
ne Efrîqa dî ji destê kufara

Hêl: nahiye û mentîqe. Ber: gule. Lat: teht. Arî: xulî. Firok: balafir. Nabîzîtin: nabîhistin. Xîp: kelem. Tor: masîgêr. Qeqas: birû reş û çav reş. Xizanî: perîşanî û belengazî û feqîrî. Kufar: gawir.

Ne Kerbela dî dest Yezîdan
Hindo ji destê Englo sitemkar
Êşa ku dîtî Kurdê site mbar
Ger çi li ser wî agir dibarî
Ev êş û berdan, zor û ziyani
Faşî divaya xwe kir xuyani
Hêva Xesîb û Sinto birane
Ku milletê Kurd hemî bi hêrin
Ev rêz û tevdir, ev kuştin û dar
Jêra ne qencî nav û nîşane
Lê milletê Kurd şêr û berane
Tevan bi hevra didane peyman
Jinan xwe rengê mêran girêda
Her yek ji wana sedê neyara
Ya dê Kurdistan bi gî xweserî
Berdin neyaran ji lat û çîyan
Têda xuya bin bibin ser miyan

maye li çolê laşê Huseynan^(*)
ev reng ne dîtî kul û jan û ar
ne dîtî Vêtnam di gund û bajar
wek me nebûye jev parî parî
bila ne kir qet cenga cihanî^(*)
anî di nêva cihê me danî
bi vê awayê soza xwe dane^(*)
ji meydana tev bibin veşêrin
bona me Kurda danî segê har
kar û îşê wî zor û ziyane^(*)
rengê kelat û lat û çiyane
da ku bi cengê ew bêne meydana
ketin newal û şikeft û xêda^(*)
lewra ji dijmin kuştin hezara
ya dê nemînin di gund û bajar
kelat û zinar, çem û kaniyan
xûdanê ol û tevdir û jiyan^(*)

* * * *

Yezîdan: Yezîd û hevalên wî. Huseynan: Husên kurê Fatîma keça pêximber.
Englo: inglîz. Zor: kotek. Jan: êşa giran. Wî: Vêtnam. Sermiyan: maldar.
Sermiyandar û xwedî welat û jiyan. Ol: dîn û destûr.

DENGÊ BÊ GAZÎ

Dengekî têtê guhê min
Der welat û der cihê min
Pîr û kevnar û mihê min
Jîr û serkar û kihê min

Ber ketin derd û mitala
Ser serê kortal û çala
Deşt û zozan û di pala
Ber ziyanê nala nala

Ev çi derd û çi belaye
Nav der û lat û çiyaye
Ez dibînim tê xuyaye
Canê min ber qêr û aye

Qêy tenê ez rê ne nasim
Der newal û kort û kaşim
Ê didêrî gorne başim
Ez bi vê pîrsê ne şaşim

Dijmine dîv û dewarin
Darê û şûrê koledarin
Ejdehak û kore marin
Bo cihê min kar û barin

ev çi denge ez nizamim^(*)
ba dibe ez bê xudanim
bê kes û jar û xizanim
zîç û zarok û ciwanim

bê hiş û tevdir û zarî^(*)
koh û derbend û zinarin
tev xuyane bê hewarin
tu dibêji bendewarin?

çi hewar û nale nal?^(*)
kortik û kendal û çal
rûyê erdê bû ye tal
bê serî min daye pal

da bizanim ev çi ye?^(*)
canê min bê hêvî ye
min di dojê dîtiye
rind dizanim ev kîye?

xwînmij û bê dad û dînin^(*)
pir ne qenc û pir bi kînin
nejdî yû komir diçînin
min ji tevdirê dixînin

Der: di. Pîr: mezin û şêx. Mih: mezin. Jar: perîşan û melûl. Xizan: hejar. Jîr: jêhatî û bir bir. Kin: biçûk. Zîç: kuflet û zaro. Zar: zîman. Koh: çiya. Bendewar: berbend. Didêrî: çê diki. Gornebaş: kefen diz. Komir: bavê Turkan.

Ez bi vê dengê ne xweşim
 Jehrî yû talî di noşim
 Dil birîn û reş dipoşim
 Ber derê dijmin diroşim
 Ku dibêjî tevda rabin
 Rengê pûk û berf û babin
 Ber şekê dijmin kuta bin
 Pir ne hindik jev bilabin
 Ev cem û cobar û kanî
 Ronî dane asîmanî
 Tu deyan wek wa ne tanî
 Tev bi hêlin bo biyanî
 Dehl û darê renga reng
 Nazik û şîn û qeşengin
 Lat û hevrazê bi dengin
 Ew cihê şêrîn û şengin
 Dil birînin xortê Kurdan
 Hin mirin ber jan û kerban
 Pir dibînin êş û derdan
 Hin di qeyd û hebs û bendan

lê çikim mame tenê^(*)
 ber kelat û ber pinê
 wek pepûk û goyînê
 ber kul û derdê dinê
 cî bi hêlin hûr û gir^(*)
 ber bi banî bir bi bir
 top û teng û balafir
 nav der û lat û kevir
 bax û bîstanê delal
 rind û şêrîn û şepal
 durr û yaqût û lual
 burc û xanî, mîlk û mal
 mêrg û zozanê bilind^(*)
 ber xuyane mûm û find
 tê dixwînin bûm û kund
 mane bê bajar û gund
 qet nizanin ev çiye?
 xap û xara bê çiye
 ku zirara behsiye
 ka bê kî ev dîtîye?

Lê: lakin. Pin: lem û qurm û kok. Dipoşim: li xwe dikim. Pepûk: têrê xemdar.
 Goyin: firendekî çiyayî û pir pêv. Diroşim: dirînim. Bir: kom. Şepal: xweşik û
 nazik û sipehî. Teng: debabe. Balafir: firoke û teyare. Biyanî: ejnebî. Burc:
 koşk û qesr.

Rengê dîna dane ser rê
 Roniya yazdê adarê
 nîne kes ku bê hewarê
 Tev ketin ber kar û barê
 Kanî ew mêrên tekane
 Xwendewarên nû gihane
 Çawa îro bê bihane
 Medrese vala di mane
 Ew jinên şêrîn û esmer
 Qizikên nûhat û nûber
 Lawuk û xortên dilawer
 Dane pê hevdû sera ser
 Ev çi tofan û xela ye
 Bes ji bo Kurda xuyaye
 Dijminan ronî dida ye
 Ka bibêje ev rewaye
 Ka gelo baş û diruste
 Kî li ser min ev dibiste
 Girtin û lêdan û xîşte
 Qê di pêşî ew nivîşte
 Ya te çêkir bo me danî
 Ka ji kû derxistî anî
 Bo me bes derd û zîyanî
 Qencî çir nakî xuyanî

ber bi Îranê meşîn^(*)
 tev didîtî derd û şîn
 ku nakî ax û girîn
 bê felat û bê civîn
 jîr û zana, pehlewana?^(*)
 tevda bê xwendin diman
 nav gel û koma cihan?
 tê tunîne xwendevan
 por dirêj û çav xezal
 dil birîn û nale nal
 mane bê kar û betal
 bê xudan û bê heval
 kû xuya bû, ku dihat?^(*)
 top û napal û şewat
 em dimane bê berat
 heyet û koma civat?
 çerx û dewrana zeman?
 agir û dar û zîyan?
 ev kul û barê giran
 bo me bes hatî cihan
 dijminî bo me tenê^(*)
 wê dinê ya vê dinê?
 der cihan û ayinê
 nakî der kok û binê?

Di 5. 6. 1975 an de saz bûye.

Şîn: kovan. Bê: werî. Felat: rizgarî û xelas. Pehlewan: ji pehlewî hatiye, mêr û gernas. Medrese: xwendegêh. Esmer: genim, gûn. Lawik: kurik. Dilawer: gernas. Betal: mane betal. Seraser: hemî. Tofan: berf û baran. Kû: ji kû. Rewa: dirist. Niviste: hatiye nivisandin. Ayîn: dîn. binkok.

ROJEK BÊ WIJDAN ۞

Çi rojek bê wijdane
 Têv agir û duxane
 Roja kund û dizane
 Ji wanra ser miyane
 Rojek bi teng û tarî
 Gulle tê da di barî
 Xuyanî kir ne yarî
 Ka bê kî kir diyarî
 Ew peymana Ceza'ir
 Nehîştî bo me xatir
 Têv da tirraf û agir
 Kurdê welatê bakur
 Ez dibînim bê bextî
 Têvda dijwar û sextî
 Dijmin bi hevra cextî
 Ev lîzik û ev pextî
 Şah û Seddam birane
 Çilo bi hevra şane
 Ew ne tenê wihane
 Tirk û tazî xuyane

tê da kefta dilîzin^(*)
 ejder bi xîze xîzin
 dibînim tê ezîzin
 çilo em tê bê çîzin
 tevda gend û gemarî^(*)
 bi destê koledare
 ne peyman û ne kare
 roja şeşê adare
 ne peyman û ne soze
 bi destê fîl û xoze
 muj û duxan û toze
 vê peymanê na xoze
 di vê rojê xuya bû^(*)
 ji tevdîra diza bû
 bo me agir dada bû
 ji bo me bê biha bû
 di vê roja ne dadî
 bi dîlan û bi şadî?
 me tê didîne madî
 di vê civat û nadî

Kevnar û ji hev ketî. Ejder: zihak, dijminê ziyanker. Kund: dijminê wêran ker. Çiz: tist. Sextî: dijwar. Cextî: alîkarî. Pextî: pijandî û birastî an ku tevdîra xwe birin serî. Dadî: edalet.

Ev ro gelek dijware
 Bo dijminan heware
 Tev kuştin û temare
 Bê cî tê kar û bare
 Di vê rojê civîne
 Mirin bo me didîne
 Ewin tevda bê cîne
 Xuyane qey birçîne
 Gotin ey şahê Îran
 Qe na nêrî tevdîran
 Di bînî destê gîran
 Di girtin û zincîran
 Tuyî bi me dikî şer
 Ji me qe nakî bawer
 Ji hev dibî ker bi ker
 Hingî dimînî bê ber
 Şahê keynar û ser xweş
 Ewbaş xwe qedandin
 Elv xwarin û noşe noş
 Herdû bi hev hîme xweş

reş û tarî xuya ye^(*)
 bi ronî yû çira ye
 kul û derd û belaye
 ji bona me xela ye
 ne yarê me sera ser^(*)
 diz û ewbaş û ber ber
 di xwazin me bikin der
 mane di çol û şevder
 çî bêjin tu na bê hê
 va ye dewra te dû tê
 qe nabînî kul û kê
 xuya ye dîne çolê
 guh nadî pirs û pêvan^(*)
 ta ku bibînî lêdan
 li ber hêran û dêran
 di qunçik û şikêran
 bi eflyonê xirandin
 daxwaza xwe qedandin
 ji bona me kelandin
 gelê me da mirandin

Terme: winda kirin. Bê cî: dijmin. Ewbaş: pis û nezan. ber ber: ser jêk. Dû: dûra. Key: dax. Qe: qet. Ker bi ker: perçe perçe. Ber: havil û faide. Şikêr: wêran geh. Xirandin: xapandin. Gos: guh. Qedandin: bi cî anîn. Noşe noş: vexwarin. Gel: millet.

Koma gelan na bînî
 Vî tevdîr û civînî
 We ya kînî diçînî
 Bo xwe rûmet dibînî
 Me ezmana mêze kir
 Bes dibînin hûr û gir
 Çolê ketin bir bi bir
 Kes ne maye di bakur
 Divê ku em bibin yek
 Hûr û gir tev lek bi lek
 Ser xwe rakin fen û dek
 Çi maldar û çi xwestek
 Divê em cî bibînin
 Wekî bilbil bixwînin
 Tola xwe jê bistînin
 Xudanê maf û jînin
 Jê bûne jê naçin der
 Bi tevdîr û bi tevger
 Bi teng û top û leşker
 Bibin aza û xweser
 Bi gazî yû hewara
 Bi pitrol û bi kara
 Ne mînin ber dîwara
 Da karibin ne yara

kore we ya nîzanî?^(*)
 vî qelan û tofanî
 bo me dîkî xuyanî?
 di pitrol û di kanî
 ne dîfî alî karî^(*)
 di qêrîn û di zarî
 bê tevger û şiyarî
 jev bûne parî parî
 di pîlan û xebatê
 herin qad û mezatê
 ne mînin ber şewatê
 berî bidin felatê
 delal û nazik û şeng^(*)
 rengê Kawe bidin deng
 çi bi aşî çi bi ceng
 jîr û gernas û çeleng
 ger yek jî me nemînî
 bi hevdîn û evînî
 bi komel û civînî
 nehêlin bend û kînî
 tevda wekî bira bin
 doza dilê xwe şa bin
 rengê lat û çiya bin
 serbest têda xuya bin

Di 6. 4. 1975 an de saz bû ye.

Qelan: wînda kirin. Rûmet: qedir û qîmet. Kanî: maden. Bir bi bir: kom bi kom. Pîlan: tevdîr û siyasat. Lek bi lek: kom bi kom. Felat: xweşî

GUNDÊ BÊ WIJAN

Tu çend salan di vî gundî Ne dî xweşî ne dî rindî Di pevçûn û di bindarî Kişandî derd û sersarî Te derbend û kelat û xar Te bîstan û newal û dar Te tev hiştin di tarî da Tek û تنها di vê cî da Tu hêlîna xwe ya zêrîn Tu malbata xwe ya şêrîn Te pir êş û keder xorin Li te serdest û çav sorin Te pir zor û cefa dîtin Li hember te gurê şîtin Ji can û dil birîndarî Tunîne melhem û darî Welat parêzî bû tofan Te keştî ber da ser pêlan	di mayî ber melatî da^(*) çilo dirbaz dikî jînê? di bê qedr û di bê karî^(*) dirakî war û hêlinê kirin destê sitemkar kirin bin payê dizginê dimayî ber zikat û nan^(*) qe carek na çî xwazgînê dihêlî bo neyar û diz didî ber çav û dûrbînê ji destê gundî yû cîran^(*) ne yarê nermî û lînê ji destê dijmin û bê cî bi navê merkez û dînê ji bo warê xwe bê marî^(*) dikî nakîn û zarînê riya serbestî na bînî derîne lengerê xwînê
---	---

Salan: i4 gundî: xirbbê Hîsî. Jîn xweşî. Dîbendî: berberî Sersarî: sistî û betalî.
Hêlin: mal. Derbend: deriyê kûr û teng. Xar: sikeft. Keder: kovan. Lenger:
 zincîr û werisên ku pê gemî digrin û disekinînin.

Ji çavan xwîn dibarînî
 Li cem hov û nezan û dînî
 Ji bona Kurd û Kurdistan
 Ji yar û hogir û dostan
 Li hawîr te segê harin
 Dizanî ew ne bijdarin
 Erê kîn û rik û pevçûn
 Nîzam û xwendin û yekbûn
 Di bîr û bawerî korin
 Serî ber jêr û ber şorin
 Zimanê bav û bapîra
 Di mane ber gem û nîra
 Gelacî yû dibendî qet
 Ne yarî ber berî serket
 Eve ku me dihêle paş
 Ji lew mane nezan û şaş
 Riya qenci qe na bînin
 Çeleng û şêr û xemgînî

ji ber zora ne yarê pîs^(*)
 te raman da ye xemçînê
 te aram û tebat nîne
 tu nabînî qe nêrînê
 ji insaf û dilovanî
 diçînin tevgera kînê
 ji bona wan timî kare^(*)
 tune guh nadine hînê
 bi ramana bila bûne
 berî na dîn li hevdînê
 dixistin bend û zincîra^(*)
 di kort û al û kadînê
 ji wan nabî cuda carek
 hilanî rewşena vînê
 ji rêzan û huner bazî^(*)
 di kar û tevger û dînê
 di şabaş û guman û vir
 di benda ax û Amînê
 Di 1. 8. 1960 î de çê bû ye.

Raman: armanc û tevdir û daxwaz. Aram: tebat û hecan. Hogir: ji hev girhatiye. Qe: qet û tucar. Seg: kûçik. Sor: zeviyê sor. Cuda: alî û başqe an ku ji wan xwe nade alî. Rewşen: ronî û xemil. Vîn: ji evîn hatiye, heskirin. Şabaş: pesindan û gewndî. Vir: derw.

DIÇIM HICRÊ BERÊ XWE NADIM DÊ

Tayin li dest min
Kevnarê lakin
Bê bext û bê bin
Lîstokê ayin

Hûr hûr dixwînî
Bê cî bimînî
Pey hov û dînî
Tu min na bînî

Ta kê wihabî
Ser te peyabî
Warê te şa bî
Dûvik tema bî

berê min Hicrê
deranî ev rê
min zû dida pê
ez dame ber kê

Min dî dengê hat
Dengê pir şewat
Derbend û kelat
Çol û der û lat

di bê Heya kê
bê war û bê dê
naçî medresê
çira nabê hê?

Çawa di mînî
Carek na bînî
Bo çî na xwînî
Derdan di bînî

dîl û perîşan
êş û kul û jan
bê dîn û wijdan
bo te ne bî nan

Tu ber dide min
Derxîne dijmin
Bişkîne bê bin
Bimrîne xa'in

ji navê birîn^(*)
dilê me kir xwîn
ji ber ketin şîn
tev pêra girîn

bê nav û rûmet?^(*)
cihan û dewlet
qe nakî xizmet?
bin darê minnet

kurê belengaz^(*)
bi be serfiraz
bi êrîş û taz
rake ber û gaz

Tayîn: xwarin ku ji bo feqeyan hatibû danîn. Berê min: di sala 1937 an lê ev pîrs ne ku ji bo min tenêye weku ji tevê feqeyane. Hicrê: xwendegeha feqeyan. Lîstokê ayîn: ê ku bi dîn dilîze. Kê: dax.

Ezim diya te
Her hîviya te
Min şîr dida te
Rewş û riya te

bo te hevalim
birû hilalim
bo te helalim
ser te dinalim

Jiyan û jînim
Ger te ne bînim
Bê mar û dînim
Lew dil birînim

rûh û rewanim^(*)
bê cerg û canim
bê xan û manim
rengê kevanim

Xelkê dinê tev
Te ber dida rev
Bin tarî yû şev
Xulam û ber dev

bûne xudî par
bûyî birîndar
mayî sitembar
qe nabî huşyar

Guhdarî nakim
Bo dîn birakim
Cem wî ne pakim
Çawa xuyakim

pêxwas û bê çek^(*)
ber dar û ber şek
mame li ber dek
kevnar û xwenstek

Ser min dibarî
Gendî gemarî
Darê ne yarî
Jev parî parî

pîsî qirêjî
hovî yû gêjî
hiştîm bê mêjî
bin dest dirêjî

Birû: ebrû. Hilal: hêva yek şevî an ku diçe û tê. Cerg: gurçik. Mar: xweş û sax.
kevan: yanî kurdistan wek kevane. Jev: ji hev pareçe û bir û bêş.

-Gihame Hucrê
 Ji ber kulê dê
 Bo min Heya kê
 Ne minî Zînê

Yek ji hevalan
 Ber xan û malan
 Ev qîr û halan
 Karê betalan

Li me dinêre
 Rimbaz û şêre
 Çeleng û mêre
 Bo me dijmêre

bi dîl kul û xem
 heval û hem dem
 hebî ben û gem
 çikî jînê Mem

Hêstir ji çavan
 Her wext û gavan
 Ber hewr û tavan
 Şivan û gavan

ji min dipirsî
 gelek di tirsî
 ev text û kursî
 di minî birsî

Gelo yetimî
 Bê kok û hîmî
 Bê zêr û sîmî
 Destûra Mîmî

dike hevalî
 na hêle talî
 durr û lualî
 ber bi kemalî

Eger hebî ew
 Ronî dibe şew
 Bo me tune xew
 Ew ger dibê hew

hûr hûr dibarin^(*)
 li ser hinarin
 em bê qirarin
 jev tar û marin

çima dinalî?^(*)
 bê milk û malî
 şêxê delalî
 nade tu alî

çine milk û mal?^(*)
 li ber wî der hal
 eger ne dî pal
 em tev dibin lal

Dê: welat û ji ber kulên hevalan û hev çaxan. Ben: bend û weris. Gem: lugam.
 Nemînî Zînê: an ku eger Zînê nemîn dê Mem wê bi jînê çikî. Hinar: arguşk.
 Hewr: ewr. Qirar: hedan. Halan: dengê bilind. Birsî: birçî. Sîm: ziv. Mîm:
 Muhemed. Dur: lual. xwe dide rex dijmêre. Ew: şêx. Şew: şev. Hew: bes.

Bo me mertale
Her can û male
Ger tirs û tale
Bo wî helale

Min go diya me
Ew lêvîya me
Bo me ne şerme
Rûyê me çerme

Ser me giranî
Em tev ji banî
Bê ser miyanî
Şêxê me zanî

di wê zemanê
dide jiyanê
di vê cihanê
dibin qurbanê

Ger em kole bin
Rengê tole bin
Divê ewle bin
Mîna lewle bin

ma ye bê xudî
hewar û gidi
kirît û fidî
xwe na bin xudî

Ma em ji kûne
Dê ser nixûne
Derdan dihûne
Dil tev bi xûne

dilê me qet qet
hatin li bin xet
dixwazin cennet
didêrî şîret

Bira bi mînî
Bi ser hejînî
Zû me digîmî

jêra bikin kara^(*)
li ber der û bar
bo me serekdar
jar û birîndar

bo çi hatin vir?^(*)
ber dar û agir
der nav û hindir
ji bo keç û kur

me navê welat^(*)
jiyan û xelat
buhîşt û felat

Di wî zemani: di roja qeyametê. Jiyan: xweşî. Qurban: gorî. Tole: kûçikê piçûk. Ewle: rast û emîn. Mîn: wek. Jar: zêff û nexweş û belengaz. Felat: rizgarî. Buhîşt: cennet.

Çikin cih û war
Riya kirî kar

keyf û azadî
ji bo me ş,adî

Diçin li ber bar
Rêzana bijar

xebat û dadî^(*)
destûrê na di

Ku em bidin pê
Li cem xudê tê

cihan û dewlet
ferman û rûmet

Barê gel û dê
Jêra na di rê

civîn û xizmet^(*)
ku bêjî helbet

Çikin gul û dar
Bo me eve kar

va ye mirin tê
çi bê didin pê

Di gund û bajar
Ewe vejîndar

di çol û di rê^(*)
di her du dinê

Çiqas me gotî
Dilê me sotî

ewan digo tew
tevda ketin xew

Dijmin tajotî
Min dibû çewtî

gund û ş,ar û dew^(*)
gotin bese lew

Bi na çarî min
Lê min sipartin

serê xwe danî
xudayê banî

Hov û dewarin
Destim dibû kin

di vê cihanî^(*)
darê xwe danî

Demek wiha bûn
Me pel vedabûn

di nav betalan
wek pîr û kalan

Bê cî xuya bûn
Ser ber piya bûn

ber dar û talan
wek dîn û lalan

Derd û kulê min
Zend û milê min

welat perestî
tev bûne hestî

Şadî: kêf û şahî. Dadî: edalet. Bijar: neqandî an ku riya ku pîr neqandiye na hêle ku doza welat bikin. Ferman: emir. Rûmet: qedir. Dê: welat. Helbet: her

	Nav û dilê min	divê serbestî ^(*)
	Da bilbilê min	bi gêjî restî
Hingî soza min	tête meydanê	
Peyv û doza min	digî cihanê	
	Pê daxwaza min	dike dîlanê ^(*)
	Gewr û boza min	na mîne xanê

* * * *

divê ku wiha bî. Bê: şêx çî bêjî biya wî dîkin, Vejîndar: saxkerê millet. Şar: bajar. Dew: gund. Çewtî: xwarî.

BELA BEGARA

Di 5. 5. 1952 an de saz bû ye.

Bela begara Hîsî wêda tîr
Hef sala têda kirim melatî
Ser min xuya ye dijwar û agir
Min jê nedîne şaxê kurdanî
Kûra dibendî darê xir û cir
Hember şetanî dibû xuyanî
Raste nizanî pîsî deranî

Riya xweserî, jîn û rizgarî
Na dî tazîti, kîn û ber berî
Derdê pir giran anî serê min
Gelê têda ne qencî nizanin
Welat parêzî neket dilê wan

Her yek ji wana sê jin tanî bûn
Bo hev ne yarin jev tar û marin

Destê xwe na din destê perweran
Du kes li cem wan ser darê ferman
Ji wan ditirsîn weke milke mewt
Her neyarin bo kurd û welat

li cem ne dîtîm wijdan û xatir^(*)
mîna ne yaran bo min dihatî
berê xwe nade ber jor û bakur
tevda jan û kul, derd û ziyanî
barê gewendî arê hir û nir^(*)
destê dijminan girt û helanî
rakir hêsanî ne xweşî danî^(*)

ol û serbestî hîn û şiyarî
gend û gemarî kêf û qeşmerî^(*)
danî ser seran hefsarê lakin
derd û belane bê sermiyanin
hemî xuyane di rengê serwan^(*)

pirê wan tazî kundê xanî bûn
tavda naşîne mîna dewarin

dost û hevalê diz û nûkeran
yek jê Ezo ye ê diye Selman
bi her awayê dîkin kewte kewt
tim kar û barin didin ber şewat^(*)

Hê ew dixwazin cem wan bîmînim
Canê me Kurdan serxweş û harin

heval û dostin êşê digînin
di rengê qirdan dîn û dewarin.^(*)

Fedî nakin ew ji pîrsên ne baş
Xwîna dilê me tevda mijandin

didin rûyê me ji her der û kaş
goştê canê me hemî pijandin

* * * *

Di 4. 5. 1965 an de çê bû ye

Perestî: parêzî. Rastî: xelasî û rizgarî. Gewr û boza min: dilpaqijî û xebat û bir
û baweriya min. Xatir: dil dirovokî û qedir û qîmet. Hef: ji heft kin bûye. Jan:
êşa giran. Ziyant: zirarî. Gewendi: parsekî û mitirbî. Hêsanî: nermî û rehetî.
Jîn: xweşî. Ol: dîn. Hîn: zanyarî û zanistî.

MEDRESA PÎRÊ GEROKE

Medresa pîrê geroke lîsa kund û nû kera^(*) ↙

Ke'ebeya cem dîn û sofî ser serî pê bawere

Nan û dew her şiv û taşlê koletî kar û xebat ↘

Deftera zarê xirafî şaş û rî dîn û pere

Destik û mertal û şûre bo neyar û dijminan

Dojeh û arê tenûre destê bê cî tim sere ↘

Şopa keftar û quligan xaniyê xewn û direw^(*)

Xwendegaha kîn û bendî bo gelacî teskere ↘

Min demek têda dixwendî tê didîfî serhejîn

Darê hovî, destê kovî rêç û rêz û tevgere ↘

Serwan: şivanê devan. Tazî: Ereb. Kund: wêran ker. Jev: ji hev. Tar û mar: bila wila. Nasî: nezan û xeşîm. Mîn: wek. Perwer: welat parêz. Nûker: dûvik û kerê nû. Êzo: ji êla Begaran. Selman: ji êla Xatûnan.

Gend û pîsî, bend û şîfî, bê mirêşî, tembelf^(*)

Bê serî, sistî, dewarî, qeşmerî tev jê dere

Put perestî ders û hîne rê dibe ser Ehriman

Rêçika dolar û kîne, sertewîn û bê bêre

Kox û hêlîna diza ye tê xuyane ser gilok

Lokê caz û ser miyane koledar û rêbere

Dîlî, bindestî dibînin jêra destûr û nîzam^(*)

Ser miyanê wê eve ku axur û koxa kere

Nîştimanî tê tunîne ber berî kok û nejad

Xendeqa mikrob û êşe tewbedarî ra sere

Hîn û zanîn û civakî pêşveçûn û xweserî^(*)

Kufr û bê dînî dibîne kungera dil koçere

Rêber û zana didîne dijminê dîn û tiriq

Cem ewê ew pir ne başe gornebaş û şevdere

* * *

Lewra têda har û dînin ser hejîn û rî dirêj⁽⁴⁾

Sed wekî qirtmîni têda koremar û ker kere

Destekî ser gan û puştî êdî ser qabê kitêb

Çavekî ser hîlebazî ê dî ser dêmê zere

Ez bi rindî wî dinasim dijminê warê mine

Kundê derbend û kelate qorvedokê qer qere

Xwe dike pîrê tekane rengê Osman û Umer

Gava ku tête civatê tu dibê qutbê fere

Ev guman û fikr û tevdîr tev ji iblîsê dizîn^(*)

Nade ser şopa şiyarî her ji zanînê dere

Dojeh û arê cehennem kar û bare bi tê

Ger çi xudbîn û kubare, rêçe nas û ber bere

Umrê wî hindik dima ye ber bi gorê lez dike

Bo gelim derd û bela ye ber derê xana kere

Ew ne zana û ne jîre xwe dike zana û jîr^(*)

Destikê kevnar û pîre tim li ber mal û pere

Ev riya ku tê dimîne naçe bîstanê buhîşt

Jîn û rizgarî ne dîne ger çiqê pê bawere

Xwe qe nabîne di şorê bê welat û bê zevî

Lew ji derbend û ji torê hatiye bê teskere

* * * *

Di 10. 7. 1963 an de saz bû ye.

Gend: gemar. Şîfî: pîsî, kirêti. Mirês: şikl û hêet. Tembel: sist. Pût: senem.
Hîn: zanîn û zanyarî. Ehrîman û ehremen: Xudanê şer. Lok: deve. Cazû:
finasker. Qerqer: kefen. Fer: tek.

BIN DESTIYA KUR Û DÊ

Meydan û raman û mezat	fikra ne çê ser me meşî
Tevdîr û daxwaza neyar	em pê bibin tim kar û bar
Nav me bi mînî koledar	jevra bi kin tim zik reşî
Zar û zimanê ejnebî	bo me dibî zarê nebî
Durê derî ger tê nebî	lalî ji bo me bit weşî

Ger ranebî dar û reşî	pişka diz û pênc û şeşî ^(*)
Pê û pirûska atêşî	bo me ne başe dil geşî
Razan ji bo me bit heram	pêv û xeber dan û kelam
Pate li dijmin lê silam	şerme bi mînin bê beşî
Şerme ne kin kar û xebat	bê ol û destûr û civat
Qence ku em wînda bibin	tevda herin ber ba bibin
Bê rûmet û bê ca bibin	ger tê ne mînî zer keşî. ^(*)

Ihlîs: ezazîl. Dojeh: cehenem. Kubar: payedar. Gor: tirb. Jir: jêhatî. Ateş: agir. Pate: dest hildan û afirîn

Kar ker bi mîni bê bitaq
 Xwende kitêba tîxi taq
 Agir bi barî ser şîmal
 Em kê bibin dost û heval
 Tarî bibin çol û çiya
 Mêze nekin halê biya
 Ser jêr bibin şax û gulî
 Bo me ne bî dad û gîlî
 Dijmin bixwazin kaniyan
 Serbestî yû mal û jiyan

cotar bibêjî ya rezaq
 bê cî bidêrî serxweş^(*)
 dijmin bi hêrî pîr û kal
 malê me tevda hilweşî
 ber ba bibin zad û giya
 nav me bi mîni ser keşî
 bo hev bikin em bê dilî
 nav xwe hilînin laleşî
 kar û dirav û her ciyan
 da em bi mînin bê leşî

* * *

Ger dê bi mîni her wiha
 Ber asitan û dergiha
 Ser ra nebî darê sitem
 Pê şa bibî Tirk û ece
 Hefsar û tîra dijminan
 Doz û dvoka xainan
 Ramanê renga reng hebin
 Tîrêjî kurdî berze bin
 Destê me qetnabî dirêj
 Lîkra me şaş û xav û gêj
 Bê rûmet û qedr û şeref
 Em dane kuştin tev bi hev

bin destê mar û ejdiha^(*)
 jar û pepûka ber teşî
 derba kul û derd û elem
 tazî bila kî rû reşî
 çengal û tora bê binan^(*)
 ker tîm bixwazî kelbeşî
 pêlê nejadî tê nebin
 bê cendik û bejn û leşî
 dewra me na dî fîtl û rêz^(*)
 bê mujde û bê şabeşî
 tarîne ser me roj û şev
 dar û şîva sor û reşî

Rûmet: qedir û şeref. Ca: cî û cih. Zerkeşî: welatparêzî. Bitaq: destûra kar.
 Yarezaq: yanî destê xwe bidî ber rûyê xwe û bibêjî xudê bidî. Bin: kok. Berze:
 winda. Cendek: gewde û las. Bejn: qam. Asitan: zîlana ber devê derî.

Rast û çepan em tev birin
 Zaro ji birçîna mirin
 Nîne welat û war û cî
 Bin darê dijmin mane gî
 Bê dewlet û bê xweserî
 Bê dost û yar û bê zerî
 Lê em eger tev bibine yek
 Em deng bidin dewra felek
 Ava dîkin dada keyan
 Bê hêvî yû derd û ziyan
 Serbest bixwînin xwendevan
 Gavê didin rengê cihan
 Bera bikin puşt û dîzan
 Bala dîkin jar û xîzan
 Bo Kurdê jîr û hendewar
 Dijmin dike jev tar û mar
 Karê wî tim bo niştîman
 Tim dest girê û pişteban
 Doza ewî em şa bibin
 Pîlan ker û zana bibin

ber destik û kole kirin^(*)
 bo me tunîne zer keşî
 rengê mirî bê dest û pî^(*)
 bê fikr û bîr û bê heşî
 karê me her tim ber berî
 ser me xuya bî tim reşî
 ser xwe hilînin xap û dek
 şayestê serdar û beşî
 tînin diyarê nû çeyan^(*)
 ê dî di nav me na meşî
 zana dişînin berleman^(*)
 wînda dîkin pênc û şeşî
 tata bikin nîr û mijan
 sed aferîn û şabeşî
 ger tengî bê ew tê hewar^(*)
 tîne diyarê zer teşî
 nabe hevalê bê ciyan
 na hêle derd û xem keşî
 jîr û şiyar û ca bibin
 da ku bigîn kêf û geşî

Di 27. 8. 1965 an de saz bû ye.

Fikir: raman û tevdir. Xav: ne gihiştî. Mujde: mizgîn. Sabî: mezinatî. Destik:
 hevalbend û xulam. Zerkeşî: welat parêzî. Gî: giş. Tar û mar: bilawila. Tîne
 diyarê: dide xuya kirin.

WELAT PARÊZ

Welat parêzê bin dest û sitembar^(*)

Belengazê ne yar û bê ked û kar

Dibînim te niha bê qedr û qîmet

Wefa darî ji bo kar û xizmet

Pepûkê xwendin û nav û nîşanî

Tenê bê xame û tîp û zimanî

Gelo bo çi hewar û deste gêrî?^(*)

Digel vê ber tîfing û şûr û kêrî

Tenê bê leşker û ol û civatî

Di sirgûma ne yaran bê beratî

Xuyayî bê bijar û berlemanî^(*)

Ji lew jar û perîşan û xizanî

Ji lew bê dewlet û dîn û felatî

Di زندانê ne xweş û bê beratî

Şvê darê te ber jêr û ziwane

Xeberdanê te bo çi bê bihane?

Gula te çilmisî ava te dûre

Pelê te hilweşî coka te kûre

Ber û zadê te bin dest û piyane^(*)

Di enbarê xidar û bê ciyane

Sitembar: zor lê hatî. Belengaz: perîşan û şerpeze. Pepûk: melûl reben zîvarî.
Xame: qelem. Tîp: herf. Leşker: esker. Ol: dîn. Berleman: civata bijara.
Felat: xelas. Zenbdan: cihê saxan.

lê te birçî yû pêxwas û tazî
Di qada dijminan bê çek dirazî

Di dûrî da nexweş û pîr û kale^(*)
Ji ber jan û kul û derdan dinale

Divoka te berê topan dixwaze
Bi destê pehlewana û dîl bi soze

Bi pêt û agir û polad û hasin^(*)
Di xî bendê ne yar û pîs û xain

Gurê hamî li zozana dizûre
Kerê bê cî li çolê tûre tûre

Welat û gel dibînin te vejîndar^(*)
Ji bin destê sitemkar û segê har

Ji tora xain û keynar û xokan
Ji dava pîr perst û ser gilokan

Ji hîfsarê ne zanîn û xeraffî⁽⁴⁾
Ji çengalê xizanî bê ziravî

Te hilda ser milê xwe restegarî
Ji bo millet huner bazî şiyarî

Di xwazî ku welat û cî bibin şîn
Ne mînin dîlû bê kar û xwîngîn

Ji xew rabe serî rake bibîne
Bi mîna te dinê kes tunîne

Cihan tev gulşen û bax û buhare
Gelê têda şiyar û kar û bare

* * * * Di 5. 2. 1961 î de çê bû ye

Qad: zevî û erd. Jan: êşa giran. Divok: daxwaz. Vejîndar: jîndar û ava kerê
welat. Seg: kûçik. Har: gezoker. Tor: masîgêr. Xok: beraz. Restegarî: rizgarî

WELAT

Welat tu ketî destê ne yara
Li te firyad û qîrîn û hewara

Dibê tarîx bixwîne min bibîne^(*)
Ji pencê gur û ejder derîne

Glek navdar û şêrîn û bi dengê
Şepal û nazik, rengîn û şenge

Cihê mêr û piling û kurd û şêre
Çiya û lat û derbîned û zinêre

Kelat û xar û kendal û newale
Bi vî rengî dizanim bê hevle

Hemî şax û giya û deşt û zozan^(*)
Wekî qîza delale ber dil û can

Kevane rû hilale mêrg û kanî
Tune wek wî di bajarê cihanî

Bi navê nift û petrolê xuya ye^(*)
Ji lew nava cihanê ser bi ba ye

Di rast û çep dibînim qêr û denge
Li ser kara ewî pevcûn û cenge

Timî ber top û lêdan û tîfinge^(*)
Kula canê sîtemkar û fîringe

Çep û rastê cihanê dil birînin
Ji bona wî ne xweş û har û dînin

Firyad: imdad. Tarîx: mîjo. Ejder: marê mezin. Şepal: sipehî û rind. Şeng: qenc. Xar: şikeft û mixare. Kendal: kort û newal. Şax: gulî û çiya. Kevan: rengê kevanê tewandiye. Hilal: hîv.

Çilo daxwaza u doza ro helate?^(*)

Ulo dijmin li ber wî bê tebate

Tijî lal û dirav û zêr û gewher

Tijî kibrît û pilade sera ser

Gul û reyhan û bîstan û ber û dar

Ziman lalê ji pesnê wî bi gotar

Kulîlk û çîmen û ava zelale^(*)

Tijî pes kofî yû xeyd û xizale

Delav û cok û cobar û gelîne

Kinar û xendeq û sîp û devîne

Çinar û çêrgah û mêşdare

Çem û bax û glistan û buhare

Nexasim dicê bane dê Furate

Gelê tê da ji koka ro helate

Nemek jê hamî yû bê cî di xwarin^(*)

Ji vê qencî çencî ser xweş û kwarin?

Çilo aştî nizanin bê emanin?

Dilovanî ne dîne lew bi janin

Derê dad û edalet hatî dadan

Bi destûra ewan qelane berdane

Ne însanin dibê qê ew dewarin

Ji bo barê ziyane kar û barin

Ciher devda kerê Hamî ji banî
Di ro ava dizî konê xwe danî

Segê bê cî ji birçîna dinalî^(*)
Ji umrê xwe ne dîtî qet Halalî

Li ser baxê buhîştê hatine hev
Dibêjin ey kurê ristem tu derkev

Çilo jê me berê tarîx û dîrok^(*)?
Çima bo bê ciyan îro bi bîm gok?

* * * *

Tebat: hedan û hedar. Sera ser: hemî. Ber: mêwe û fîkî. Gotar: gotin. Çimen: mêrg. Xêd: dehl. Deriyê avê: devî: newalên kûr û teng. Mêşdar: cihê mêşên hingiv.

ERÎNA WELAT Û DEĞEL NÎŞANA

ŞEHÎDAN

Kom û kofi bi rengê erxewanî
Kezî berdane ser sîngê zer û sor

Girêda kembera zêrîn di navê
Enî rewşen dida gerden bi zîve
Di sîngê zer nîşana ser fîrazî
Ji rewşê afîtaba asîmanî

Li Ermîniya serî, pî ser Furate
Di Loristan û Meraş kursî danî
Ji Gurcistan û Lazistan û Xatî
Kîrî kember li noqa xwe girêda

dibê xwîne çekê xwe tê hilanî^(*)
xelek dane li ser anî gulî sor

serî ta pî xwe dada ye gulavê
nizanim roje yaxud Aşm û hîve^(*)
di navê jêr xuya ye kêf û bazi
zerî ser destiya şêr û beranî

li Sîwasê heya Urmî civate^(*)
li dewra xwe huner danî helanî
ji Hemrîn û ji Efrîn û Melatî
dilê dijmin bi arê û dax û kêda

Ciher: tûrikê ceh. Umr: temen. Tarîx: mîjo. Kum: bo mêrane. Kofi: bo jinane.
Erxewan: sorê zelal. Anî: pist çavk.

Dida ser pişta zozan û Serheda
 Pi çep girtî avdergeha Paris
 Bi xap û fen ji destê min sitandî
 Kirin parî gihandin çil û çaran
 Niha fikr û gumanê bê nejadî
 Bi bîr û bawerî xerzik diçandin
 Bi nan û pariyan bûne biyanî
 Dikin berda hemî tene qelandin
 Bi xwe em tene hevdû weke neyaran
 Dibê qê tev birayê hev dikiştin
 Gumanê ku ji nejdê ya ji turkin
 Nizanin ku cihan tevda giha ye
 Çilo hê ew dibêjin em beranin
 Kurê Daryos û Zara û Qubadin
 Ji koka Ariyan hatin cihanê
 Ji Kosî yû ji Kasî bûne pêda
 Ji Berhîm û ji Nûh û pîrê Manî

bi destê rastê girtî behra Ebyed^(*)
 ji lew dijmin li ser qêrîn û caris
 bi vî rengî gelê min pêtewandî^(*)
 bi kevnar û beg û pîr û dewaran
 kirin pêda dîkin dîlan û şadî^(*)
 bi dîn û nû kerî hatin mirandin
 ji bona bê ciyan xweş pehlewani
 dibendî, ber berî bo xwe çikandin
 bi top û gotin û sarûx û daran
 birin çolê li ber baran hiştin?^(*)
 ji bona hev zihak û mar û gurkin
 ji bel Kurdan kesek bê cî nema ye
 ji tarîx û ji dîrokê xuya nin?
 ji Kurdak û Muj û Majîk û Madin?
 dihêrin agir û derd û zîyanê
 bila bûne ketin derbend û xêda
 di vî warî me danî ser miyanî

* * * *

Hed: sînor ji welatê bapîra tê gotin. Behr: deriya. Eybed: sipî. Av dergeh: cihê deryê avê. Muj û Majîk: bavê kurdin. Zîyan: êş û zirar. Xêd: dehl. Berhîm: birahîm ji ber hîm hatiye dîtin. Nûh: pêxemberê Nûh.

DIYA WELAT

Diya rastî eve ku jê derî tu
Bi pê jîr û şiyar û serwerî tu

Bi pê nava cihanê xwe di bînî^(*)
Li ser wê tu nexweş û dil birînî

Tu şîr dayî bi sîngê boz û şêrîn
Li ser destê delal û gewr û zêrîn

Ne neh salan berê bûne hezaran^(*)
Li ser lat û der û kendal û xaran

Di ber baran û pûk û berf û serma
Di havîn û zivistan û di germa

Li derbend û şikeft û çal û tabî^(*)
Di roj û şev ji bona te di rabî

Xewa şêrîn ji bona wê tunî ne
Ji bona te dizanim har û dîne

Ne heyfe ku bihêlî tu perîşan^(*)
Di bin destê ne yar û derd û êşan

Qe nabinim ji wijdan û ji dadî
Belengaze tu lingê xwe di radî

Ne xweşe va ye ber êşê di nali
Ji çavan hêstirê xwînê dimalî

Qe na pirsî çiye derdê te yedê?
Bi govendê ketî meydan û qadê

Jê derî: jê çê bûye. Jîr: jihatî. Serwer: serok. Boz: gewr û sipî. Perîşan: belengaz û bê xudî. Dadî: edalet. Di radî: dirêj dikî. Qad: meydan û zevî.

Nemek korî Heq û rastî nizanî
Ji bona xwariyê tim dergevanî

Heqê dê ser heqê her tiştî bi bîne^(*)
Bi parêze li ser dstan hilîne

Gelek derdê mezin dîne ji bo te
Çiraxa jîn û helîne ji bo te

Ji dewra beglik û şah û emîran^(*)
Heya noka li ber mizraq û tîran

Ewê carek ne dîtî kêf û xweşî
Di bin destê welat û dîm firoşî

Ne da alî li ser wechê xwe carek^(*)
Cila şînî ne di bona xwe parek

Di vî karî li zozan û newalan
Di kêşî tim kul û derd û mitalan

Kuta na kî qe na nêrî cihanê^(*)
Çilo na bînî vê dewr û zemanê

Diya te bes melûl û ser bijêre
Li dewra xwe bi çavê reş dinêre

Heya kengî bi mînî bê kes û kar
Tu xew dayî qe carek na bi huşyar

Li diwanê bikî qêrîn û halan
Bibînî nazik rind û delalan

Bixwînî tîp û zaravê biyanî^(*)
hilînî şûr û mertalê xizanî

Bigînî xwe gelê bê par û bê zar
Ji daxwazê bikî jar û birîndar

(1)Nemek: qencî û wefadarî. Heq: maf. Çirax: çira. Jîn: xweşî.

(2)Brgler: mîrekan. Şah: ji şahî hatiye. Noka: niha. Beglik: derebegî. Mizraq: ser tîr û ser rîm. Helîn: cihê rawistanê. (3)Zozan: cihê sar û serma.

(4)Kuta: xelas. Melûl: xemgîn û bê kêf. Halan: dengê bilind.

(5)Tip: herf. Zarav: şêwe. Biyanî: ejnebi. Xizanî: hejarî. Jar: şerpeze

KURÊ WELAT

Didî dax û birîn, der nav û hindir^(*)
Bi sed êş û keser anî ne pênc kur

Ji bona te dibêjim ez yeka yek
Bi dil bigre nemîne jar û xwestek

Mezin xwe da demek ma bû perîşan
Li ber darê ziyan û derd û rîşan

Welê hatî gumanê Ristemê Zal^(*)
Kiri destê xwe şûr û gurz û mertal

Wekî Kawe ketîm eydanacengê
Dixwazî ku derîni gurz û şeng

Ne hêlî kes li ser sîngê bidîpal^(*)
Di qadê da xuya kî bêreq û al

Li ser zar û cih û warê delalî
Tijî pitrol û kibrît û lu alî

Hinek cengê huner mend û dilawer^(*)

Wekî roja ku da ye der ji xawer
Di bîstana buhîştî kirne pêda
Li derbend û zinar û lat û xêd

Ji rêva ez yeka yek bo te bêjim^(*)
Eger çi ez bi pê ne dest dirêjim

Wekî cenga Rîza – Xanî li Dêrsîm
Demek çû ew wiha her wekî hîm

(1)Didî: dê didî xwe dide rex lev rista diya we gerek di wir da bi hata gotin lê me ji bîrkiribû. Keser: kovan. Mezin: kurê mezin. Rîş: birîn.

(2)Welê: welakin. Gurc: sipehî. Şeng: qenc.

(3)Qad: zevî. Bêreq: ala.

(4)Dilawer: gernas. Xawer: rohelat. Xêd: dehl.

(5)Ceng: şer. Rîza – Xan: kurê Bîrahîm serekê êla Koçan û Hesenan di buhara

Li ber dijmin wekî koh û kelate
Kula canê ewî bo me felate

Di gotin Şêrê Merdan ger ne yî ser⁽¹⁾
Nikarî kes ji vê cî me bikî der

* * *

Nizanim ev çi derd û çi belaye?⁽²⁾
Çima Şêrê E'î bo wan biha ye?

Ewî nadin welat û dîn û dewlet⁽³⁾
Heya noka ne dîne qedr û qîmet

Ji Nejdê hatiye bû ye piyamber
Gelo pê ditine tevdir û tevger?

Bi mêranî dibûne ew Qizilbaş⁽⁴⁾
Eger çi ol û kokê da ewin şaş

Eve ku ew ji me dane qetandin
Bi vê tevdir û nêçîrê tewandin

Ji bona hev ne dîne qet hevalî
Dilovanî ji wir xwe da bû alî

Gelê Dersîm bi xapan jev qetandin
Şêrê Dersîm bi wan da ye mirandin

Çemê menzûr tîjî kir wan ji laşan⁽⁵⁾
Didane ser bi çarox û kelaşan

Bi xwînê sor kirin ew av sera ser
Li ber pêlan ketin xort û gulî zer

sala 1930 – 1937 şer gihîşt dawiya gur bûnê ji ber ku şoreşa Dersîm di 1878 an
dest pê kir bû. Hîm: lat.

(1)Koh: çiya. Kelat: asê geh. Felat: xelas. Şêrê merdan: Îmam E'î kurê ebi
Talib. (2)Piyamber: pêxember.

(3)Qizil: sor. Baş: ser. Eve ku: ol û rêçik.

(4)Dilovanî: dil nermî û dil tenikî. Mezûr: navê çiyayekî ye dişi çiyayê
Mehmûd not. Çarox: ji çermê dewaran çê dikin û dixin lingê xwe.

(5)Sera ser: hemî. Gulî: kezi.

Çil û heşt heb kirin sê pî ji wana^(*)

Hemî gernas û serdar û tekane

Ji vana wek Riza — Xan û E'li şer^(*)

Wekî Burhan, Husey û şêrê Qenber

Xudanê cî bi zorê jê kirin der

Di hiştin bê xebat û hîn û tevger

Wekî gokê didane ber şekê hol^(*)

Revandin tev birin xistin Enadol

Gelê xwe anî danî wê derê tev

Evên mayî bi naçarî kirin rev

Heyanî ku zimanê bav û kalan^(*)

Bidin zaravê tetrîk û kemalan

Di Palo Şêx Se'îd rakir beranî

Diyarî kir ji bo me pehiewanî

Ji Xerpûtê heya Mêrdîn hejandi^(*)

Dilê dijmin ji laşê hilqetandi

Felek darê xwe hilda bû milê xwe

Cila reş dida ser hingilê xwe

Bi xama sor xira kir defterê me^(*)

Kirî sê pî bi zorê rêberê me

Di vir dewra me çep hatî gerandin

Şêrê me tev ji daxwazê qetandin

(1)Çil heşt: di 18. 10. 1937 an de di Xarpût de meydana Mezlum paşa kirin sêpî. Gernas: pehlewan. Tekane: bê heval.

(2)Riza — Xan: kurê Birahîm umrê wî 75 sal. E'li şer: ji êla Hesenan. Huseyn: serekê êla Qurêşan. Qenber: serekê êla Yûsifan. Hîn: zanyarî û zanîn.

(3)Hol: lîzka bi gokê. Enadol: ji hela hatî re tê gotin.

(4)Di Palo: di sala 1925 an de Şêx Se'îd di roavayê Palo gundê Pîran tevdîra

Bi zarê hov û diwane xeber da⁽¹⁾
Me Kurdistan ji destê Kurda der da

Qeder ger çi wiha xame kişandî
Gur û rofî di wê qadê civandî
Bi bêjî ev bi destê izdê banî
Ji bona me berê da bû xuyanî

Welê jêre ne bû tevdîr û zanîn⁽²⁾
Ji bona xwe çek û destûr ne danîn

Cihê xwe ber dida hatin ketin jêr
Ketin dava ne yar û Kurdê bê kêr

Kirin darê di Amed şêrê Kurdan⁽³⁾
Ketin ber agirê napal û derdan

Ne bêje cengê merdane dirabûn
Gelê Kurdî ji binva tev bila bûn

Nişanê kurdîti carek ne mane⁽⁴⁾
Gelê bê cî dibînim tê xuyane

Didin dîtin ku hew karin xuya bin
Wekî mêran li ser lat û çiya bin

Ne wa ye ey felek ev pirs û gotar⁽⁵⁾
Gumanin bê berin na bin ked û kar

Dibin tevdîr û raman û şiyarî
Didin zanin ji bo me restegarî

Bi wana em diçin meydana cengê⁽⁶⁾
Didin dîtin cih û war û qeşengê

Bi destê hasinî tola şehîdan
Bi mêranî wekî şêr û egîdan

Divê ku em ji bê waran hilînin
Bi ser bestî di warê xwe bi mînin

(1)Zar: ziman. Diwane: din. Xame: qelem. Qad: zevî.

(2)İzd: xudê.

(3)Amed: Diyabekir. Dirabûn: hatin, helanîn û ne man.

(4)Nemani: an ku hew karin doza kurdanî bikin.

(5)Gotar: gotin. Ber: havil. Raman: armanc û nişan. Restegarî: rizgarî.

(6)Wana: ev şoreşên ê ku derbaz bûne. Qeşeg: qencî. Tol: heyf.

Di Cbax çûr di bû halan û qêrîn^(*)
Xuya bû tê şerîf û dengê Yadin

Ne yarê xwe kirin jar û birîndar
Didane ber tîfing û xincer û dar

Heya Turkan di bajarê mezinda
Di hêl û êl û deşt û koç û gunda

Dibizdandin kur û qîzên xwe yekcar^(*)
Bi wana ew kirin naçar û bê mar

Digotin deng ne kin Yado niha tê
We dimrîne dide ber agir û kê

Çikim dewra cihanê xwar û çep hat
Qedr şîn û siya bona me da hat

Ji darê gul weşî ro çû ye ava
Li ser canê şehîdan bik silavan

Di Bedlîs û Sason û di Zîlan^(*)
Di Agrî – dax xuya bû deng û lîlan

Bi destê Kemal Xwêbûn û Ihsan
Şerê Agrî dihatî qad û meydan

Sitemkaran ber û agir rijandin^(*)
Bi destê me çira me da mirandin

Binê bê dîn bi zarê xwe nusandî
Li ser çiyayê Eraratê çikandî

Li vir gore ji bo Kurdê xeyalî^(*)
Divê bimrin ne mînin ew tu alî

Tif û la'net li destûra Kemalî
Di dana me ne xweşî tîrşî, talî

Tif û sed tif li te ey dijaminê har
Dema Kawe dermî cejnê adar

Ji me rabî lehî dijamin ziabî^(*)
Ji warê me kerê bê cî betabî

* * * *

(1) Cêbax çûr: ji 3 pîrsan hatiye girêdan, cê: cih, hax: baxçe, çûr: av xuya dibe ku têda av û dar û ber pirin û hem kaniya pitrol û hesin û gewheran têda heye. Hatan: dengê bilind. Xuya bû: di 1929 ê zayî de. Şerif: Şêx Şerif û birayê wî Şêx Huseyn. Yadin: yek ji mîrekê Cêbaxçûr bû û bi mêrani nav û deng bû. Bizdandin: tîrsandin.

(2) Naçar: bê tevdîr. Bê mar: ne xweş. Kê: dax.

(3) Siya: reş. Dahat: daket.

(4) Bedlîs: di 1913 ê zayî de bi serokatiya Mela Selîm û Şîhabedîn û Seyîd A'îlî — şer pê ket. Sason: ji 2. 1925 an heya 35 bi destê A'îlî ûnîs şer pê ketî bû. Agri: bi serokatiya Ihsan Nûrî Paşa 1931 î de şer pê ketibû.

(5) Sitem: zor. Ber: gule. Nusandî: nivîsandî. Erarat: Agri.

BIN DESTIYA KURÊ MEZIN

Welê noka ji bo komir şivane
 Ne Kurde lawê tirkîr bê felate
 Di cengê pêşber û şêr û berane
 Sitandî jê cihê wî ma ye çolê
 Tim û tim ber ziyamî bê qidoşî
 Di sînoran kelat û pehlewane
 Jin û zaro di sergûmê tenê man
 Ji birçîna zikê wî nale nale
 Di زندانê rizî bona cihê xwe
 Di bin darê ne yar û koledare
 Binê dijmin qanûn çilo derandî

Xulam û rencber û dîl û
 xizan⁽¹⁾ dergevan û bê berate⁽²⁾
 Di şengê pişte mêr û tercimane
 Serî goke li ber lêdan û holê⁽³⁾
 Di kêşê jan û derd û pîr ne xweşî
 Li ser piştê timî barê girane⁽⁴⁾
 Ji bo dijmin fida kir wî dil û can
 Ji pêxasî ne xweş û pîr û kale
 Li ser zar û ser û pîl û mihê xwe⁽⁵⁾
 Wiha bê heq dizanîm tewbe dare
 Ji binva dînê pêxember helamî?

(1) Xeyalî: gumanî. Gor: tirkî. Tu alî: alîkî ji aliyan. La'net: dîr kirîna ji dilovanî. Har: serxweş. Kawe: daxwaz pê Kurdê dilpaqij û welat û pehlewana. Adar: buhara pêşîn û hermî pişkuwan.

(2) Ziabî: bimrî. Betabî: windabî.

(3) Welê: welakin. Noka: niha. Komir: navê bavê Tirkane. Xulam: kole. Dîl: bindest.

(4) Felat: xelas. Xizan: hejar. Şengê: qencitî. Terceman: wergêr.

(5) Hol: gok û lîzka bi gokê. Qidoş: şens û bext.

(6) Sirgûm: dîr kirîna ji welat. Fida: gorî.

(7) Zendan: cihê saxan û hebs. Zar: ziman. Pîl û mih: mezin. Tewbedar: poşman. Binê: binêr û mêzeke. Qanûn: destûr. dîn: ol.

Gelo bo çi ber te da ye olê?
Bi şîranî te da ser dest û kolê

Di navê bê cih û warî nizanî⁽¹⁾
Di tirkêşî çeleng û pehlewani

Ne dîndar dibêjî ber bide dîn.
Ji bona gerandî jîn û mizgîn

Di bê poşman bibe tewbê bike zû⁽²⁾
Qene ku te kutakî ber terazû

Çi ye tewbe nizamim ka bi bêtî?
Gelo diwane ye yaxud nimêje?

We ya pêman û soze ku bibin yek⁽³⁾
Ji nava xwe derînin dijmîn û duk

Ji bona zik tirêl û kurdê bê kar
Ne bo jar û belengaz û sitembar

Dibînim pîr bi vî pev kirine dijmîn⁽⁴⁾
Dibin dostê ne yaran ew hin û hen

Dibîni ji hevra wek gurane
Ji bona bê ciyan yar û berane

Bi vîna qenc dizanim tewbedare
Ji bona wî kesê tim bende ware

Ji daxwaz û ji ramanê dimîne
Tim û tim rî dirêj û ser hejîne

Jin û zaro dihiştin malê bê nan
Di kar û xizmetê va ye dide can

Çima na bê here mala xwe carek? Ji bona xwe bike tevdîr û karek

Divê jêra bibî kole şev û ro Eger bêtî welatê me dibê to

(1)Kol: mil. Tirkêşî: doza turkanî. Çeleng: mêrxas û sivik. Ne dîndare: Turk bi xwe ne dîndare. Jîn: xweşî.

(2)Tewbe: poşmanî. Qene ku: da ku. Kutakî: xelazkî. Terazû: mîzan.

(3)Pêman: qîrar. Dek: xap. Jar: nexweş û zeîf. Sitem: zor.

(4)Pîr: şêx. Bendewar: ber bend. Raman: fikr û tevdîr.

TEVGERA BÊ NEJADÎ

-Kum û kolos helanî xirqe danî^(*)

Li ser bejna ciwan û hêziranî

Rî yû şaşa tebara rengê sofî^(*)

Li xwe danî bi mîna hirç û kovî

Cilik ser çav û tizbî dest û milda

Li ser dest û piyan û xwe xist û hilda

Bi dev destê keran girt û mijandî^(*)

Li ser çav û serê xwe rakîşandî

Serê pîran ji bo wî sund û pêman

Guman û xew, xirafî dîn û îman

Bi kaboka diçe ser dev li ber pîr^(*)

Kirî dest û piyên wî qeyd û zincîr

Kerê kortan kirî pîr lê suware

Berî da ye buhîştê zare zare

Di zûrî ber derê pîrê sitemkar^(*)

Dizê millet ji bo olê gurê har

Pîçûke nû ciwan û rî dirêje

Ji lew şaş û ne zan û lal û gêje

Esîr û bê kes û bê tîp û xame

Ji bona wî hunermendî herame

Nejadî, ser bilindî, niştimanî

Xebat û xwendin û hîn û jiyanî

(1)Kum û kolos: nişanê Kurdên kevnare ne. Xerqe: ger çi nişana Kurdên Êzdîne lê ne kevne berê nişana sofîyan bû û dûra bû nişana Êzidiyan.

(2)Tebare: dêwî girtî ji binva zirav û jorva fireh. Govî sewalên berri.

(3)Pîran: şexan. Pêman: soz û qîrar. Xirafî: direwî. Îman: bawerî.

(4)Qeyd: bend. Buhîşt: cennet.

(5)Sitemkar: zorker. Mile: gel. Ol: dîn. Har: gezo ker. Lew: lewra.

(6)Esîr: bindest û girtî. Tîp: herf. Xame: qelem. Nejadî: kokî. Hîn: zanistî.

Jiyanî: xweşîti. Niştimanî: welat parêzî.

Birin dîwanê dane şîreta pîr^(*)

Ji bo tîrê segan lew seyd û nêçîr

Ji bona xwe di kêşe bend û komel

Ji dijmin ra heval û dost û hevgel

Ji alîkî gelacî, sextekarî

Rexê dî ber berî gendî, gemarî

Milê dî kuştin û talan û hovî^(*)

Kirî sitû gem hefsarê rovî

Derî zarê buhîştê min dizanî

Bi naçarî dida zarê zebanî

Çi zaravek kirêt û pîs û murdar^(*)

Ji bona xwe kirî qanûn û ber bar

Cih û war û civat û nav û nîşan

Guhertin lew di ma jar û perîşan

Wekî koran berê xwe da ye olê^(*)

Li nejdê lew dike nêçîr û holê

Bi qeflan tev jin û mêran di nav hev

Çilo ber jêr dibin çawa dikin rev?

Diçim mala xudê bê ku bizanin^(*)

Dirûste ya ne başe bê ziyane

Ne bê ku ez dibêjim hec herame

Bi vî rengî dibînim wek xemame

(1)Dîwane: cihê sofîyan. Pîr: şêx. Seyd: nêçîr. Komel: civîn û civat. Hevgel: hevpar û dost û hevalbend. Sextekarî: direw karî û xapandî. Gendî: qirêjî.

(2)Mil: alî û rex. Isto: mil û qirik. Derî: zimanê kurdî ê gund û êlan. Naçarî: bivê û nevê. Zebanî: daxwaz pê Turkin.

(3)Kirêt: pîs. Murdar: mirar. Lew: lewra. Jar: şerpeze. Perîşan: belengaz û ji hev ketî.

(4)Holê: lîzkê. Qeflan: kom kom.

(5)Mala xudê: hec. Bi vî rengî: an ku hejar û bê pere herin.

Di umrê da heye carek herî hec
Çima her sal diçûnê tu dikî lec?

Çilo destûr tunî ne ya bi dêne?⁽¹⁾
Gelo ev pirs û gotarê xudê ne?

Dibînim pirsê kurdanî herame
Çilo pirsê biyanî rengê came?

Ji bona xweserî ber jêr û bê ber⁽²⁾
Ji bo dijmin herro sed car dikin şer

Digo bave ji bona me Eta turk
Nizanin ji bo wana ewe gurk

Di xwazî ku ji kokê wan bi hêrî
Bibî çolê li ber bakî bi dêrî

* * * *

* * *

* * *

(1)Lec: kîn û pevçûn. Bi dêne: an ku gelek jê hejarin û ji xelkê pere dên dikin û diçin hecê berê turkan ne dihişt û niha destûr didin. Biyanî: ejnebî.

(2)Ber: havil. Eta Turk: bavê turk Kemal paşa. Gurk: gur.

(3)Şehinşa: şehê şahin. Pêman: soz û heval bendî. Biyanî: dujminê koledar.

KURÊ DIWAN: (2)

Di bin destê şehin şahê ziyânî^(*)
Gurê dîn û gel û mal û ziyânî

Bi dest û dev şidandî barê dujmin
Li ser millet hejandî darî dujmin

Ku dest avêti pêmân biyanî
Werise bo derd û kul û xizanî

Eger çi ew dibêje pehlewî me^(*)
Di rêza Kê – Qubad û Xusrewî me

Welê şaxek ji pêmana sitemkar
Di Îranê xuyanî kir segê har

Xizanî: hejarî û belengazî.

(4)Pehlewî me: di koka xweda Kurdin. Kê: mezin. Qubad: dadewer. Sitem:
zor. Seg: kûçik. Har: gezoker ji hêranê hatiye.

Di Se'ed Abad û Bexdadû bila bû^(*)
Gumanim ku ji bona me xuya bû

Şehê puştî, gewndî, koledarî
Ben û destê sitemkarî, ne yarî

Nizama kevn û kevnare deranî
Li ser qada hunermend û beranî

Li ser erdê Ferîdon û Diyako^(*)
Xela rakir ji awder ta li Bako

Gelê îran hemî bê lûn dihîştî
Wekî dîn û dewaran ew dîlîştî

Birin çol û newala hovî danîn^(*)
Wekî koran li derbendan ne zanîn

Siya poşin bela xistin milê xwe
Bi gurz û xincera hatin dilê xwe

Li ser mala Huseyn xwe dane kuştin^(*)
Riya xwarî heya noka di hiştin

Huseyn lawê restûle bo çi hatî?
Li şarê Kerbela çê kir beratî

Ji bo mal û cihan û deng û dewran^(*)
Cih û warê xwe lew dest xwe berdan

Gelê Îran wekî hovan dinalin
Li ser şîna Huseyn şêrê Zalin

(1)Sa'd Abad: navê bajarekî Îranî ye dikeve jêrê Tehranê. Puşt: qehp.
Gewendî: mitirbî. Nizam: destûr. Qad: zevî.

(2)Feridon: kurê Cemşîdê Kasî. Diyako: yek ji ser û ber kerê dewleta Mêdiya.
Awder: xelîc. Bako: dikeve ser perava derya Qizwînê. Hîn: zanîn.

(3)Siya: reş. Poşin: li xwe kirin.

(4)Huseyn: kurê Fatma. Noka: niha. Law: kur. Şar: bajar.

(5)War: welat. Şêr: risem.

Kesê ku bête kuştin ew şehîde^(*)
Li cem wana gelek qenc û Se'îde

Ne dîne ev xirafate me zanî
Kul û derd û nezanî û xizanî

Wekî kêvcalê girtî ser dilê me
Li ser darê firandî bilbilê me

Birayê me wekî me dil birîne^(*)
Melûl û bê cih û par û hîne

Ne xweş û dil kul û jar û sitembar
Xizan û bê civat û bê ked û kar

Ji bona wî felat û xîz û xame^(*)
Di warê tenê îro herame

Pesindare ji bo şahê sitemkar
Ne însan û ne heq zan û ne dîndar

Serê mikrob û dax û derd û êşe^(*)
Li ser me agir û tofan di kêşe

Hezar derdê wekî derdê Ciwan ro
Ne anî ser misilmana Holako

Ku dane ber pîyê teng û meşokan^(*)
Rijandin agîê dojah fiokan

Jin û zaro ji malan tev kirin der
Kirin nişan hemî kuştin sera ser

(1)Şehîd: nemir. Se'îd: bextiyar. Xirafat: direw. Setan: êşeke dijwar.

(2)Melûl: xemgîn û bê kêf. Hîn: zanistî û zanîn. Jar: nexweş û zeîf. Sitembar: zor lêhati. Xizan: zîvarî û hejar. Ked: kesp.

(3)Felat: xelas. Xîz: xet. Xame: qelem. Hiram: ne dirûst. Însan: mirûv. Heq:

(4)Mikrob: mak êşekî dijware. Ciwan ro: dikeve hêla bajarê kal ye li ser sînorê Îran û Iraqê di 28. 2. 1956 an de şahê Îranê leşkerekî giran bi top û balafirên kişand ser wan û ji hev bila kirin. Hilako: nivî yê Cengîz — Xan. Dojah: cehennem. Firok: balafir.

Sed û heştê ji pîran û ne xweşan^(*)

Di dane ber devê top û reşşan

Ji mêr û ser firzan bê jimarî

Ji çek dar û edîb û dîn bijarî

Birin çolê kirin sê pî sera ser

Bi fermana diz û ewbaş û ber ber

Di hêlê cî kirin talan û kuştin^(*)

Ji mala xwe tevan destê şuştin

Di barandin ji banî agir û ber

Li ser zad û dewar û zîç bê per

Ne wek derdên Mihabad û cihên dî^(*)

Ne dî nava cihanê tu kesên dî

Bi sed xapan helanî dewleta me

Tefandî war û dîn û rûmeta me

Kirin sê pî ser û mîr û tekane^(*)

Edîb û xwendewar û jîr û zane

Di dane ber tefing û top û napal

Jin û zaro, ne xweş û bê kes û kal

Xelek girtin li dewra Sêf û Qadî^(*)

Bi govend û bi dîlan û bi şadî

Wekî Sedrî, wekî Nedrî, Şirazî

Birin kuştin bi riswaf, tinazî

(1) Reşşe: hûr avêj. Edîb: toredar. Bijarî: ji bijartin, neqandin. Sê pî: dara xengê. Ewbaş: pîs û rihgêr û nezan. Ber ber: ser jê ker.

(2) Ber gule û fişek. Zîç: zarok. Per: çeng.

(3) Mihabad: dikeve jêrê gola Urmiye 22 kanûna 2 1946 an de rizgar bû di 31. 3. 1947 an de dagîr bû. Rûmet: şeref û qedir.

(4) Jîr: bire wer û jîhatî. Napal: çekên giran û dijwar û sotan ker.

(5) Sêf: Pismamê Qadî. Qadî: ser komarê Mihabad. Sedrî: birayê Qadî. Nerdî: Senek Resûl Nerdî. Şirazî: ser heng E'îlî Şirazî.

Felek destê xwe da segê har^(*)
Bi hev şa bûn di dane ber şek û dar

Kirin zindan hezaran mêrê Kurdî
Ji pirtok û ji tarîxan me ev di
Hilani zarê şêrîn û delalî
Di şûnê cî kirî tefrîs û lalî

Dibistan û kitêb û tîp û name^(*)
Bi zarê me li ser me tim herame

Çilo koka xwe da kurde xidare?
Çima jêra gelê me bende ware?

Wekî Nûrî, Wekî Bozo dixwîne^(*)
Cihê text û diya xwe tê dibîne

* * * *

(1)Felek: asîman yan dewr û ger. Segê har: kûçikê gezo ker û dîn û serxweş.
Zindan: cihê girtiyan û saxan, hebs. Pirtok: kitêb. Tarîx: mîjo yan mêjo.
Tefrîs: wergerandîna zimanê kurdî li bal farisî va.

(2)Dibistan: xwendegah. Name: kitêb û reş belek. Zar: ziman.

(3) Nûrî: Nûrî Se'îd di 1954 an de serekê civata bijaran di Îraqê. Bozo: E'li boz
ji kurdên Şamê. (4)Viro ker: diro ker. Wa ye: wiha ye. Pîlan: siyaset. Çepelî:
gend û gemarê ra tê gotin.

KURÊ SIYAN: (3)

Di bin destê ziyan kar gurê har^(*)
Viro ker ez dibînim wî di her car

Dibêjî ez birakim lê ne wa ye
Ji pîlan û ji tevdîrê xuya ye

Kulî xwar û çepel dar û murare
Reş û tazî ji Nejdê rû gemare

Pîyên wî jev qelaştin ber şivani^(*)
Diranê qîç ji nav qîrê xuyani

Ji bo Ingilîz xulam û dûv û nûker
Ne dîndare bi navê dîn dikî şer

(5) Qîç: bel. Dûv: tîrî. Destik: heval bend.

Hefo awakî dîn tîne diyarê
Nimêj û pesn û tesbîh û hewarê

Hefo sed car dixwîne navê îzdan⁽¹⁾
Misilmanî bi fen dertîne meydan

Kirasê reş bi kilsê wî sipî kir
Welatê min bi vî rengî çilo bir?

Bi fen hatî mela û şêx û pîran⁽²⁾
Ji lew xwarî ber û zadê feqîran

Divoka xwe di nav dîndar û sofî
Çi pêk anî bi mîna apê rovî

Belate danî ye şopa mirîdan⁽³⁾
Ji lew zana kirin qêd û kilîdan

Kurê navî bi dax û êş û derdan
Wekî Guhderz û Ristem hatî meydan

Ketî ceng û şer û lêdan û pevçûn⁽⁴⁾
Ji bo zar û felat û jîn û xwêbûn

Wekî şêran ewî çavê xwe kilda
Bi destê hasinî ala xwe hilda

Ji lew pîrê huner-mend û tekane⁽⁵⁾
Di meydanê egîd û qehremane

Bi nav û dengê şêx Ebdî Sselame
Xuya ye Ristemê roja qeyame

(1)Awakî: rengekî û şiklekî. Tîne diyarê: dide xuya kirin. Îzdan: xudê. Fen: xap. Kirasê: an ku xwe dide dîtin ku qence lê di navê xwe da wek zihake.

(2)Ber: mêwe û fêkî. Feqîr: hejar. Divok: daxwaz.

(3)Belate: tişteke ji awayên xwarinê ye wek goşt û mewij û tû dibin devera ya çolê datînin û pê nêçîrî dikin. Hatî meydan: di 1909 an û bi dest pêka cenga cihana 1 di 28. 6. 1914 an ku di 9 - 14 an zora Turkan bir.

(4)Zar: ziman. Felat: xelas. Xweybûn: xweserî.

(5)Pîr: şêx. Tekane: bê hember. Ebdissilam: birayê Berzanî ê mezin. Qeyame: roja dawî.

Çilo gernas û dîndar û dilêre?
 Li ber Osmaniyan rabû wekiû şer
 Pirê Kurdan dibûne leşkerê wî
 Huner da ye dilê dujmin qetandî
 Çikim dem bê wefa bû kurdê xain
 Dibû dûvê ne yarê bê wefa dar
 Eve ku diçin banî serê lat

Wiha laşê diz û dujmin dibêre^(*)
 Bi top û xincer û mertal û şimşêr
 Gumanîm ku tuî ne hemberê wî^(*)
 Wiha koza ne yaran hilweşandî
 Li ber rabû bi navê ol û ayin^(*)
 Xwe ispartî kerê tazî li ber bar
 Digel pîsa dibin bê kar û ber bat^(*)

* * * *

Di pê şêxê hunermend û dîlovan
 Di hevraz û kelat û dehl û xêdan
 Bi destê hasin û pola xuya bû
 Li ber Englo ketî ceng û ketî şer
 Welê dewran bi vajî xame danî
 Qeder pêra ne bû yar û birader
 Birin Hindê kirin hebsê demek çû
 Bi tevdîr û şiyarî şêrê merdan
 Welê ronî dibû tarî li ber wî
 Felek piştî xwe da pîrê tekane
 Divoka wî ketî destê ne yara
 Dilê wî vê buhîştî şîn û rengî

Bi dijwarî, bi jan û derd û kovan^(*)
 Bi navê pîrê Mehmûd hatî meydan^(*)
 Di meydanê piling û ejdeha bû
 Ji Ingilîz pir mirandin mal û leşker
 Li ser pîrê vejîndar û beranî^(*)
 Ji lew girtin ji war û cî kirin der
 Bi naçarî, perîşanî berat bû
 Xwe kir serdar û paşayê me Kurdan
 Gel û leşker hemî çûne li ser wî
 Li ser danî ber dar û mijane^(*)
 Berê xwe wî dida ye dost û yara
 Ne bû şa jê ne dîtî tu qeşengî

(1)Gernas: mîr. Dilêr: pehlewani. Şimşêr: şûr.

(2)Leşker: ji du pîrsan hatiye hev yek leş ji laş û ker ji hûr kerin hatiye.

(3)Xain: wekî Faris axayê Zîbarî. Ayin: ol û dîn.

(4)Berbat: ji hev parçe parçe.

(5)Dilovan: dil nerm û dil tenik. Jan: kul û êş. Kovan: keser.

(6)Hevraz: çihê bilind û asê. Xêd: dehl. Pir: şêx. Hatî meydan: di 16. 6. 1919 an. Ejdeha: zîha lê divir de bi daxwaza pehlewane. Englo: Ingilîz. Ceng: şer.

(7)Vajî: meqlûb. Xame: qelem. Vejîndar: welat parêz û ava kerê welat. Naçarî: belengazî. Perîşanî: şepirzayî.

(8)Tekane: bê hember. Ber: gule. Mijane: ji aletên engaze. Divok: daxwaz. Qeşengî: qencîti.

Demek çû birin xincêr û gurzan
Bi mêranî egîd ê êla Berzan

Pî yû dest û serî polad û latin^(*)
Di cengê Dersîm û kob û kelatin

Ketin çol û çiya û burc û xaran
Şikeft û kozik û deşt û zinaran

Wekî şêran di meydana beran in^(*)
Serê dujmin dihêrin qehreman in

Di pê hev dest bi dest dujmin dikuştin
Heya noka cih û warê xwe hîştin

Heya ku yek ji vê malê bi mîni^(*)
Ji bo Kurdan divê ew dest hilîni

Tu xem nî ne ji bo warê me Kurdan
Hebî tê da wekî şêrê di Berzan

Di çar cara ketî meydana cengê^(*)
Di vana de dide qêrîn û dengê

Tevan da ser bilind û paye dare
Huner mend û vejîndar û bijare

Ne wek hinkan dibêjin paş dima ye
Bi ronahî, bi rindî rê ne da ye

Nîşanê cengebazî tê xuyane
Bikindî ser fîrazî pê bihane

Dilerzîne kelat û kozik û xar
Dibizdîne ne yarê bê cih û war

(1) Egîd: mîr û gernas. Êl: eşîr. Berzan: navê hêlekî ye û gundekî û êlekî dikeve bakur û ro helatê Akrê.

(2) Koh: çiya. Burc: asê geh. Xar: mixare. Noka: niha. War: welat.

(3) Malê: mala Berzaniyan. Xem: kul û kedr.

(4) «1» Di 12.7.1931, «2» di 1.10.1931, «3» di 1.2.1931, «4» di 15.3.1932 de.
Paye: difre. Vejîndar: welat parêz û ava kerê welat. Bijar: neqandî.

TEVGERA XAINAN

Welê dîsa xwe dane rex ne yaran
Wekî lolo û zîbar û bende waran

Ji bo xwe çê dibînin bê dîmarî^(*)
Kul û derd û gem û bend û zîfarî

Jin û zaro di pars û ber dîwara
Ji birçîna di qêrîn û hewara

Melûl û bê kes û kar û xizan in
Li ber xan û dikana dergevan in

Bi navê daşikan ew paye darin
Di rêza dîl û firsana jimar in

Çilo û bê dîn û ol û pîr perestî^(*)
Ulo lal û hejar û mil şikestî

Bi gez têne dilê xwe pê nizan in
Wiha bê nav û nîşan û ziman in

Tifing desta bi zû têne şerê xwe^(*)
Zihak û çek hilîn û ber berê xwe

Nejadê xwe kirin bin payê dujmin
Ji bona xwe gelac û puşt û xain

Ji lew destê xwe dane destê ne yara^(*)
Sitemkar û bê wijdan û xidara

Nizan in ku sibê dewra ewan tê
Ji bo wan seyd û nêçîra kewan tê

Eger em çûn bi zû ew têne kuştin
Ji wan ra qet tunî ne jîn û hiştin

(1)Lolo: ya Lolom di zîgar û hêlên Îraqê ci dibin. Zîbar: di nabêna Arê û Zaba mezin de ci dibin. Bendewar: her bendê ku her bendê hikûmetê ne. Bê dîmarî: bê koko. Melûl: bê kêf û xemgîn. Xizan: hejar. paye dare: difredar. Dîl: bin dest.

(3)Ziha: marê mezin. Nejad: kok.

(2)Pîr perest: sofi. Ulo: wiha. (4)Sitem: zor kotek. Jin: xweşî û saxî.

KURÊ ÇARAN: (4)

DelaLêmin hevalê derd û xweşî
 Dibînî jîn û tevdir û şiyarî
 Li ser wê xwe didî kuştin birader
 Ji xwîna min ji dîne min xuyayî

Wekî arê cehennem pêti da ye
 Bi destê ser gilok û rî dirêja
 Çi zû pêket, hewa ket ber li banî
 Ter û hişkî hemî dane li ber xwe

Were vir doftera bê cî bixwîne
 Xetek sor û xetek sîn û xetek rîş
 Ku arek ser kurê çara dibarî
 Rivî jê çû ye hêla asîmanî

Kizî û dî ji nava bê cî rabû
 Kulî xwaran xelek girtin li dorê

Çima şîrê diya bê cî dî noşî?⁽¹⁾
 Felat û tevger û ol û diyarî⁽²⁾
 diya xwe tu dihêlî ber pî yû der
 Li ber destê welat gêr û zihayî⁽³⁾

Li ser lat û ber daran xuya ye
 Betal û bê mirês û lal û gêja
 Wekî ejder ji xarê ser hilanî?
 Ji dar û ber tu çi nîne li ser xwe

Hezar rengî kul û xem tê bibîne
 Qe nabînî xetê zêrîn û zer keş
 Ji wî der tê pirûkê koledarî
 Bi xurtî ket dil û canê xizanî

Ji navê agirê dojah xuya bû⁽⁴⁾
 i Nejdêne dixwazin ta li torê

(1)Dê: welat. Dînoşî: vedixwî. Jîn; xweşî û saxî. Felat: xelas.

(2)Tevger: liv.

(3)Gêr: ji girtinê ye. Ziha: ejdeha marê mezin.

(4)Ji wî: ji wî agirî. Koledar: zorker. Rivî: pêti. Cehenem: dojah. Ejder: zihak.
 Xar: mixare. Çi: tişt. (5)Dojah: cehenem.

Xwe ser arê dibînin mîr û ser dar
Dibêjin hûn bi me bûne misilman
Bi vî navî ghiştin warê Kurdan

Niha em bê ziman û bê welatin
Ji gund û malê mehrûmîn herin jor
We ya şorê ji bona xwe bikin gor
Durrê Qehtanî bona xwe bi çîn in

Şino got got şino ezez şino mir
Ji lew xwende kitêb danî şibakê
Sedî sed ew li pêş û em li paşin
Cih û malê me ser xwe par û pişke

Ne dîne ku berê bin dest û bê par
Dî vî erdî xulam û dîl û mêvan^(*)
Me boza xwe ji bin barê xwe berdan

Dibêjin me çira hûn banî hatin?
Bese bimirin ji birçîna nek kor^(*)
Bi mînin ber ziyan û agir û zor
Zimanê çewt û ber vajî hilînin

Şino rabe şino rûne şino vir^(*)
Ne xweşê derb û lédana zihakê
Li ber kêr û şek û dar û kelaşin
Çepel daran bi kêfa fişke fişke^(*)

* * * *

(6)Xulam: kole. Dîl: bin dest. Mehrûm: bê par.

(7)Nemek: wefadarî û qencî (na'met).

KURÊ PÊNCA: (5)

Hevalê min delalê min binêre
Ji nav xwînê xuya be guh bidêre

Ne mîne der ger û tengavê xwînê^(*)
Ji bona xwe bike carek civînê

Di kok û bingeh û raman û tevdir
Bi zanînê xuya ke seyd û nêçir

Welatê xwe bibîne ku dinale
Di meydana cihanê bê hevale

Birayê xwe bibîne ku dixwînê
Hemî sore ji ber derdê birînê

Kurê pêncê li Ermînya, li Bako⁽²⁾
Helanî nav û nişanê birako

Nejadê xwe nizane ey delalo
Dibê bav û birayê xwe hevalo

Eger çi Heqşinase, xwîn belase⁽³⁾
Li texma min ne hosta û ne şase

Ji xênî xwe gelek çê tir dibînim
Eger çi bê bira û dil birînim

(1)Gor: tirb. Çewt: xwehr. Bervajî: meqlûb. Şino: çi ye. Zihak: dijminê ziyan

(2)Pişk: par. Çepeldar: bi qirêj. daxwaz. ker. Kelaş: sewl.

(3)Ger: cihê ku av têda digere. Tengav: av der, xelîç. Raman: armanç û

(4)Bako: dikeve Kurdistana Azîrbaycanê.

(5)Şinase: nas dike.

Eger çi bê kur û bav û keçanim
Bi yek carî ne bê par û xizanim

Kur û bav û bira û nav û name^(*)

Bî rengê sor hemî xizdane xame

Heval carek li pêş û dil lipaşin
Li hevraz û newal û çol û kaşin

Bira vane li ser hev têne kuştin^(*)

Çilo laşê xwe ser latan di hiştin?

Gurên ku ser welatê me difizin
Bi vî navî dihatin lew ezîzin

Kur û bav û bira ser hev di êşin^(*)

Ji bo derdê birîna xwe di kêşin

Bi naçarî, belengazî diçin ser
Ne yar û daşik û bê war û leşker

Dimînin nav dirîk û xîp û bizmar^(*)

Serî berjêr dîkin bê hîn û bê kar

Qe na bînin ku jev bûne bir û bêş
Çiqa bimrin berê her didin pêş

Dixwazin ku welatê xwe derînin^(*)

Bi serbestî, bi xweşî tê bimînin

Eve karê biratî ey birader
Bi pê rabe ne mîne ber pî yû der

(1)Xizanim: hejarim. Name: nav û nişan û kitêb û reşbelek. Xiz: xet. Xame: qelem an ku nivîsandine. Hevraz: qême û berjor û rajor.

(2)Bi vî navî: bi navê biratî. Lew: lewra. Ezîz: gewr û xweşewîst û birêz.

(3)Kêş: kaş an ku hewa dikevin serê kaşan. Naçarî: bivê nevê. Ser: xwe dide rex neyar. War: welat.

(4)Xîp: kelemê daran. Bizmar: mîx. Hîn: zanîn û zanistî. Jev: ji hev. Bêş: parçe.

(5)Ser bestî: xweserî û azadî. Der: derî.

Bizane ev riya rast û dirûste
Kesê ku pê xuya ye ew ne siste

Bi van ristan binêre tu dizanî^(*)
Dibînî ser binlindî, pehlewani

Ne çûne ser çiyaê gurd û Berzan
Keli xwîna kur û bavan bi lerzan?

Bi yek destî didane ber tifingan^(*)
Birayê xwîne serdarê pilingan

Heval ger çi di Vêtnamê xwe nasin
Di vê qadê ne wek wa mên xelasin

Binê Sûrî dibêjin em hevalin
Li Vêtnamê ne guhdar û ne balin

Di nav wan em neyar û ajnebîne
Çiku xwîna xiru nav me tunî ne

Eger xwîna yek bana ne bûn em^(*)
Perîşan û belengazê kuî û xem

Nizanim bo çi na bin jîr û zana
Pirê me bê guman û dergevane

Çilo xelkê cihan tev sermiyanin^(*)
Ji daxwazê tenê em îro manin?

Riya ku ew diçe ser kaniya diz
Didin ser rêber û jîr û qelawiz

Ji xênî xwe nizanin rêç û tevdîr
Ji bo dost û ne yaran seyd û nêçîr

(1)Ristan: şirên jêrîn. Ne çûne: gelo ne çûne herê çûne. Gurd: hele gurd.
Berzan: çiyayê Berzan. Keli: gelo ne keli herê keli ye. Birayê xwîn: daxwaz pê
Berzanî ye.

(2)Heval: hevalên van dera. Vêt — nam: dikeve jêrê bakurê Asiya. Qad: zevî û
meydan. Ne wek wa: an ku ê ku di wirdane bi navê biratî xwe xelas dikan.

(3)Ne balin: pir naxin bala xwe. Xiru: safî.

(4)Perîşan: şepirze. Belengaz: hejar û reben. Jir: jihatî. (5)Sermiyan: xweser.

DÎNA WARÊ BILIND

Daketim warê bilind û bê biha⁽¹⁾
Gewhere ronî dida ye her ciha
Cîgehêdar û ber û kok û riha
Lê çikim maye li bin destê ziha.

Dilbirîn û bê civîn û xwendine⁽²⁾
Ser tewîn û bendewarê ayine
Tu dibêjî tev şewat û mayine?
Destê Kurdê jîr û zana jê kine.

Pehlewan û mêr û gernas bê berin
Bê çek û hêz û hewar û şevderin
Dewr û hawîrê cihê me leşkerin
Top û sarûx û kiroz û qemberin.

Jê dixun pitrol û kanî koledar⁽³⁾
Hê ji bo me agirê zor û xidar
Pêtî daye kozik û şûv û beyar
Jev qetandin çol û zozan û zinar.

Çem çikandîn kanî ber bûne zuwa
Reşqelandin dar û ber toz û duwa
Cî tewandin pîs û mirdar û guwa
Rahejandin ker kera dar û çuwa.

(1)Daketim: hewaketim û çûme. Cîgehê: cihê. Ber: fîkî û kevir. Kok: tûm û najad. Rih: ra «a» di tevan de nîşana kome. Ziha: marê mezin.

(2)Bendewar: berbend. Ayin: dîn û ol. Mayin: narincok mezin. Jîr: jihatî û bîr ber. Jê: ji welat. Ber: havil û feyde. Hêz: huner. Qemberin: narincokin.

(3)Kanî: maden û kar. Koledar: zorker. Hê: hêj. Toz û duwa: xwe didin ber reşqelandin an ku kirde kerin ji bo reşqelandin. Gu: ji pîsîra tê gotin. Karkera: kirdekerê rahejandine. Çuwa: dar û kirde bere/

Hêrivandin lat û derbend û çiya^(*)
Hilqetandin kok û qurmê şîniya
Hilweşandin zad û pincar û giya
Daliqandin laşê bavan û diya.

Xelkê tê da rengareng û bê livin^(*)
Tev da pêwîstê neyar û bê cihîn
Koleê paşa û kevnar û mibîn
Ser kinare xendeq û xap û çivîn.

Hîn pepûk û bê kes û dîl û hejar
Ber derê dêwê gemarî zare zar
Hîn bêtal û hov û gêj û bendewar
Mane çolê bê xebat û kar û bar.

Yek dibêjî ez çi kim war û welat?^(*)
Bes ji îzdanê dixwazim ez berat
Da nebî min dojah û ar û şewat
Lê ji ber derdê pera nakim tebat.

Ew deware karê wî pars û zekat
Her di dîwanê dibêjî hat û hat
Pîrê pêşî çê dikî kom û civat
Ew dizanî rêkî mizgîn û xelat.

Kevne karin bê berin na bin xuya^(*)
Bendewarin bo ne yar û bê ciya
Rû gemarin rengê dîl û sêwiya
Şermîsarin mane ber dest û piya.

(1)Hêrivandin: anîn xwhr û bila wila kirin. Derbend: deriyê kûr û teng. Qurm: tûm. Pincar: giya.

(2)Liv: lebt, hereke. Pêwest: heval bend û pêrewî. Mih: mezin. Xendeq: kortal. Çiv: riya xwar. Pepûk: xemgîn û dilbîrîn. Dîl: bin dest. Hejar: xizan û belengaz. Dêw: iblis.

(3)Îzdan: xudê. Dîwane: cihê dinan. Pîr: şêx.

(4)Ber: havil. Bendewar: ber bend. Şermîsar: fehêt ker.

Ê di bê cî nadî jîn û xweserî^(*)
 Ser didêrî bend û kîn û berberî
 Dûv û deste bo ne yar û nû kerî
 Xwe qe nabîne di ma ber qeşmerî.

Ew kirîne dijminê zor û xidar^(*)
 Pate xwarin rê dibin ser burc û xar
 Jin di mane ber derê pis û mirar
 Mêr di xew ne carekî nabin şiyar.

Xortê nûhatî divê kêf û geşî
 Karê her tim dikêşe ser keşî
 Qet xuya nabî li ber wî rû reşî
 Tegera dar û şiva pênc û şeşî.

Doza canî wî ewe her nû berî^(*)
 Qîzikan nade cihê gewr û zerî
 Daye ser kortal û hevraz û derî
 Tê dinalîne xebata bê serî.

Tol û armanca ne wek hev daye paş
 Nû jene qencî nîzanî ma ye şaş
 Karê rizgarî dibê nakim belaş
 Nanê kurdanî qe naxum bê tewaş.

(1)Jîn: xweşî. Xweserî: ser xwebûn û serbestî. Dûv: tirî. Dest: hevalbend. Nûkerî: dûvik perestî.

(2)Xidar: dijwar. Pate: parî. Burc: asêgeh. Xar: mixare û şikeft. Di xew ne: di xewda mane.

(3)Nû berî: tiştê nûne. Hevraz: berjor û berwar. Derî: newal. Tol: heyf. Armanc: daxwaz û nîşan. Rizgarî: xelasî û rihayî. Kurdanî: kurdîtî. Tewaş: don û pê xwarin.

Beg hevalê cîsitîn û kole dar^(*)
 Her divê bigrî cihê jar û hejar
 Ger hemî bimrin qe nabî bendewar
 Tev da jêra kole bin der gund û şar.

Xwarina xweş û çekê qenc û biha^(*)
 Goştê bê hestû ji berxan û miha
 Ew di aşxanê bibînî her wiha
 Rojê carekê kurkî simbêl û riha.

Kengî tete bîrê eş û derd û jan
 Her dixwazî ku wihabî her zeman
 Nadî ser pista xwe qet barê giran
 Bê serî her xwe dibînî ser miyan.

* * *

Pîr û kalê hizhizî jev tar û mar^(*)
 Ser gumanê radibî na bî şiyar
 Kanî xortanî gula şîn û buhar?
 Nayî destê min çikçm lat û zinar.

Qêr û denge ey xudawendê cihan
 Hêvî darim min bikî xortê ciwan
 Da ku nû bînim keç û law û kuran
 Pê bibim maldar û şêr û pehlewani.

* * * *

(1) Beg: axa, mezin, serek. Koledar: zorker. Jar: bê kef û nexweş. Hejar: feqîr û perişan û xizan. Şar: bajar.

(2) Aşxane: cihê xwarinê. Jan: eşa giran. Ser miyan: maldar.

(3) Pîr: mezinê sale û şêx. Hizhizî: ji heketî. Tar û mar: bila wila. Buhar: gula buhar. Lat: teht û kevirê mezin. Zinar: çiya û pala çiya. Pehlewani: ji du pirsan hatiye hev «1» pehlo: bajar û zimanê kevn, «2» an: adetê kirde kare wek van û ban.

Qîza bê xwendin ne jîr û zane ye^(*)
Ne çeleng û şerker û merdane ye

Xanî rêj û çek dişo, ber xane ye
Ber derê bav û deyan perwane ye.

Karê ser bestî ne bînî bê bere
Hê delal û nazik û sor û zere

Lêviya xortê ciwan û esmere^(*)
Der felata law û dê bê bawere.

Xweşikî, şengî ji bona xwe divê
Xweş û şêrîn tir ji şîr û hingivê

Bejn û bala wê bibî takê şivê^(*)
Ber bi war û dewletê nakî livê.

Nagî qîzê ku diçûne xwendinê
Xwe dibînin şêr û gernasê dinê

Rengê sarûx û kiroz û mayinê^(*)
Diçine meydana nîzam û ayinê.

* * *

Dê nezane bê civînê naçî ser
Warê ku dijmin kirî zêr û zeber

Wê çilo bê cî bi nermî bibîni der?^(*)
Renga reng tê da xuyane bê qeder.

Bende warin ku mejev kin tar û mar
Gor nebaşin zor ker û pîs û xidar

(1)Nê: ne, na. Çeleng: jîhatî û sivik û pehlewani. Merdan: gernas û dilêr.
Perwane: pîrpirîk. Ber: havil û feyde.

(2)Lêvî: berband. Felat: xelâs. Şengî: qencî û başî.

(3)Bal: bejn. Liv: lebt û xebat.

(4)Mayin: narincok. Ser: xwe dide ser war. Zêr zeber: bin û ser an ku ji hev xisti ye.

(5)Wê û dê: nişanin bo çaa mayî. Bê qeder: pîr. Gor — nebaş: gorvedok.

Ê ku wabî pir xidar û agire^(*)

Ew bi hêsanî tu carî namire

Hê xudanê zêr û kar û wahire

Jîr û ser dest û çeleng û şatire

Naçî bê top û tîfing û qembera

Zane bûn û bendewar û leşkera

Kar û pitrol û xebat û tevgera^(*)

Mêr û jîndar û şiyar û ser wera.

Jêra tevdîrek divê çêkin hemî

Tol û armanc û civîn û ser cemî

Destekî paqij wekî pîrê gemî^(*)

Zû werînin destê xwe em melhemî.

Hingî karin jê derînin bê guman

Çê bikin hîngah û burc û berleman

Şin û avakin welat û niştêman^(*)

Ser serê xwe radikin barê giran.

Têne meydanê wekî şêr û beran

Berdîdin pîs û ne qenc û ker keran

Dûvik û dîn û dewar û qeşmera^(*)

Bê nejad û kevne kar û ber bera.

Tê dimînin ser bilind û sermîyan

Xwe digînin hêyet û koma gelan

Çê dîkin em her wekî xelkê cihan

Tîp û zarav û zîman û xwendevan.

Di 5. 3. 1959 an de çê bûye.

(1)Wabî: wihabî û wisabî. Kar: maden. Wahir: xudî. Çeleng: mêr, sivk. Şatie: jihatî. Qembera: narincokan û bomban.

(2)Tevger: liv û lebt. Serwer: serok. Tol: heyf. Armanc: raman û daxwaz. Sercemî: hevgirtin.

(3)Berleman: civata bijaran.

(4)Niştêman: zevî yê xwe. Kerkere: ser seri.

(5)Dûvik: tîrî. Nejad: kok. Heyet: heyet el umem.

FIRAT

Firato ey muradê min ji kû tê
Ji ezman û gulîstanê buhîştê

Dizî tê ser cihê min jê derî tu⁽¹⁾
Hemî zêr û dirav û gewherî tu.

Hemî hîn û jiyan û xeyr û xweş
Bi halan û bi dîlan û xiroşî

Ji nav lat û der û kendal û çalan
Ji baran û ji berfan û newalan.

Ji deşt û çol û zozan û zinaran
Çiya û hêrik û derbend û xaran

Ji mêrg û çîmen û bax û gulîstan
Ji dehl û kozik û ber pal û bîstan.

Nizanim tu ji erdî ya ji banî
Di rengê xwe ne wek avê cihanî

Tu şilo yî tim u tim be hevalî

Ji hêsrê min qê na binî zelaî

Ji derdê min dibînim bê tebatî
Gelo bê zar û xwêbûn û felatî?

Nizanim tu çima na binî xweşî?⁽¹⁾

Kul û jan û derdan di poşî.

Dikî lim lim dikî xum xum dikalî
Çima digirî ji bona çi di nalî?

(1) Firat: kin bûye ji firehat an ku ji cîkî fire hatî ye (O) nişana bange. Muradê min: daxwaza min ya navê wî murade heya digî biniya Dersîm çemkî din tê ser dibe firat. Hîn: zanîn û zanistî. Jiyan: xweşî. Halan: dengê bilind. Xiroşî: qêreqêr.

Şev û roj ji nalînê ve na bî⁽¹⁾
Ji kînga heya kengî wiha bî?

Serê xwe bo çi ra nakî ne xweşî?

Ji bona min tim û tim xem dînoşî

Digotî ez kurim wek te birader
Divê bo min xebat û jîn û tevger.

Ji koka xwe dinêrim guhdidêrim⁽²⁾

Tenê bin dest û darê kole gêrim

Tenê bê kar û êl û bê civatim

Ji lew jar û melûl û bê tebatim.

Diçim qada neyaran dil birînim⁽³⁾

Demek sax û demek bê zar û dînim

Eger çi her wekî bilbil dixwînim

Ji hev par û belengaz û hezînim.

Digotim ey miradê bê cih û war⁽⁴⁾

Wekî min tu xuyayî dîl û bê çar

Bese negrî ji dersê min diradar

Me nalîne kelat û kozik û xar.

Tu hêjayî xudê dayî me Kurdan⁽⁵⁾

Ne mîne nav birîn û êş û derdan

Ji te şînî ji te keskî xuyanî

Ji te dar û giya û mêrg û kanî.

(1)Ve nabî: naqetî. Kînga: çi wextî. Dînoşî: vedixwî. Divê: gereke. Jîn: xweşî. Tevger: liv û lebt.

(2)Kolegêr: koledar û dijminê zorker. Lew: lewra. Jar: bê kêf û zeif û nexweş. Melûl: xemgîn. Tebat: hedan.

(3)Qad: erd û zevî. Zar: ziman. Ji hev par: ji hev parçe. Belengaz: perîşan, hejar û şerpîze. Hezîn: xemgîn.

(4)War: welat. Dîl: ben dest û girtî. Çar: tevdir, derman. Xar: şikeft û mixare.

(5)Hêjayî: qencî delalî.

Ji te bax û ber û zad û gulîstan⁽¹⁾

Ji te tol û dovka mil şikestan

Ji te hîn û hiş û fikr û jiyani

Ji te mêrî, hunermendî, beranî.

Qiraxê te ne valane ji avê

Zuwa nabî ji avdan û ji tavê

(1) Ber: mêwe û fikî. Tol: heyf. Divok: daxwaz. Hîn: zanyarî û zanistî. Jiyani: xweştî û saxî. Qirax: kevî.

Kuta nabî ji cobar û ji cokan

Bila nabî ji gamêş û ji lokan

cuda nabî ji lawê Ristimê Zal

Beta nabî ji cenga top û napal

Biha nabî ji pesnê ser giokan

xuya nabî ji pêva dil bjiokan.

Ji lew dîn û pesnedarê min dizanî

Ji pirsê pêkê îzdan bit xuyanî

* * *

Te kavlê dijminan ava kirin tev

Qiraxê te ji birîna mirin tev

Durr û gewher li ser qada ne yaran

Dibarînî ji bo me tîrê maran.

Tu loda durr û morîkan didêrî

Ji nav warê hunermend û dilêrî

Didî dijmin dirav û zêr û dolar

Di lorînî berê yaqût û dînar.

* * *

(2)Kuta: xelas. Lok: deve. Cuda: cidwa, ciyawaz. Beta: winda, ne ber çav.

(3)Pêk: qasid. Îzdan: xudê. Bit: dibit. Kavil: wêrangeh.

(4)Qad: zevî. Lod: kom.

(5)Di lorînî: tînî xwar. Ber: lib û heb. Yaqût: lal.

Dirûst hatî Kemalê dîn perestan

Ne texmîn ûçîrok û ne destan

Dibêjin gotiye pêkê dilawer

Ji pirtûkan me ronî dida der.

Eve ew gotina şêrîn û gewher

Divê ku tu bizanî bînî bawer

Çiyakî zêr xuyanî bit ji navê

Dinê rewsen dikî wek berq û tavê.

Li ser wiî ser dîkin xelkê cihan tev

Qe nabînin ji bona xwe bez û rev

Sedî nehwêt û neh jê têne kuştin

Ji wan her kes divê bona xwe hiştin.

Ji lew pêkê huner mend û piyamber

Ji lalê gewher ev mêwe da der

Di ma ev pîrs di zarê dîn perestan

Bi vê bawer ne tanî dîn û mestan.

* * *

(1)Kelam: gotin. Perest: parêz. Texmîn: guman. çîrok: tiştên ku rojê tîn gotin. Destan: çîrokên bi janin. Pêk: qasid. Dilawer: pehlewani. Pirtok: kitêb.

(2)Bit: dibit. Berq: birûsk.

(3)Sedî: Ji sedî. Nehwêt û neh: 99. Piyamber: pêxember. Lal: yaqût an ku ji devê wek lal. Mêwe: fikî.

(4)Dizarê: di-zimanê. Mestan: serxweşan.

Serî rakir me rengê şêrê Berzan

Didin xap û guman û tirs û lerzan

Dibêjin çep ne ke ravê birader

Ne be destê diz û ewbaş û nû ker.

Weke hovan ne bêje bê ser û be

Ne mîna rî dirêjan têxe ber ser

Xwe na dim ser gumana şaş û tizbî

Ewin bo nan didêrin bend û hizbî.

Dixwînim deftera jîna welatim

Dibînim havila derbend û latim.M

Diçînim nêrgîza cobar û cokan

Dibêjim rî dirêj û ser gilokan.

Li serçî ev ser û halan û cengî?

Ji boçî ev hewar û qêr û dengî?

Çi ye ev xîrpîsa xelkê cihan tev?

Kî ye ev durr dibarîne ciyan tev?

Ji kû ye ev xelata bê ser û ber?

Çilobû ye nehîn ev zêr û gewher?

(1)Didêrin: çê dikin. Bend: ber berî. Hizbî: komelayetî. Jîn: xweşî. Felat: rizgarî. Havil: feyde. Cobar: coka va baranê ya coka ava buharê.

(2)Halan: dengê bilind. Xîrpîş: gotina bi dizî.

(3)Nehîn: veşartî.

(5)Rav: beyan û tabîr. Dest: heval bend. Ewbaş: pis û ne zan. Nûker: dûvik.

Çima ev der welatê min xuya ye?

Çira der sîp û gerravê di ma ye?

Çilo digre Firata bê ser û ber?

Di nava xweçiya yê zêr û gewher

Gelo carek qe nayî der bi rindî?

Xuya-nabî bi xweşî ser bikindî.

Ji vê bê par û mehrûme welatim

Serî ber jêr û xemgîne felatim

Ne dîne bax û bîstan û zinarim

Dibistan û sera û tîp û zarim.

Melûlê dilbirîne dest û latim

Bi xwîne mêrg û zozan û kelatim

Zimîne cok û cobar û em û pêl

Girîne dayk û dapîr û gel û êl.

* * *

Delav û girtina avê çiya ye

Xelat û havila min jê xuya ye

cihê min pir biha ye nayê texmîn

Ji lew tê da xuya yeçiyaê zêrîn.

(4) Çiyayê zêr: an ku ew pîrsa ku hatiye gotin ku çemê Firatê çiyakî zêrîn de asê dibe gelo raste ku çiya bi xwe ye ya feyda ku ji çem derdikeve.

(5) Ji vê: ji vê havilê. Mehrûm: bê beş û bê par. Dîne: dîtine. Dibistan: xwendegah û hîngah. Tîp: herf. Zar: ziman.

Bi hêlê wer bi nêre dewr û navê

Bi bîne vê ger û fetl û peravê

Di navê renga reng masî dilîzin

Li ser pistê firende gok û zîzin.

Lî dewrê bexê û bîstan û darin

Tijî sêv û tijî xox û hinarin

Behîv û gwîz û encas û qerasî

Tiraqî alû şebtalû girasî.

Gilaz û hirmî yû moz û bhokin

Hejîr û mişmiş û usnû tiokin

Rez û mêwê gul û reyhan û kanî

em û dehlinçiraya cerg û canî.

Wekî roj û wekî tavê buharin

Ji low dijmin wiha serxweş û harin

Nîşanê hîn û saxî tê xuyane

Ne sawîr û xurafat û gumane.

Dikin hîvî ji Izdanê dîlovan

Ku em derman bikin daxê dil û can

(3)Firende: tîr. Alû: alûc. Şebtalû: zirxewx.

(4)Uşnû: ji gilaza piçûk tirin.

(5)Mêwe: fikî. Har: gezo ker û serxweş.

(1)Hîn: zanistî û zanyarî. Sawîr: guman û texmîn. Xurafat: direw. Îzdan: xudê. Dîlovan: dîl nerm û dîl tenik.

Bidin ber kêf û xweşî canê şêrîn

Bi ser bestî bi azadî hunerçîn.

Li ser konê divoka xwe vedin em

Ji destê xwe qe carek ber be din em

Bi govendê li dewra wî xuya bin

Li ser canê ne yarê xwe peya bin.

Li dewrê ê bikin burc û zivingan

Bidin ber top û sarûx û tifingan

Divaya mêr û gernas û şêhîdan

Çiraya şêr rimbaz û egîdan.

Bixin destê xwe rengê şêrê Berzan

Bidin bê cî tinaz û tirs û lerzan

Ji warê xwe derînin koledara

Bikin ronî kelat û gund û sara.

Di hingî em welat parêz û jûrin

Vejîn dar û ser ifraz û pezîrin.

Xudanê dewlet û nav û nîşanin

Wekî xelkê cihanê ser miya nin.

* * * *

(2) Li ser: li ser wî. Divok: daxwaz.

(3) Burc: koşk û qesr û asêga. Ziving: şikeft. Sarûx: qîjek û dûr avêj. Şêhîd: nemir. Egîd: pehlewan.

(4) Bêcî: dijmin. Koledar: zorker. Şara: bajara.

(5) Hingî: wî çaxî. Vejîndar: saxker û av kerê welat. Ifraz: bilind. Pezîr: bijartî. Sermiyan: xweser.

DICLE

Birake bo Firatê jar û xemgîn

Dide fortan bi mîna şêrê Ydîn

Pesin dare bi gerr dan û b çakî

Li ser xwe ew qe na bîne tu kakî.

Li hember ser hilanî qehremanî

Ji nav warê Metîna coşe danî

Di nav erdê mux û maj û menû çehr

Bi rengê top û sarûxan dida der.

Serî ber da bi xum xum ew die jêr

Çix û fitlan dide xwe her wekî mêr

Di bajar û di gund û elî û hêlan

Ter û hişkî dide ber şîp û pêlan.

Bi gerrav û biçerrav û biçala

Bi kort û xendeq û deşt û newala

Dibîstan û kelat ûdehl û dara

Gulîstan û ziving û burc û xara.

(1) Jar: bê kêf, nexweş û dil bikul. Yadi: yado navê yekî ji mîrekên Cêbax çûre bi mêranî deng da ye. Çakî: başî. Kakî: mezinahî. Metîna: êlekî bi nav û denge. Coşe: kelandin û fûrandin û nalenal.

(2) Mux: muj. Maj: man navê bavikê Kurd. Menû: buhîştî. Çehr: ro navê bavê Zara ye. Mêr: mar.

(3) Êl: eşîr. Hêl: nahiye. Perav: qirax û kinar.

(4) Dibîstan: mektebe. Ziving: şikeft. Burc: asê gah û koşk. Xar: mixare. Dicle: Ji degel hatiye an ku çeleng û sivik. Cerg: nav û dil û gurçik.

(5) Şeng: baş. Jir: jihatî. Vejîndar: sax ker. bijar: neqandî.

Bi navê Dicle hatî erdê gotî

Dil û cergê neyaran pê di sotî

Bi dijarî bi rizgarî çelenge

Wiha qenc û delal û jîr û şenge,

Bi mêranî xuya ye paye dare

Evîndar û vejîn dar û bijare

* * *

Dibêjî ez huner bazim Firato

Di bin kokê Erarat û Melato

Di hêla kohê Torûs û Xelatim,

Ji derbend û newal û dest û latim.

Didim pêlan ji nav dar û zinaran

Şikeft cok û cobar û diyaran

Dikim komê durr û mircan li erdê

Li ser qadê dikim dîlan û cerdê.

Di golan de wekî lalan xuyame

Ji bo dîn û ne xweşan ra dewame

Ber û fêkî dibarînim li qadê

Wekî mêran diçim ceng û tiradê.

(1) Firato: ey firato an ku o ye li ser ji bo bange. Erarat: çiyakî bi «1600» M ji derya bilind tîre dest pêka wî ji Cûdî heya Ala goz û çemê Aras. Melato: çiyayê Sasone. Koh: çiya. Xelat: çiyayê xelat.

(2) Erd: zevî. Cerd: deng û xar û tirade. Lal: yaqût. Dewa: derman.

(3) Ber: mêwe. Qad: zevî. Ro: roj. Co: cok.

Şeva tarî dikim ronî wekî ro

Bi zêran ez dixemlînim cem û co

Wekî qîzan delal û nazik û şeng

Bi serbestî xuyame ez didim deng.

* * *

Tu gerçî payedar û xweş û rindî

Bi pîrsa pêkê I zdan ser bilindî

Bi pêva dîn perestan xweş xuyayî

Di erdê dîn û mestan ser bi bayî.

Ne wek avê cihanî lêl û tarî

Ji Bîngol û ji çavê zêr hinarî

Ji Palo tê dîlorînî mirarî

Di Xarbûtê didî dîtin bijarî

Bi ava reş bi daxwaza miradî

Di jêr û jor didêrî kêf û şadî.

* * *

Ji guncîka delal û şîn û ava

Ji bo Kurdan dibarînim silava

(4) Şeng: qenc û sipelî. Pêk: qasid. Îzdan: xudê.

(5) Perest: parêz. Mest: serxweş. Lêl: girik. Bîn: bihn. Çan: dikeve Cêbax çûrê. Hinarî: dişînî û dibarîni.

(1) Mirarî: morik û mircan. Bijarî: nqandîni û qencitî. Ava reş: navê çemekî ye dikeve bakurê û rovaê Elezîz û tevî murad dibe ji wir pêva dibe firat. Bi daxwaza muradî: an ku heya bigî çemê Qere so navê wî murade. Guncîk: navê goleki ye dikeve nabêna Paxir maden û Elezîz.

Bi hember kohê Cûdî têrê bazim

Hunermed û hewar û ser firazim.

Berê xwe va mi da ye sêrê Berzan

Ji canê xwe derînim êş û derdan

Diçimwarê Mem û Zîn û Cizîrî

Qebûl nakim li ser xwe kole gîrî.

Ji tofanê heya noka dixwînim

Bi zarê pehlewî xerzik Diçînim

Bi sêrwan û bi Xabûr û Witato

Bi Zab û Hêzil û rengê Çixato.

Di hêl û ro helatê min xuyane

Bi min ra ser bilind û ser bi bane

Kum û kolos didim ber sal û şapik

Kum û kofî dikim ser zêr û xavik.

Bi rengê camê Cêşîdû Sikender

Didim dîtin gelê xwe durr û gewher

Eger çî ez diim qada ne yaran

Ne wek te sê ivê rengê mûmaran.

(2) Koh: çiya. Cûdî: gotî. Têr: ferinde. Kole gîrî: zor kerî û bin destî.

(3) Pehlewî: Kurdî bajari.

(4) Sêrwa: ji çiyayê Zagros der dikeve. Witato û Çixato: navê du çemane Kurdistanê Îranê dane. Dihêl: an ku ev çem di hêla min û ro helatê min dane.

(5) Kum û kolos: çekê mêrane. Kum û kofî: çekê jinane. Şal û şapik: ê mêrane. Cêşîd: ji êla kosiyan bû.

Ne wek te avbir û cobar û cokan

Didim hir û gur û kevnar û xokan

Di qada komir û samîçep û rast

Dikim dîlan dibarînim ber û mast.

Mi ava kir ji wêrana biyanî.

Tenê olek tijî kir av û kanî

Te meydanek ji sê qadê ne yaran

Kirin rengîn ji bax û dehl û daran.

Kirî zêrîn cihê tûpişk û maran

cihê talan ker û kund û xîdaran

Şivan û bêçek û pê xas û tazi

Kirin mîr ser û dîndar û nazî.

Nemek korin ji lew ser darê zorin

Diz û harin siya û sîn û sorin

Bi navê dîn ji Nejdê hatine vir

Kirin mertal ji bona xwe hir û nir.

Hedîs û xwendin peyman û Şîret

Kirin destê tinaz û dar û xizmet

(1) Qad: erd û zevî. xwehri û xaçe rê. Avbir: delav (sed). Cobar: coka ava baranê ya coka ava buharê. Xok: beraz. Ber: mêwe û fîkî.

(2) Mi: min. Wêran: kavi. Biyanî: ejnebî.

(3) Kund: wêran ker. Xidar: zor ker. Nazî: faşî.

(4) Nemek: wefadari û qencî. Har: gezo ker û serx weş. Siya: reş. Nejd: cihê bilind.

(5) Hedîs: gotar. Peyman: soz û qirar.
gulle. Erd: zevî.

Nimêj û rojî yû tesbîh û quran

Berê topin didane erdê Kurdan.

Beg û axa ziyan û kotek û dar

Ji hev xistin kirin jar û birîndar

Mela tîrin kevanin sêx û sofî

Birin seyda xizal û wehs û kovî.

Zikat û parsekî rêzan û bartîl

Kirin kole ji bona kefte û pîl

Çikin zana sedî yek rê ber û jîr

Digel vê ew dimane ber dek û nîr.

Welat perwer nikarin xwe xuya kin

Heya ku doz û daxwazê bila kin

Ji hingî em belengaz û hejarin

Li bin darê ne yar û koledarin.

Huner mend û pezîr û rê ber û jîr

Kirin jar û pepûk û bend û zincîr

Kirin qefle birin dana Anadol

Wekî gokin li ber dar û Sekê hol.

Tesbîh: wird. Quran: gotinê xudê. Ber:

(1) Beg: mezinê êlê û gund. Ziyan: zirar. Kotek: zor. Jar: nexweş bê kêf. Seyd: nêçîr. Wehs: hov û dirende. Bartîl: rişwe. Kefte: ji hev ketî. Pîl: mezin.

(2) Perwer: parêz. Xwe xuya kin: xwe bidin dîtîn.

(3) Hingî: wî çaxî. Belengaz: perîşan. Hejar: feqîr. Pezîr: bijartî. Pepûk: xemgîn bê kêf. Bend: girêdan.

(4) Qefle: kom û parçe. Hol: lizka bi gokê ye. Lew: lewra.

Di dûrî da mirin ber nan û lêdan

Jin û zaro ketin ber êş û derdan

Ji lew min reş girêda ye ji hinga

Ne xweşê dar û زندان û tîfinga

Bî navê lacî yû bê cî xuya me

Li ber jan û kul û derd û bela me

* * * *

(5) Zendan: ya زندان (hebs). Jan: êşa giran.

PALO

Di 5. 5. 1970 da hatiye saz kirin.

Bi daxwaza û bajarî ya bi navê egîdî⁽¹⁾
 Di zanim tu bijarî cihî bona şehîdî
 Ji navê te xuya ye cihê Kurdê dilên⁽²⁾
 Cihê te pir biha ye ji lew tev zîv û zêrî.
 Dirav û kar û kanî ji te der têne meydan
 Bilindî, ser miyanî bi te têne pesin dan
 Tu dê mîna te ne anî ber û fêkî di navê⁽³⁾
 Di jêr û jor xuyanî wekî tîrej û tavê.
 Li dewr çemê Furatê tevda bax û bîstanin⁽⁴⁾
 Didin dîtin beratê çilo em bê zîmanin?
 Ji te ez derketim der qe na bînim tu havil
 mamê bê jîn û tevger bo min çima ne kakil.
 Va ye ji hev qet qetim tu zarê diz dixwînî
 Çilo ez bê rûmetim gelê min cî na bînî?
 Çilo tu pehlewani çima nabînî xweşî?⁽⁵⁾
 Niha tu dil giranî xuya ye reş dipoşî.

(1) Bi daxwaza: an ku pîrsa Palo ji pehlo ya ji pehlewani hatiye û bû ye navê bajarê Palo paytexta pehlewîyane kevnare ye. Bijarî: an ku hatî neqandin. Şehîdî: ên ku wek Şêx Seîd.

(2) Dilêr: gernasî û mêrî. Pir biha ye: lewra kaniya komira kevirî û paxir û hesin û pitrolê ye dikeve bakur û ro avayê Diyar bekir.

(3) Ber: mêwe. Mîn: wek.

(4) Berat: xelas bûn. Derketim: 1935 an de. Havil: feyde. Jîn: xweşî. Kakil: navik. Qet: parçe. Zar: zîman. Rûmet: şeref û qedir. Gel: millet.

(5) Reş dipoşî: reş li xwe diki. Pîr: Şêx di 1925 an de. Hejaro: feqîro û belengazo.

Ma cenga pîrê gernas	nayê bîra te Palo?
Di minî kortik û kaş	hejaro bê hevalo
Ji te hatim cihanê	gihiştim vî zemanî ⁽¹⁾
Tu der hebs û زندانê	ez dibînim ziyanî.
Dewrê lat û zinarim	deşt û çiya bê jimar ⁽²⁾
Ber û darên bijarin	ma ye bin kotek û dar
Ji nav baxê geş û şîn	wek kunbeda xuyane
Burcê delal û rengîn	rojin ronî didane.
Çem û kanî li hawîr	xar û kelat û zozan ⁽³⁾
Vedane bend û zincîr	çol û diyar û meydana
Gul û reyhan û çiçek	dewra cobar û cokan
Pê radibûne xwesetek	yarî bo dil bijokan.
Mîna baxê buhiştê	kesk û rengîn û şîne ⁽⁴⁾
Niha ber ar û xîştê	ne xweş û dil birîne
Ber û fêkî sitêrin	li ser çuqlîkên daran
Di erdê zîv û zêrin	ji bona restegaran.
Çemê Furat ji navê	xuşîn û nale nale ⁽⁵⁾
Gewher dide perravê	dibê şewq û şemale
Sêv û hînar û mişmiş	gwîz û gilaz û alû
Daran ji ber xweşexweş	bihok û uşnû û balû.
Xewx û tiraq û hirmî	rez û tirî bera ber ⁽⁶⁾
Na hêlin êş û bermî	dagirtine sera ser

(1) Hebs: girtin gah. Zendan: hebs, cihê saxan. Ziyan: zirar.

(2) Ber: fêkî. Bijar: neqandi. Kotek: zor. Kunbed: qubik. Burc: asê geh û qesr.

(3) Xar: şikeft û mixare. Çiçek: kulîlk. Bijokî: xwestinî.

(4) Buhîst: cemet. Ar: agir. Çuqlîk: gulî. Erd: zevî. restegar: rizgar û xelas bû yî.

(5) Şewq: ronî. Şemale: sipehî û delal.

(6) Gilaz: qeresî. Bermî: girî. Kan: kar. Qad: erd û zevî. Alû: alûc. Balû: berrû. Uşn: ji gilaza piçûk tirin.

Kan û pitrol û maden	di jêrê qad û erdê
Di rojê kesk û gulşen	radikin êş û derdê.
Cihê Kurdê huner mend	ji dîrokê xuya ye ⁽¹⁾
Bedixşan û Semerqend	bo dijminan di maye
Gelê ku ew têdane	berê bûne gelek pir ⁽²⁾
Konê xwe ser vedane	bê gotin û xir û cir.
Xuyane pehlewîne	rengê hunerbazane
Di Palo cî dîdîne	ger çî navê zazane
Ketin kohê Ararat	berê zanê çar hezar ⁽³⁾
Koçek bi kar û xebat	di Zagrosê bûne kar.
Li jêrê deşta Rûsî	navê Hind û Orûpî
Xuyane Mêd û Kûsî	di vê qadê bûne cî
Pir nîşanê kevnare	xuyane her ji navê ⁽⁴⁾
Ji tarîxê diyare	rengê çirax û tavê.
Ew kozika Metînan	nîşanê cengebazî
Bi destê tolistînan	civîna ser firazî
Li ser rojê kelatê	bo me tarîx û dîrok ⁽⁵⁾
Xuya dike felatê	rewş û ronî dide rok.
Nerdîwanek ji navê	tê ser çemê Furatê
Jêra didim silavê	bo me tîne xebatê
Hêzek dike xuyanî	ku wek gelê niha bûn ⁽⁵⁾
Winda kirin biyanî	piling û ejdeha bûn.

(1) Dîrok: tarîx ji dîtîyên rojê ra tê gotin. Bedixşan: navê bajarekî ye dikevi tacigistanê bi gewheran nav û deng berê ji îrana kevn bû. Semerqend: Bajarekî pir xweşe ji îrana kevnê.

(2) Bun: zana Mesîh. Pehlewî: Kurdên kevnare, ku zazane.

(3) Koh: çiya. Arart: Agrî. Qad: zevî.

(4) Diyare: xuya ye. Çirax: çira. Kozik û metînan: an ku tê hîra min ku li ser jorê kela Palo xaniyên pir asê hebûn digotin ev ê kufarane lê pişt ra min tarîx dît ku nîşanê Metînane îdî min ku ev cih ji kevnare ye û cihê Kurdaye.

(5) Dîrok: mējû. Felat: xelas. Nerdîwan: pēpilik û derece. Hêz: huner. Biyanî: ejnebi. Ejdeha: mēr û gernas. Endaz: mitir.

Bi sê sed mitr û endaz ji bin erdê tê ser çem
 Dijmin li ber kaze kaz ma bû li ber kul û xem
 Nerdiwanek ji derva di bakurê kelatê⁽¹⁾
 Bê gotin û bê qerfa berjêr dibe ji latê.
 Bi pêncî mitr û endaz dide dîtin beranî⁽²⁾
 Karê Kurdê ser ifraz çeleng û pehlewani
 Diçe zovêra rengîn taxek ji taxê Palo
 Xuya dike çelengi bizane vê wiha lo.
 Yekê xwende vejîndar bi min didane zanîn⁽³⁾
 Hunermend û xudî war xelat û tol û mizgîn
 Lê niha dem xirabe aîkî kundê wêran
 Li ber wî kes ranabe dide ber dar û kêran.
 Ê dî gurê dirende dev xwe na dî ser hev⁽⁴⁾
 Ewî na bînim zende tev da dimane ber dev

 Wek min bê kêf û jîne ala dijmin li ra ser
 Dibînim rengê xwînê ala Kemal û ber ber
 Ji dûrî va dinalim ahîn ji navê tê der⁽⁵⁾
 Ji nav û dil hevalim dixwazim bême xweser.
 Ewî bi destê pola ji bê ciyan distînim
 Derînim şaş û qola komir çiyar hiînim

(1) Nerdiwan: pêpelik û sêlm. Qerf: tinaz.

(2) Endaz: mitir. Zovêr: dikevi bakurê kelatê.

(3) Yekê: an ku yek ji Palo hat Xîrbê Hîsî cem min û bi min ev tişt dane zanîn çawa ku min ji hinek jê zanî bû. Tol: heyf. Xirab: wêran.

(4) Dirende: har. Zende: sax. Jîn: xweşî.

(5) Xweser: ser best. Ewî: Palo. Şaş: ne rast. Qol: kole. Komir çî: Turk.

Eve yara dilê min xuyaye ber bi min tê⁽⁶⁾
Dixwîni bilbilê min nahêlî agir û kê.
Roja min va helatî rewş û ronî didaye
Jê dibînim welatî serê min ber bibaye.

* * * *

(6) Kê: dax. Roja: an ku kurdanî. Rewş: ronî û zînet.

DÎTINA PALO DAXWAZA MINE

Di 12. 6.1960 an di çê bû ye.

Cih û warê minî Palo Bi vî rengî nedî halo Tu daxwaza dil û canî Divoka canê heyranî Di qeyda dijaminê bid kar Di benda xain û bê zar Di çola bend û evdalî Di tola şûr û mertalî Di hola dar û çoganî Di gola dijamin û canî Di qada top û napalî Di kox û kozika halî Cih û warî birîndarî Tek û tehma li ber darî Weke tîrêjê xurşîdî Cihê gernas û cemşîdî	Ji bona min tu hêlînî⁽¹⁾ Ji bo çavê me dûr bînî Dikim nakim te nabînim Gul û reyhan û nesrînî. ne dî xweşî vejîndarî demek sor û reş û şînî perîşanî belengazî⁽²⁾ qe carek xweşî nabînî. serî goke li ber kaşo di hebsa agir û kînî dibînî qumbilê jehrî⁽³⁾ ji lewra bê hiş û dînî. di mayî xendeqa tarî tenê bê rûmet û jînî pirûska canê bê warî⁽⁴⁾ seîdî û şêrê yadînî.
--	--

(1) Halo: wiha di koka xwe de ha ulo. Dûrbîn: ber çavk mirû bi pê cihê dûr dibîne. Divok: daxwaz. Heyran: qurban û gorî. Vejîndarî: xweş kirina welat. Bend: girêdan. Zar: ziman.

(2) bend: kole. Eydal: pepûk û melûl. Perîşan: şepirze. Belengaz: zîvarî. Tol: heyf. Hol: gok lîzka bi gokê. Çogan: kaşo. Canî: kujtok. Hebs: zîndan.

(3) Qad: zevî. Qumbil: narincok. Hal: êş. Xendeq: kortal. Rûmet: qedir û şêrf. Jîn: xweşî.

(4) Xurşîd: roj. Cemşîd: navê yekî ji mirekên Palo bû. Felat: rizgarî. Hîn: zanîn zanistî. Dadî: edalet.

Felat û hîn û azadî	bi çavê xwe nedîtî qet
Xebat û xwendin û dadî	ji bo te derd û xemgînî
Zimanî te dibû tarî	xuyayî bê ked û karî ⁽¹⁾
Li ber girtokê tatarî	nexweş û jar û birçînî.
Qe na pirsî çima nayî	gelo bo çi xuya nabî?
Melûl û dîl û yekdayî	ji bona min tu mizgînî
Heya kengî wihabî tu	çiraya dewletê pîfkî ⁽²⁾
Sitembarê ziha bî tu	cil û kortan û dezgînî.
Ji bona min tunîne xew	ji derdê dîn û ser şaşan
Dinafinim, girinim kew	serî nadim li balînî
Dikim hîvî ji îzdanî	bi te şabim delalê min
Te bistînim bi mêranî	ji bo min dewlet û dînî.
Ne bana ger tu meydanê	ji dê kengî dibana ez ⁽³⁾
Di vê tevdir û dewranê	wekî Berzan û şêrînî
Di hawîr te gulîstanin	çiya û deşt û zozanin
Kelat û bax û bîstanin	gelo bo çi kela xwînî?
Civata mêr kuj û harî	li ber destê sitemkarî ⁽⁴⁾
Ji baxê manî yû arî	çilo bê par û bê vînî?
Herê zanim çi ye pîlane	ki ye tu xistî ber destan
Li ser te lîzik û dîlan	ji gel na bînî nêrînî.
Rî yû tîzbî bi hev şane	firotin tu bi erzanî ⁽⁵⁾
Li ser te qêr û halane	dî kortala rik û kînî

(5) Tatar: daxwaz pê Turkin. Melûl: xemgîn. Dîl: bin dest.

(1) Sitembar: zorbar. Ziha: marê mezin. Dezgîn: hesinê ku lingê xwe dixinê û bi pê hespê suwar dibin. Balîn: baliv. Îzdan: xudê.

(2) Şêrîn: çiyayê şêrîn.

(3) Har: gezo ker û serxweş. Sitem: zor. Manî: bavê Kurd ê pêşîn. Vîn: heskir ji evîn kin bûye. Pîlan: tevdir û siyaseta.

(4) Halan: dengê bilind. Pîr: şêx. Sersar: sist û bê hiş.

(5) Komir: Bavê Turkan. Hîn: zanyarî. Bure: qesr. Bala: bilind. Tata: parçe parçe.

Ketî kortala bê warî civîna pîrê sersarî
Di benga zêr û dolarî ji lew kurdanî dişkînî.
Dibînî xwe kurê komir ne wijdane wihabî tu()
De carek ber bide bakur digêjî xwendin û hînî
Welat parêzî avake li ra ser burcê balake
Ne yarê bê cî tatakê huner mend û huner çînî.

HIN ÇIYA YÊN KURDISTANÊ

Serî rakir çıyan ber cengebazî

Dida dîtin dinê da ser fîrazî

Huner da dewr û hawîrê cihanê^(*)

Ne yarê me di xistin bendexanê.

Çilo tînin di meydanê beranî?

Ulo xweşî di nav me kir xuyanî

Di roja tengasî bo me kelatin^(*)

Bi wana em çeleng û burc û latin.

Di cengê da wekî Kawe xuyanin

Vejîndar û piling û pehlewaniin

Ji rêva Dersîm û Zagros û Arî^(*)

Cihin bona huner mendê şiyarî.

Yeka yek xwe dibîne qenc û rê ber

Ji bo kar û xebat û jîn û tevger

(1) Ceng: şer. Fîrîzî: bilindî. Bendexan: xana girêdanê, زندان.

(2) Tengasî: tengî. Çeleng: mêr û sivik. Burc: asê geh. Vejîndar: ava ker û xweş ker.

(3) Rêve: ji pêşî. Jîm: xweşî û saxî. Têvger: lebt û liv.

(4) Mîn: wek. Fîrok: balafîr. Dibîzdînin: ditirsînin. Zihak: marê mezin. Xok: beraz. Ewbaş: pîs û nezan. Faşî: zor ker.

(5) Jar: zeif û belengaz.

Li ber hev radîbin mîna firokan^(*)
Dibizdînî zihak û hirç û xokan.
Di tirsînî gur û ewbaş û naşî
Di lerzînî diz û kevnar û faşî
Di razînî ne xweş û jar û bê çar^(*)
Di lorînî pepûk û bê kes û kar.
Dixwazîn kurdîtî wek toredara
Welat parêzî bo dîl û hejara

Çar: tevdîr û derman. Pepûk/ xemgîn û melûl. Tore:
edeb. Dîl: bin dest û girtî. Hejar: feqîr.

ERARAT ✕

Erarat arî ye agir didêre
Wiha laşê ne yaran tev dihêre

Dibê pêşî cihim bo Kurdê arî^(*)
Ji nava min wiha agir dibarî
Hemî der bend û zozan û kelatim
Ji bo koça gelê kurdî dihatim.

Berê zanê xuya ye çar hezar sal^(*)
Bi mêranî li ser sînga me da pal
Ji hêla min Zerdest û Birahîm
Li ber dijmin dibûne her wekî hîm.

Ji ber vê şaye me tê me pesindan^(*)
Di rêza ser bilind û şêr û merdan
Digîm Cûdî bi keştî paye darim
Ji bona Gotiyan hêz û hewarim.

(1) Erarat: navê çiyakî ye dikevi nabêna îran û turkiye û rûsiye dewr «6» Km Ji rûyê derya bilind tire jêra dibêjin çiyayê Agrî. Koç: di «4» hezar sal beriya zanê ya «6» hezar sal.

(2) Zan: bûna Mesîh ji dê. Hîm: lat û teht.

(3) Şaye: laîq û seza. Merdan: gernasana. Keştî: gemî. Payedar: difire. Hêz: huner, quwet.

Wekî boza wekî Nûhê piyamber^(*)

Jî hêla min dibûne jîr û rêber

Li ser piştê gemî ger da ye avê
Xuyanî bû bi mîna şewq û tavê.

Bi bavik Halidî konê xwe danî^(*)

Jî nav xwe kalid û xalid deranî

Evin bavin jî bo Kurdê nihani

Bi wana dane dîtin pehlewani.

* * *

Ji qehra ser hilanî çiyayê Zagros^(*)

Kirî halan giha ye cem Ala gos

Digo mêze bike çawa dibêje?

Jî hêla xwe dibînî durr dirêje.

Dibê kokin jî nava min bila bûn

Jî tarîx û jî dîrokê xuya bûn

Di jêr û ro helatim ber bi Hemrîn^(*)

Di nava min di hêla min kirin jîn.

(4) Boza: ji Eraratê çû ye Hindê. Nuh: nû. Piyamber: pêxember û qasid. Jîr: jihatî û bîr ber. Şewq: ronî.

(5) Halidî: navê êlek ji Kurdan dûra bûn. Kalid û dûra bûn Xalidî.

Bi navê kos û kasî bûne pêda
Di nav lat û zinar û dehl û xêda

Ji bo min leşkerin Qendîl û Şêrîn⁽³⁾

Wihane Pêris û Elwend û bêrîn.

Ji ber êşa zihakê pîs û zor ker
Bila bûne li cem min dîne tevger

Ji bax û cok û cobar tijî me⁽⁴⁾

Hemî derbend û kendal û gelî me.

Tijî dar û ber û bîstan û baxim
Zinar û kozik û meydan û şaxim

Delav û avbir û kortal û çalim

Şikeft û xendeq û ber pişt û palim.

Ji ber derdê kurê xwe nale nalim

Wiha ye nazik û rind û delalim.

* * * *

(1) Zagros: zincîrek ji çiyayên Kurdistanê ye dikevi alî ro helatê. Halan: qêrîn. Ala gos: navê çiyakî ye bi «4100» endaze M ji rûyê derya bilind tire û di kevi ro avayê Tendûrek. Dîrok: Tarîx û dîtîyên rojê.

(2) Hemrîn: zincîrek ji çiyayên Kurdistanê ye bi Km dikevi jêrê Kerkokê. Jîn: xweşî. Kos û kasî: navê du hêlên Kurdîne di çaxa xwe de dewlet bûn.

(3) Qindîl û Şêrîn: navpe du çiyane dirbaz bun herwekî pêrs û elwend. Zihak: dihakê zor ker.

(4) Kendal: çal û kort. Gelî: newalên bi dag.

DERSÎM

Di ro, ava yê Kurdistan xuya bû
Çiyakî pir bilind û bê biha bû

Bi nav û dengê Dersîm ronî da ye⁽¹⁾
Di hember dijminan lat û kela ye.

Dil û cergê ne yaran jev qetandî
Demek koza kfaran hilweşandî

Derî zîve ve bû ye pê dizanim⁽²⁾
Welatê me bi destê me biranim.

Wiha em pê ji destê dijminê har
Welatê xwe dikin aza û rizgar

Li ser jorê ewî koçan xuyanin⁽³⁾
Ji bo Kurdan hewar û merzebanin.

Di hêla wê tijî çiyayê bilindin
Gelek rind û delal û mûm û fîndin

(1) Jev: ji hev. Qetandî: parçe kirî.

(2) Derî: an ku ji du pirsan Dersîm hatiye girêdan. Har: gezo ker û ser xweş.

(3) Koça: navê êlekî zazane. Merzeban: welat parêz.

Teke menzûr binêre xweş bibîne^(*)
 Tijî berf û ber û dar û gelîne.
 Riyê dijwar û asê tê xuyane
 Bi rengê das û polad û kevane
 Tijî derbend û kortal û der û ber
 Ji kevnare xuyane ev sera ser.
 Tijî kanî tijî cobar û çokin
 Cihan û cî ji bo wî dil bijokin
 Gelê têda dijîne pehlewanin
 Hemî Kurdin egîd û qehremanin.
 Bi navê soz û zaza ew bi navin^(*)
 Ji ber dijmin wekî polad û davin
 Yekî wan ber sedê dijmin zinare
 Ne ber paşe timî ber pêş û xare.
 Ji lew dijmin tim û tim bê ziravin^(*)
 Ji ber cenga ewan bê pişt û gavin
 Ketin lat û zinar û dehl û xêdan
 Hinek cengê mezin anîne meydan
 Bi (zaranik) bi gir ew nav û denge^(*)
 Gelek rind û delal û xweş û şenge.

(4) Menzûr: navê çiyakî ji çiyayên Dersime bi «3450» endaze bilinde. Ber: fikî.
 Der: newl dever. Ber: kevir. Sera ser: hemî. cobar: coka ava baranê.

Xidir şîne tijî mêrg û giya ye
Ber û kanî gul û reyhan û va ye.
Zivistanê bi leganan diçin ser⁽¹⁾
Bi derbend bi lat û kozik û der.

Wekî bûkan bi zêr û xeml û xîze
Li ber çavan dibêjî qê azîze.
Wekî zincîrê ber bi ro helate⁽²⁾
Ji bo me xweşî yû jîn û felate

Di tirsîne kurê komir serà ser
Dihêle bê xebat û kar û tevger.
TÛJIK tûce bi ber pal û bi tîrse
Li ber çavan bilind û nizm û girse

Gelek dijwar û asê ye birader⁽³⁾
Bi dijarî divê tu rê bibî ser.
Li alîkî bi dar û ber xuyaye
Rexê dî tev gul û mêrg û giyaye

Li ber çavan dibîni tal û tûje⁽⁴⁾
Neyarê xwe dixê nav arê doje.
Di hember çiyaê Menzûr pal veda ye
Wekî kohê Eraratê xuya ye

(1) Egîd: gernas. Zoz: ji zozan kin bû ye ji ber ku cihê wan zozane ji wan ra hatiye gotin zaza. Xar: êrîş.

(2) Bê ziravî: ditîrsin. Xêd: dehl.

(3) Zaranîk: ev pîrs xwe dide ber mezûr an ku niha jêra tê gotin gir û zaranîk. Şeng: qenc û sipehî. Xidir: navê çiyakî Dersîme dikevi alî ro helatê bi «3250» endaz M Ji rûyê derya bilind tîre. Vayê: çok.

(4) Legan: hedîk. Xêz: xeml û zînet.

(5) Jîn: saxî û xweşî. Felat: xelas. Komir: bavê Turkan.

Di bin da rê buwarek kûr û tarî^(*)
 Dibê arek ji navê wî dibarî.
 Tijî xar û şikeft û mêrg û kanî
 Çirê şîrin xuyane her ji banî
 Di pir caran ji wî tê deng û ximxim.
 Wekî topan di kin nalîn û gum gum.
YILANLÎ çiyayê maran tîrb û xare
 Ji bo êl û gelê maran mezare
 Wekî zincîr di hember çiyaê Menzûr^(*)
 Li dewra wî tijîne xendeqê kûr.
 Gelê têda bi doza tîrbê bavan
 Diçin ser ew bi qêrîn û bi lavan
 Dibêjin bavikê me êla maran
 Li vir çûne ketin gor û mezarên.
 Divê ku em bikin hêvî ji wana^(*)
 Di dawî da ne mînin bende xana
 Dixwazin mehderî, xweşî ji maran
 Bi bînin ew di gund û êl û şaran.

-
- 1) Tûcîk: ro helatê Dersîm û bi «2500» M bilinde. Tûce: polaye.
 2) Doje: cehenem. Koh: çiya. Erarat: Agî.
 3) Rêhuwar: rîya bûrandinê û çûn û hatinê. Arek: agîrek. Xar: şikeft û nixare. Yilanlî: pîrsekî turkiye an ku xudan mar. Tîrb: gor. Mezar: ziyaret.
 4) Xendeq: kortal. Lav: hîvî.

Guman çewt û vala ew dibînin^(*)
Bi vî rengî nexweş û dil birînîn.

* * *

Xuya ye Çil wekî Gur gur bilinde
Wekî mircan û hosta xweş û rinde

Tijî av û tijî dar û giya nin^(*)
Riyê wana xidar û nerdewan in.

Kelatin derdixin çavê ne yaran
Ji nava xwe dixin der koledaran

Wekî pembû jinandî hêz û leşker^(*)
Nejad û kokê dijmin jê kirin der.

Zel û Dûzgun bimîna hev bilindin
Li ber çavan delal û baş û rindin

Kurê Misto, sipî — salîk û Bîlgîş^(*)
Tijî cobar û cok û dar û êmîş.

Gelê vana dizanim pehlewîne
Bi mêranî wekî Ristem qewîne

Ji mêj ve ew ketin ceng û ketin şer
Kurê komir ji hev xistin sera ser.

(1) Mezar: mezel. Bende xan: xana girtinê. Mehderî: alikarin û bevanî. Şaran: bajaran.

(2) Çewt: xwehr. Çil: yek ji çiyayên Dersîme jêr tê gotin çil çiya bi «2000» M bilinde. Gur gur: bi «3000» endaz M bilinde. Mircan û hosta: navê du çiyane bilindaiya wan ne kêr «3000» M.

(3) Xidar: dijwar. Nerdewan: pêpelik û derence. Koledar: zor ker.

(4) Nejad: kok. Zel û dûzgun: du çiyane bi «2500» M bilindin. Kurê Misto: navê çiyakî Dersîme bi «1500» M bilinde. Sipîsalik û Bîlgîş jî wek wîne. Êmîş: fîkî û mêwe.

Welê dewra zemanê ber bi tarî^(*)

Berî da ye xuyanî kir ne yarî

Ji Usmanî heya çaxa Kemala

Bi destê me dibûne alî alî.

* * *

Here Palo binê dezga Metînan^(*)

Bi bîne tu nîşanê tol sitînan

Li rajorê kela Palo xuya ye

Nîşanek nazik û rind û bihaye.

Ji kar û dezgeyê êla Metînan^(*)

Wekî roj û çirax û dûre bînan

Dibê koşkin ji kevnare xuyane?

Tebûtî ew ji Kurdan her dimane.

Derî bazo çirax û mûm û fînde^(*)

Bi der û ber bi nav û ser bilinde

Melayîn û kela bancî bi bîne

Tijî bax û ber û hîm û gelîne.

(1) Komîr: navê bavê Turkaye. Alî alî: parçe parçe.

(2) Binê: binêr. Dezge: ji dest geh hatiye (senet). Tol: heyf.

(3) Çirax: Çira. Dibê: dibêjî. Koşkin: qesrin. Tebût: qewî.

(4) Derî bazo û melayîn û kela bancî: navê sê çiyane dikevi dewr û hêla Palo. Hîm: lat. Gelî: newalên bi dar.

(5) Sipî: çiyakî pir mezin û fire ye dikevi ro helat û başûrê Palo û bi «3000» M bilinde. Kosad û Şarik: çiyayên gundê me ne.

Kurin bona sipî, kosad û şarik⁽¹⁾
Xwe da ye rex sipî çiyayê kelawik

Digel dêrpam û şekrîk û kelaşîn
Veîndarin dibin derman û mizgîn.

* * *

Di hêlek pir dirêj û şîn û ava
Nê dî wek wê dinê da law û bava

Tijî gund û kelat û cok û cobar⁽²⁾
Delal û nazik û şeng û vejîndar.

Durr û mircan û morî lal û gokin
Gelê gokan cihanê dil bijokin

Tijî xan û şikeft û kort û çalîn⁽³⁾
Zinar û hêrik û deşt û newalîn.

Pelê darê ewan tim kesk û şûnîn
Nivîşt û xweşiya bê mar û dînin

Li ser axa ewan gul wek sitêrin⁽⁴⁾
Wekî bûkin bi rewş û xeml û zêrin.

Dibê parçe ê camîn xuyane?
Li ser mêrg û ber û lat û giyane

(1) Hêl: nahiye. Kelat: asê geh. Cobar: coka ava baranê ya ava buharê. Şeng: sipehî û qenc. Veîndar: ava ker û sax ker. Lal: yaqût. Gok: gokê zêr û zîv.

(2) Xar: mizare. Hêrik: girên dî koka çiyandê. Bê mar: nexweş.

(3) Rewş: ronî û pesn. Xeml: zînet. Dibê: dibêji. Ber: kevir.

(4) Diyarîn: xuya dibin. Bi jîn: xudan jîn.

(5) Tarîx: mêjû û dirok. Merdane: mîranî.

Ji nav latan didin der av û kanî^(*)
 Çirê şîrin diyarin çem ji banî.
 Gelek cîjî di tirsînin bi jîna
 Cihên dî sax dîkin bê mar û dîna
 Nîşan û şopê Kurdak û Metînan^(*)
 Cihê şêr û piling û dest hilînan.
 Me ev tevda ji tarîxê didîne
 Ji bo ceng û şer û merdane cîne

* * *

Bi pê hev ev digêjin çiyaê Bîngol
 Bi Nemrûd û bi Qidîl û Herekol
 Bi Horîkan û nalpat û Şerfdîn^(*)
 Guman kaşan û şêtan û kevirçîn.
 Dibin zincîr digel menpal û tosîk
 Dîkin holê diqada Mûş û Gonîk.

* * *

Kela şîn û çinar û çole mergin
 Ji bo dijmin rim û tîrê di cergin

(I) Nemrûd: navê çiyakiye dikevi ro helatê Mûsê û «3050» M bilinde. Qendîl: di ro helat û bakurê xunîs da ye «3250» M bilinde. Horîkan: bi «3150» M bilinde û dikevi Bîngolê. Nalpat: bi «2930» M bilinde û di ro helatê Erzîrûm da ye. Şerfdîn: bi «2500» M bilinde di başûrê Bîngol da ye. Guman kaşan: di Bîngolê da ye bi «2850» M bilinde. Şêtan: bi «2500» M bilinde. Kevirçîn: bi «3200» M bilinde.

Rexin çal û Qere gol û Elîfan^(*)
 Hevalinmujged û xurlîk û Sîpan.
 Hewarin siblis û erxat û pirşîd
 Ji bo me ronî dane rengê xurşûd
 Melato gumgum û çeçmaq û kerkor^(*)
 Qezan û qop û şûşan û tevî Tor.
 Bi her awa tijîne bax û bîstan
 Çem û kanî rez û dar û gulistan
 Kula tendûrek û ullah û ekber^(*)
 Ne yarê xwe kirin bê zar û bê ber.
 Sefîn û Pîremekrûn û Qere dax
 Tewar û bêlagan û gurgur û şax

(2) Elîfan: dikevi bakurê Wanê. Mujged: «3300» M. Xurlîk: çiyake. Siblis: di Palo da ye. Erxat: dikevi bakurê Wanê. Xurşîd: roj.

(3) Gumgum: çiyayê varto ye. Çeçmaq: dikevi Bîngolê.

(4) Tedûrek: bi «3200» M di bakurê Wanê da ye. Sefîn: dikevi Îraqê. Bîlegan: di jêrê gola Wanê ye. Tewar: bi «3000» M di bakurê Wanê.

Qeder ger çi Heq hatî diyarê

Di pêşî ew ketî bend û jimarê

Ji olê qet cuda nabî bi carek

Ne gotî nekxebat û bend û karek

Ne gotî rabe xwe têxe gemarê

Bihêle minet û derd û zinarê

Li ser xwêdeyne darê dijminê har

Bibîne xwe hejar û dîl û bê zar

Serî berda di dîwana temarî

Xulamê ser hejîn û sextekarî

Xirafata bike kar û xebatê

Ji bona xwe kuta bûn û beratê

Bixwaze der cihana roja dawî

Bi destê xwe firoş û pîl û bawî

Bibêje ez bikim gorî dil û can

Ji bo pîrê delal û serê merdan

bide pesnê gur û Hirc û berazan

Bimîne ber derê kevnar û sazan

Nizanim ev ji kû derxist û tanî

Bi tîpê ser gilokan ya biyanî

Di xana gor nebas û kund û haran

Di benda bê his û dîn û dewran

Bi tûrê çapik û kulmê zikatê

Bi darê kuştin û ar û sewatê

Bi dar besta beg û axa û mîran

Bi şûre cî sitin û kole giran

(1) Hoq: xudê. Hatî diyarê: xuya bûye. Ol: dîn. Cuda nabî: xwe nade alî.

(2) Hejar: belengaz. Dîl: bin dest. zar: ziman. Temarî: xewa mirinê. Sextekarî: hîle kari.

Cihê mêr û piling û kurd û şrin
neyaran hûr dîkin ber ba diderin

Bi her rengê tijîne der û mêwe
Ne dîne serê xwê carek zar û sêwe
Nişanê kevn û kevnare tijîne
Ji dîrok û ji tarîxan dîne

Bi pitrolê evan deng da cihanê
Bi sêran û bi kêf Kamêranê
Gelê têdane mêrê ro hilatin
wekî ristem li ser dest û kelatin

Birin carek bi xap û dîn û îman
Bi zorê danî ser me dar û minet
Hero fermanekî nû tê ser me
Di havînê jî bo me ar û germe

Zivistanê qeşa girtî serê me
Sitem her tim heval û hemberê me
Guman pêv û pîrsa dîn û mestan
Qeder karê hejar û mil û şikestan

Bi cep zani ji dewrana cihanê
Ji heq nas û ji quran û jiyanê
Edîb û fêlesûf û ser tekane
Huner baz û jîr û zane

* * *

(1) Kurd: pehlewani. Mêwe: fîkî. Şêwe: zarav. Dîrok: ji du pîrsan hev bende,
«1» Di ji dîtin, «2» Rok ji roj an ku dîtinên rojê.

(2) Kamêran: xweşî û hêsanî bexteyarî. Mêr: mêr.

(3) Ferman: emir.

(4) Qeşa: bûz û cemed. Sitem: zor û kotek. Mest: ser xweş. Hejar: xizan.

(5) Çeo: vaji, xwehr. Heq: maf. Jiyan: xweşî û saxî. Edîb: torevan. Fêlesûf:
pêtol. Jîr: jîhatî û bîr ber evên dawî dîkin kirde ker ji bo zanî.

AMED: DIYAR BEKIR

Kul û derdê te Amed	birîn dane dilê me
Ji Mêd û Mad û Amed	tu hatî ser milê me
Ez mame ber gumanê	di texmîn û di ravê ⁽³⁾
Di vê qad û meydanê	di vê dewran û gavê?
Diyar bekir çilo hat	di şûna pirsê Amed?
Ji Xatî ya ji berat	tu Amed bigre ber med
Bêna zarê Kurdanî	ji vê pirsê di fûrî ⁽⁴⁾
Kî ku bibê dizanî	ji nêzik û ji dûrî.
Ku ev cihê Kurda ye	ne ê Turk û biyanî
Huner baz û merda ye	kurê majîk û manî

* * *

Wekî hêvê xelek da	li hawîrê te Dicle ⁽⁵⁾
Çem û kanî emek da	feqîr û jar û kole.
Kulîk û zad û pincar	li dewra te xuyane
Tijî bax û tijî dar	gul û mêrg û giyane
Bi qawûn û bi qarpûz	dibînim nav û dengî ⁽⁶⁾
Cihek xweş û cihek dûz	delal û naz û şengî.

(3) Xirafat: direw. Kuta bûn, xelas bûn. Pîl: mezin.

(4) Gorî: qurban. Pîr: şêx, Merdan: koma merde, pehlewani.

(5) Tîp: herf. Biyanî: ejnebî. Gor nebaş: gor vedok û kefen diz. Har: gezo ker û

(1) Amed: hat navê Diyar bekirê keynare ye xuya dibe ku ev pirs ji pirsê mêd û mad hatî ye. Rav: guman û têbîr. Xatî: ji Anadola niha ra tê gotin ger çi di koka xwe da kurdî ye. Bigir: pirsê Amed û Diyarbekir bavê.

(2) Dibê: dibêji. Biyanî: ejnebî. Merda: mêra.

(3) Emek: qencî û wefadarî. Jar: zeîf û nexweş. Pincar: giya.

(4) Qawun: talik, kalik, xendore. Qarpûz: şebeş. Şengî: sipêhî. Mêwe: fîkî.

(5) Cobar: coka ava baranê ye ava buharê. Hîn: zanîn. Jiyanî: xweşî.

Çiyakî bilind û hênik li bakurê dibînim
 Didim ber çav û nênik gul û mêwe diçînim
 Çolek fire xuya ye çem û cobar û kanî⁽¹⁾
 Serê te ber bibaye cihê hîn û jyanî.

* * *

Gelek şêr û tekane ji nav te bûne pêda
 Konê geşî ve dane edîb û jîr û sêda
 Di pê hev dar û derbê gur û hirç û biyanî⁽²⁾
 Ji Rûm û Firs û kerbê kulî xwar û zebanî.
 Ji Toran hatî agir ji Têmûr û Hilako
 Li ser te danî kafir rim û destûr ji Bako
 Li dû hatin zebanî bi navê dîn û îman⁽³⁾
 Şeh û xanê xizanî ne danî dar û lêdan.
 Kirin hejde wilayet cihê Kurdê sitembar
 Ne dîti dar û furset gihandin ew çil û çar
 Welatê me sitandin bi vî rengî ne yara⁽⁴⁾
 Çira me da mirandin sitem kar û xidara.
 Bi pîlan û siyaseta bi ferman û bi zorê
 Bi quran û bi ayet bi lêdan û bi gorê
 Bi pîr û ser gilokan bi hov û rî dirêjan⁽⁵⁾
 Bi har û hirç û xokan ne zan û pîs û gêjan.
 Dixwarin goşt û xwîna me bê çar û belengaz
 Kirin zîndan û pîna ser û mîr û huner baz
 Emi dane ber gerrokan kirin sed parî parî⁽⁵⁾
 Arê tang û firokan berê sorin di barî.

(1) Edîb: torevan. Sêda: mamûsta. Derb: lèxistin. Gur: dijminê diende. Hirç: dijminê bê mîrê. Kerb: kovav. Zebanî: Turk. Têmûr: Têmürling. Hilako: niviyê Cengîz Xan. Bako: dikevi kîmarê gola qizwîne di roava.

(2) Şeh û Xanê: padişahên Usmanî. Xizanî: perîşanî. Sitem: kotek û zor. Furset: ferzend.

(3) Xidara: dijwara. Pîlan: tevdîr. Gor: tîrb.

(4) Pîr: şêx. Har: gezo ker. Xok: beraz.

(5) Gerok: meşok, tirimpêl. Teng: debabe. Firok: balafir. Ber: gulle. Tenge zarî: perîşanî.

Dengek ji te nabînim razayî ye şiyarî
Çilo ez bê civînim di mayî tenge zarî?

* * *

Niha rabe meles ke tu porê xwe bi çakî⁽¹⁾
Ne yarê xwe teres ke bi destûr û civakî
 Bi mêranî tu xame li ser masê hilîne
 Niha dewra kelame belg û pelan bibîne.
Were meydan beranî bese bo te ne wêrî
Heya kê tu xizanî li ber sator û kêrî
 Tu paytexa me Kurdan li ser te cenge bazi⁽²⁾
 Çima bûyî perîşan li ber dar û tinazî?
Hejar û bê kes û kar ji roja sêpî danîn
Melûl û jar û bê çar ji gava Şêx hilanî
 Dil û canê me gorî ji razanê şiyar be⁽³⁾
 Bese paldan û lorî ji bo te dem xirabe.
Tu yî canê me Kurdan hîvî dikim tu rabî
Ava bike dibistan ji nav xwe rake tabî
 Berde gemar û dijamin bi ser bestî bi jîrî⁽⁴⁾
 Ji ber hev ke ser û bin hilîne kole gîrî.
Binê zora ne yara di nav lawê te danî
Rêça diz û kufara di nav te kir xuyanî
 Xortê delal û mêr xas serê wan jêkirin tev⁽⁵⁾
 Mêrê çeleng û gernas laşê wan reş kirin tev.
Li ser devê rîyan rêz kirin serê egîdan
Tev pehlewana û ser hêz xudan xar û cirîdan

(1) Meles ke: şe bike û şayik bike. Çakî: Başî, xweşikî. Civakî: hev girtin. Xame: qelem. Belg: kaxiz. Newêrî: tirsonekî. Xizanî: hejarî û perîşanî.

(2) Perîşan: şepirze. Hejar: belengaz. Melûl: xengîn. Jar: zeif û pepûk û nexweş.

(3) Gorî: qurban. Xirabe: wêrane. Dibistan: hînga û xwendega. Tabî: kozik.

(4) Jîrî: jîhat bûn. Kole gîrî: zor kerî. binê: binêre.

(5) Çeleng: jîhatî û sivik. Gernas: pehlewana. Egîdan: mêran. Hêz: huner, quwet. Xar: êriş.

Serê xwe wan qusandin	çavê xwe kil kirin tev ⁽¹⁾
Simbêl bi fetl û badin	bi rengê gul kirin tev.
Da ku dijmin bi zanin	ew can polane her tim
Wek Ristimê keya nin	rêçik kolane her tim
Da xortê me ku rabin	huner ji me hilînin
Wek şêr û ejdehabin	daxwaza xwe vejînin.
Ji îzdan û piyamber	bike hîvî tu carek ⁽²⁾
Ji merdanê dilawer	bi xwaze top û xarek
Bi Pîkîn ra hevalî	bi gir destan bi toqe
Bi dehlê ra helalî	çê ke bi kêf û şewqe.
Ji Qahire ji Kabil	ji Çakerta, Buxarîst ⁽³⁾
Bi xwaze hêz û havil	ji Bexda û Budabîst
Ji Mosko tu hilîn çek	pîs û xain derîne
Ji nav xwe rake ev dek	gul û reyhan biçîne.
Mîna xelkê cihanê	dakev kar û xebatê ⁽⁴⁾
Sera û berlemanê	bîne deyne mezatê
Navê mirûv û însan	bi dadî tu bixwîne
Bi destûr û bi wijdan	bi şadî cî bibîne.
Dewra nezanî ra bû	her kes giha felatê ⁽⁵⁾
Li ser te hovî ca bû	tu ber dar û şewatê
Gelo, cihan nabînî	çilo ava û şîne?
Devê guran di mînî	cihê hê bi xwîne.
Ji alî kar û fêdê	nîne wek te dinêda
Di mayî bend û qêdê	finas û xap û kêda

(1) Fetl û badin: simbêlê xwe di fitilandin û ba didan. Ejdeha; di vir bi daxwaza gernase. Vejînin: sax bikin û bi parêzin.

(2) Îzdan: xudê. Piyamber: pêxember. Dilawer: pehlewani. Xarek: êrişek. Pîkîn: parêzgeha Çîna gelêrî ye. Toqe: dest girtin û givaştin. Delhê: parêzgeha Hindistanê ye.

(3) Kabil: paytexta Efxanistanê ye. Çakerta: parêzgeha Endonîsiya ye. Buxarîst: paytexta Romaniya ye. Havil: feyde. Budabîst: parêzgeha Mecere.

(4) Sera: berlemanê serokan. Dadî: edalet.

(5) Felat: xelas. Ca: cî û cih.

Ji min ji te nizanim ev tevgera çir û vir⁽¹⁾
 Li ser vê gumanin ku hê dikim xir û cir.
 Dibistan û çap û tîp xwendegah û zanistî
 Ji bona min dar û xîp jar û nexweş û kuştî
 Dengê dinê bila bû giha ezmanê banî⁽²⁾
 Bo min çilo nema bu jiyan û kamêranî?

* * * *

(1) Çir û vir: ji hev ketî û direw. Çap: der xistoka kitêban. Zanistî: zan-
yarî. Xîp: kelem.

(2) Jiyan: xweşî. Kamêranî: başî, hêsanî.

MIHABAD

Di 1946 an de. An ku ev rist kul û derdê Mihabadê di 1946 an de dide zanîne ka çima Mihabad ne ghişte felat û daxwaz û jîne û kete ber agir û pêl û şîpê xwînê?

Jê dirbas dibe û diçe li bal êş û jana miletê Kurd di wî çaxa reş û tarî ku tenê li ser Kurdan agir di barî.

Mihabadim	çilo	yî	çima	digrî	dinalî?
Ji kînga	tu	ulo	yî	bê hogir	û hevalî?
Gelo	bê	yar	û sozî	belengaz	û hejarî? ⁽³⁾
We	ya	bê	par	û dozî	tenê ber nîr û darî.
Tenê	bê	berlemanî	sera	û tîp	û leşker
Wezîr	û	ser miyanî	kitêb	û xîz	û dofter.
Civat	û	xwendin	û zar	dibîstan	û bervedêr ⁽⁴⁾
Felat	û	jîr	û huşyar	vejîndar	û pendegêr.

* * *

Mihan	ava	kîrî	tu	bi zanîn	û bi tore
Li ber	ar	û li	ber du	cihê	te tev bi gore
Tu	ne	pêkê	xudayî	bijar	û destegêr ⁽⁵⁾
Ji bona	me	ne	dayî	cihê	Kurdê dilêrî.

(3) Mihabad: ji du pirsan hatiye hev, Mihan ku mezin û Abad an ku ava. Belengaz: Şepirze. Hejar: feqîr. Berleman: civata bijaran. Tîp: herf. Xîz: xet.

(4) Zar: ziman. Debîstan: mektebe ji edebistan hatiye. Bervedêr: muhamî. Pendegêr: şîret kar. Mihan: mezinan. Tore: edeb.

(5) Pêk: qasid. Bijar: neqandî. Dilêr: pehlewî.

Herê zanim tu hatî	li cem îzdan hinarî
Ji bona min xelatî	bi ser bestî diyarî
Diya deşt û kelatî	diya şêr û huner baz ⁽¹⁾
Çiya û him û latî	ser û mîr û serfiraz.
Diya zanîn û rûmet	Merdan û Sêf û Qadî
Hewar û hêz û dewlet	destûr û hîn û dadî
Xar û şikeft û der bend	pitrol û zêr û kanî
Bedixşan û Semêrqend	ji te xweşî helanî.
Dar û ber û gulistan	govend û fîz û şahî ⁽²⁾
Bax û derya û bîstan	parastin û penahî
Cobar û cok û kanî	meydan û mêrg û zozan
Jor û hevraz û banî	kêf û jiyan û sêran.

* * *

Çima şîrê te bo me	ne şêrîn û zelalî?
ji pêşîrê te kome	ji bo dijmin helale
Dilorînî bi xweşî	dirazînî bi nazî ⁽³⁾
Dicî ber sîng û poşê	ji bo wî deng û sazî.
Te ew biskê delalî	kirin destê ne yara
Te ew çavê xizalî	didana mişk û mara
Te ew porê zerîşan	kirî destê segê har
Ji lew mayî perîşan	belengaz û sitembar.

(1) Kelat: asê geh. Him: lat û teht. Ser: serok. Mîr: ji mîr hati ye. Hîraz: bîlind. Rûmet: şeref û qetîr. Merd: pehlewani. Sêf: pîsmamê Qadî. Hêz: huner. Him: zanyarî û zanî. Dadî: edalet. Derbend: derî yê kûr û teng. Kanî: maden.

(2) Ber: mêwe û kevîr. Derya: koma derî ye, behr. Penahî: parastin. Hevraz: berwar. Jiyan: xîweşt. Pêşîr: sîng.

(3) Nazî: delalî. Poşî: ser çavk.

(4) Seg: kûçik. Har: gezo ker ji hêran hatiye. Tîm: zor. Erxewan: sorê zelal.

Te lêvê enxewanî çilo dayî sitem kar?
 Tu dêmê gewr û manî çima nadî vejîndar?
 Sitem destê xwe da ye diz û kevnar û xokan
 Li ser te berf û baye ji darê ser gilokan.
 Zora şehê kevnare bê dîn û bê îmane⁽¹⁾
 Mîna tûpişk û mare ne soz û ne pêmâne
 Li ser te bê jîmare divê bête mirandin
 Ne noka ew li kare darê xwe rahejandin.
 Roja ku şahî danî em dihiştin bê welat
 Ser me zor û ziyânî lêdan û ar û şewat
 Kevnitiya kevnare kirî rêzan û destûr
 Rengê zihak û mare mîna gura zûre zûr.

* * *

Dîlovani ne hatî li warê te bi carek⁽²⁾
 Ji ro ava helatî ji bona te zerarek
 Xuya ye ro helatî diva ya te ne kir cî
 Bê tevger û tebatî feqîr û jar û birçî.
 Bi xîzê ejderani xetek sor û xetek reş⁽³⁾
 Li ser sînga te danî tu nîne bo te zer keş
 Çilo barê diyanet berî da te bi zorê
 Ulo darê xiyanet berê te da ye gorê.

(1) Sitem: kotek. Xokan: Berzan. Peyman: qîrar. Noka: tîha.

(2) Şahî: padişatî. Zihak: ejdiha û ejder, ejdihak marê mezin.

(3) Dîlovani: dil nermî, dil tenikî. War: welat. divaya: daxwaz. Tebat: hedan.
Jar: nexweş û zeîf.

(4) Xîz: xet û nivîsar. Zer keş: welat parêz. Gor: tîrb.

(5) Arî: xulî. Keyd: fenas û hîle. Zendan: cihê girtina saxan, hebs.

Herdû di cîkî tarî	heval û dost û yarin ⁽¹⁾
Duxan û toz û arî	ji bo Kurdan li karî
Bi xap û keyd û bendan	ji hev xistin bir bi bir
Bi girtin û bi زندان	windakirin hûr û gir.
Felek arê xwe dada	bi dijmin ra hevale
Wiha darê xwe bada	diya hirç û Kemale
Destê xwe da ye bê jî	Tu xistî ber şek û dar ⁽²⁾
Li ser te dest dirêjî	bê pîvan û bê jîmar.
Xelkê dinê sera ser	kirin ne yar û dijmin
Bo te ziyar û berber	ji hev xistî hin û hin.
Ji rast û çep xuya ye	birîna te xidare ⁽³⁾
Ji darê ejdiha ye	ji peymanî kufare
Çiye zanîn û derman	kiye dektor û zane?
Ji kû ye xar û ferman	li kû ma ye tekane?
Dilovanî li kû ye	huner mendî çilo ye?
Çima ber ar û dû ye	tenê îro ulo ye?

* * *

Kurê te rê ne nase	xulamê put pereste
Li der bend û li kaşe	benê ser xweş û meste
Bi xama erxewanî	di xwendin bera paş ⁽⁴⁾
Bi dama bê emanî	ewê barê xwe bir aş.

(1) Bê jî: bêkok û bê esil. Ser ser: hemî. Ziyar: zirar. Berber: ser jê ker.

(2) Xidare: dijwar. Ejdiha: marê mezin û dijminê ziyar ker. Peyman: soz û qirar. Dektor: bijîşk. Xar: êriş. Tekane: bê havil û hember. Dilovanî: dil nermî û dil tenikî. Put perest: senem parêz. Ben: hefsar û weris. Mest: ser xweş.

(3) Xame: qelem. Erxewanî: sorî. Dam: girtok û dav.

(4) Nejad: kok. Ar: kirêt. Sert: dijwar û asê.

Erê	xwîna	biratî	dide	xwîna	hevalî								
Kur	û	qîz	û	welatî	berê	xwe	dane	lafî					
	Nejadê	xwe	guhertin		nejadê	bê	cih	û	ci ⁽¹⁾				
	Ji	bê	ar	û	sertin		didin	ber	dar	û	qamçî		
Hevalî	ger	çi	başê		nabe	mîna	biratî						
Li	ber	pêş	û	ne	paşê		dixwaze	hîn	û	aştî			
	Ji	rast	û	çep	ne	dîne		te	soz	û	ne	peyman ⁽²⁾	
	Li	ser	te	xem	civîne			ji	êş	û	dar	û	lêdan.
Ji	mejdana	helatî					ketî	kortal	û	çalê			
Li	ber	ar	û	şewatî			tevan	xwe	daye	palê			
	Kurê	tev	dibûn	bir			bi	pîlana	ne	yara			
	Bi	girtoka	hîr	û	nîr		bi	dar	besta	dînara.			
Di	roja	tenge	zarî				dibin	dostê	dewara ⁽³⁾				
Pîsî	dikin	diyarî					ji	bo	qenc	û	bijara.		

* * *

Bi	hevra	dost	û	yarî	Umer	—	xan	û	qeranî	
Hevalê	kole	darî			di	fermana	biyanî			
Ezîz	—	mam	û	Hesen	mam		ji	bo	dijmin	şivanin ⁽⁴⁾
Bira	û	ap	û	pîsmam		xulam	û	dêrgevanin.		
Kirin	sê	pî	ser	û	mîr	bi	mîna	Sêf	û	Qadî
Birin	seydê	beg	û	pîr		bi	dîlan	û	bi	şadî

(1) Daye palê: xwe da ye alî û xwe veşartîye. Bir: parçe. Pîlan: tevdir û siyasîet.

(2) Tenge zarî: tengasî. Diyarî: xuyanî. Bijar: neqandî. Umer Xan: serêkê êla Şikakan û hin êlên din li dawî xwe sipart hikûmeta Îranê. Qeranî: û kurê xwe û begê êla Mam Hesen û Mam Ezîz û heval bendê wan xîyanet kirin û bûn neyarê Qadî.

(3) Pîs: kur ji pişt hatî ye. Kirin sê pî: di 31. 3. 1947 an de Qadî û di gel pîsmamê xwe Sêf Xazî ku ser leşkerê tevayî bû û birayê xwe Sedrî Xazî ku pêkê aştî bû kirin sê pî û kuştin.

(4) Mezar: mezel.

Gelek şêr û tekane	birin kuştin ne yara ⁽¹⁾
Mela û jîr û zane	kirin tîrb û mezara.
Rengê Şîraz û Nerdî	Hemîd û Kenzewanî
Resûl axayê merdî	Şêr zad û Baba xanî
Bilaxi yû mazo çî	rewşen fikr û Eflî xan ⁽²⁾
Di wê bax û di wê cî	wek Sedrî yû kes nezan.
Pirin nayên jimarê	ewên ku winda bûne
Ji gund û êl û şarê	welatê me di çûne

* * *

Qelem lale ji gotin	nikarî tev bibêjî
Divê ew bête sotin	Eger derdan birêjî
Cihan tevda giha ye	delal û nû bara xwe ⁽³⁾
Tenê bo me bela ye	na bînin mûmara xwe.
Pitrol û zêr û kanî	min jê nedî tu havil
Ketin destê biyanî	bo min xirab û kaviî
Top û tîfing û agir	va navê min dixwînin ⁽⁴⁾
Kevnar û pîs û kafir	xîp û bêjî di çînin.
Bê cî xama ziyânî	bi tîpê erxewanî
Kirî destê zebanî	li ser warê me danî
Peyman û bend û hizbî	destê xwe dane hevdu ⁽⁵⁾
Şaş û sîwak û tizbî	ne xweşin pev dane du.

(1) Cihan: koma cihe. Nû bar: berê nû yan buhara nû. Pitrol: nift. Kanî: maden. Tu ji çu hatiye, tişteke ji tiştan. Havil: feyde. Biyanî: ejnebi. Xirab: wêran û kaviî.

(2) Kafir: bê dîn. Xîp: kelem. Bêjî: darên wek keleman. Xama: qelem. tîp: herf. Erxewan: sor. zebanî: Turk.

(3) Peyman: qirar. Pev: xwe bi nexweşin ve digre. Felat: xelas. Rûmet: qedr û şeref.

(4) Burc: asê geh. Xar: şikeft û mixare. Dîn: ol. Îman: bawerî. Pend: şîret.

Dîn û cihan û dewlet	kirin tayê rî yû şaş
War û felat û rûmet	kirin bin pî mane paş
Hevalin bo ne yara	kifîdê ser sînorin ⁽¹⁾
Ji lat û burc û xara	di erdê hişk û şrorin.
Riya minî delafî	diçe baxê buhîştê
Ji bona min hevalî	jê dûr dike kenîşê
Dibe ser dîn û îman	riya wijdan û xîret ⁽²⁾
Soz û qirar û peyman	pend û xelat û şîret.
Pêşve çûn û xweserî	hev parî yû hev gefî
Nîştiman û per werî	jê der dixê xer gefî

* * *

Bavê minî huner baz	divaya min ne kir cî
Diya minî belengaz	melûl û jar û birçî
Rengê silah û zendî	ketin koza ne yara
ser min kirin efendî	xulamê dîn û hara
Ew xwe-dikin ser û mîr	em destik û belengaz
dibin ser xap û nêcîr	dinê da em tenê saz
Ê ku xwîna me xori	nadin bav û birader
kevnar û Turkê torî	tazî ji nejadê da der
Ji lew welat dibû bir	bi tetrîk û bi tecîm
Bi peymana hir û nir	li ber dar û ber û him

(1) Divaya: daxwaza. Belengaz: perîşan. Melûl: bê kêf. Jar: nexweş û zêf. Silah: Silahedîn Eyûbî. Zendî: Kerîm Xan Zendî. Har: ser xweş. Destik: Heval bend. Şaz: ne wek xelkê cihanê.

(2) Bir: parçe. Tacîm: tefrîs. Ber: kevir û gulle. Him: lat.

(4) Bend: berberî.

(5) Ber: mêwe û fîkî.

Birayê min ne zane	berê xwe da ye camî ^(*)
perîsan û xizane	sivanê gurek û derdan
Bi hev tev dane kuştin	wekê Mehmûd û Etman
Ji lew şûn xwe dihiştin	civata êş û derdan
Pevçûn û bend û kînî	jê tene der piranî ^(*)
Gend û gemar û dînî	pêlin dibin xuyanî.
Kurê min nû giha ye	taştê li vir dixwî ew
Firavîn Emrîka ye	şîva wî her di Moskow
Gava ku tê te malê	ber û fikî dixwaze ^(*)
Kurê yar û delalê	xulamê gewr û boze.
Qedr û qîmet nizanî	her dikêşe ber berî
Ez dibêjim Kurdanî	ew dibê ka nû berî?
Min divê ku Kurdistan	bibî zengîn û ava ^(*)
Tev da bax û gulistan	gula can û hunava.
Dibê derdim cihane	bi gêjî kêf û şadî ^(*)
Em tev tê da birane	her dixwazin azadî
Keça min her dilîze	qe naçe xwendegayê
Gelek rind û ezîze	delala bav û dayê.
Ji lew bê nav û denge	ne wek qîzê cihane ^(*)
Ne ser best û çelenge	perîsan û xizane
Nabe dektor û zane	berî nade şiyarî
Tim û tim ber piyane	na gêje raste garî.

Jina minî evîndar	divaya wê ez û mal ⁽¹⁾
Ji bona wê bikim kar	her tim li cem bidim pal
Carek ne çim tu alî	destê xwe têxim paxil
Jêra bikim hevalî	ger çi ne kim tu havil.
Kundo dixwazî bimirin	da malê min bixwî ew ⁽²⁾
Gava diya xwe bigirin	dibêjî min bes û tew
Apo rîya xwe berda	xulamê ber derê pîr
Civîna êş û derda	yesîrê qeyd û zincîr.
Dijmin dava xwe danî	li ber min û birazî ⁽³⁾
Nêçîra xwe helanî	ez çi bikim ne razî
Destê min naçî xame	nizanim ez çi bêjim?
Li ser min çi xurname	ji lewra cîn û gêjim.
Xanî xirab û wêran	bê çek li çol û derva
Li ser min ba û baran	va ez mirim li serma
Kurê min hê dibêjî	wer em hîn semayê ⁽⁴⁾
Rengê sofî dipêjî	di nîva berf û bayê.
mez û huner na bîne	endazê niştêmanî
Dad û wîjdan ne cînc	na gîşt ser miyanî
Ji lew dijmin dizîne	jev kirin parî parî
Alî kî eînebîne	roxê din alî karî.
Ev çi guman û doze	jê havilek ne bînim?
Ev çi howar û soze	geio ez pê emînim?

(1) Şadî: şahî. Azadî: ser bestî. Xwende gah: cihê xwendinê medrese.

(2) Qiz: keç. Çeleng: jihatî û sivik. Perîşan: şepirze û bila wîla. Xizan: hejar. Restegarî: rizgarî û xelasî.

(3) Evî dar: hes kirî. Paxil: paçil. Havil: feyde.

(4) Kundo: wêran ker. Pîr: şêx. Yesîr: girtî. Xame: qelem. Cî: cih.

(5) Dev: xelek bendî. Min: Kurdê welat parêz. Birazî: xortê nû hatî.

Destê vala nikarî top û tîfing hilîni⁽¹⁾
 Li koxa teng û tarî kî dar û ber diçîni?
 Lat û kevîr birane destê xwe her dane min.
 Deşt û çiya xuyane ku ez bi wana amin
 Zûzû dijmin nikarî ferzend tê da bibîni⁽²⁾
 Bi destê kole darî gumanim xwe digîni.
 Xar û şikeft û der bend ap û kur û birazî
 Jîr û ser û huner mend doza welat û qazî
 Cobar û cok û kanî arîne bo xebatê⁽³⁾
 Ser destî yû beranî xuya dikin felatê.
 Cenga dilêr û destûr destê xwe ger bidin hev
 Ronî dikin cihê dûr dijmin li ber dikin rev
 Ji bona wê xulamin kur û bav û birazî⁽⁴⁾
 Li ber wê bê emanin diz û kevnar û tazî.

* * * *

(1) Wêran: xopan û xirbe. Endaz: alat. Nîştemani: welat parêzî. Dad: edalet. jev: ji hev. Rex: alî. Havil: feyde.

(2) Ber: fîkî û kevîr an ku avayî û şînayî.

(3) Ferzend: fîrset. Koledarî: zor kerî. Xar: mixare û şikeft. derbend: derî yê girêdayî û cihê kûr û teng. Jîr: bire wer û jihatî. Qazî: Qadî Muhemed serêkê komara Mihabad. Cobar: coka ava baranê ya coka ava buharê. Dilêr: pehlewana.

PALO



Palo Ji pehlo hatî xuya yî rengê Berzan
 Ber dijminan kelatî xuya ke tirs u lerzan
 Ne mine jar u bin dest melul û bê kes u kar
 xuya be jîr u ser best hunermend u vejîndar
 Ne mîne jar û bin dest melûl û bê kes û kar
 Xuya be jîr û ser best huner mend û vejîndar.
 Te navê cenge bazî li ser cihê xwe danî
 Te pîrsa ser firazî ji bo kurê xwe tanî
 Zarek dike xuyanî gelê te pê xuya ye⁽¹⁾
 Ew zarê pehlewani rengê reş û çira ye.
 Ji partiyan te anî ev êl û gel bi jîr
 Te gurzê pehlewani danî li ber emîrî
 Te dada kê qubadî xuyanî kir bi şadî⁽²⁾
 Te rêza Kurdê Madî anî di vê mezadî.
 Burca kurê Metînan li ser koh û kelate
 Mîna dez û kormînan ew nişana felate
 Mêrani jê difûrî dide dîtin şiyarî⁽³⁾
 Ji nêzik û ji dûrî jiyan û restegarî.⁽⁴⁾

(1) Palo: dikevi bakur û ro avayê Diyar bekir cihê paxir û hesin û pitrol û komira keviri ye û ziv û zêre. Ji pehlo: an ku Palo û pehlo bi daxwaza pehlewani ya zimanê kevnarene. Jar: nexweş û zeif. Melûl: bêkêf.

(2) Ji partiyan: an ku pehlewi, parti eşkanî yekî. Emîrî: derebegî.

(3) Dad: edalet. Qubad: dadewer çê kerê dewleta Mêdiya. Burc: asê geh, koşk, tarix dibêje ew xani yên li ser kela Palone ê Metînane. Dez: asê geh. Felat: xelas.

(4) Jiyan: xweş. Restegarî: rizgarî.

(5) Pepûk: melûl û xemgîn. Nejad: kok. Tip: herf. Zar: ziman.

Îro çima kurê te ma ye bin destê dijmin?
 Agir ket hindirê te ji arê dîn û xain.
 Bû ye rengê pepûkan belengaz û perîşan⁽¹⁾
 Ma ye ber dest û tûkan li ber derd û kul û jan.
 Nejadê xwe nizanin wekî hov û dewarin
 Xudî zar û zimanin çilo bê tîp û zarî?
 Bibêje law û bavan binêrin çerx û dewran⁽²⁾
 Ta kê şivan û gavan bo Turkê lawê Toran.
 Mej navê we dizanî ku hûn tev pehlewîne
 Mej tarîxê deranî ku hûn şêr û qewîne
 Nizanim ka çima hûn niha ne şêr û mêrin?
 Belengaz û feqîr bûn tirsonekin newêrin.
 Dengê Cemşîd û boldûq ne hatî we bi carek⁽³⁾
 Dijmin ne gotî: yazûq herro li ser we darek
 We ser danî li ber der pepûk û jar û mehrûm
 Tenê bê doz û bê ber hejar û dîl û mehkûm.
 Di bin destê ne yarin tenê jev tar û marin⁽⁴⁾
 Bê gazî yû hewarin ji lew ber top û arin
 Mêze bikin cihanê jê şîretê hîfîn
 Di vê çax û zemanê ramanek jê derînin.
 Her kes giha doza xwe hûn bes tenê esîrin⁽⁵⁾
 Azadî yû soza xwe bê yar û deste girin

(1) Toran: Tirk dibêjin em Toranîne bi koka xwe da Îranî ne û Turk bi xwe Muxûlin. Mej: me ji. Pehlewîne: xelkê Palo zazane û ber mayiyê pehlewîyan ji başûrê deşta Rûsî beriya zanê «4» hezar sal daketine bakurê Îranê û pişt ra ji bakurê Îranê hatine bajarê Palo û kirine paçytext û parêz ga xwe.

(2) Cemşîd: ji du pirsan htiye hev «1» Cem an ku cam û «2» Şîd an ku şewq û tav navê yekî ji mîrekên Palo ye. Bol dûq: ew ji wek Cemşîd navê. Yazûq: gune. Ber: feyde. Dîl: bin dest.

(3) Jev: ji hev. Tar: bila. Raman: tevdîr. (4) Esîr: girtî.

Sêx û mîrê we yek car	birin kuştin ne yaran
Hûn hiştin bê heq û par	bê wijdan û xidaran.
Kanî şêxê huner mend	şêx Se'îdê dîlovan? ⁽¹⁾
Ka şêx Şerîfê tek zend	ka şêx Huseynê sekman?
Kanî şêxê Tepecûg	ka babayê di Soxnag?
Kanî xort û keç û bûk	hemî mane dibin xak?
Tirkê ne yar û qeşmer	nayî bîra we carek ⁽²⁾
Zora Kemal û ejder	ne danî ser we darek
Eîlî barût digotin:	ser xweş û dîn û meste ⁽³⁾
Dil û cergê me sotin	zincîra can li destê.
Eîlî Heyder xidare	şandî welatê Kurdan
Wekî tûpişk û mare	hirç û beraz û qirdan
Bi rastî yû bi zanîn	li me ev da bihîstin ⁽⁴⁾
Gelek mêr jê deranîn	birin çolê di kuştin.
Serê xwe wan qusandin	simbêl henne kirin tev
Dijmîn bi pê tewandin	ne dîn bo xwe bez û rev
Ji bo xwe çê dibînin	bin destê her mudamî ⁽⁵⁾
Şêrîn û xweş dixwînin	koletî yû xulamî.
Gelek şêrîne bo we	mitirbiya efendî
Berê zêrîne bo we	gelacî yû dibendî
Kurê komir li ser te	ser dest û pa ye dare ⁽⁶⁾
Kurê Oxîz li ber we	dem best û pir xidare.

(5) Dîlovan: dil nerm. tebcûg: navê gundek dikevi roavayê Palo. Soxnag: gundeke di başûrê gundê me da ye.

(1) Kemal: Eta Turk. Ejder: marê mezin. Nedan: darê xwe ser we ne helanî. Heyder: yek ji padişahên Turka ye. Barût: ji denizê koman darekî turkaye piştî cenga Şêx Se'îd hat şandin nav Kurdan. Qirdan: mêmûnan.

(2) Ev: dabaşa Elî Barûd û Elî Heyder.

(3) Çê: qenc û baş. Mudamî: timî. Mitirbî: gewendî. Ber: fîkî.

(4) Komir: navê bavê Turka ye. Oxîz: Oxîz xan. Dem: çax. Best: girêdan.

(5) Va: şiyar be. Ben: weris. Dijûn: siqêf. Dem: gav. Gernas: pehlewana. Pas: rê buwar ji parastin hatiye.

Pirsê ne têne wijdan	bo digêre her tim
Karê ne tê te meydan	bo we didêre her tim
Va ben kirî serê we	dibe ser êm û ser av ⁽¹⁾
Ser jêk û ber berê we	dijûn dike we her gav.
Her dibîne kar ker	bo xwe te Kurdê gernas
Her tim dibe li ber der	bo karê jin te bê pas
Dide ber dar û qamçî	jar û pepûk û naşî
Dihêle bê cih û çî	ê ku dîmane paşî.
Digel berê emîrî	bi we fikir kubarî ⁽²⁾
Belengazî, esîrî	bi we fikir temarî
Serê neyar û dijmin	kirin li bin pî yû dar
Benê xidar û bê bin	kirin milê segê har.
Bi navê dîn û dewlet	sitêra we xuya bû ⁽³⁾
Bi wijdan û bi rûmet	serê we ber hewa bû
Ji bo we her divêtin	roja berê xuya kin
Koh û kelat û hêtin	derdê me zû dewakin.
Dewra şiyarî hatî	hûr û gir tevda rabin ⁽³⁾
Derînin xelkê xatî	doza dilê xwe şa bin.

* * * *

(1) Qamçî: tajiyan. Pepûk: xemgîn. Naşî: nezan. Kubarî: payedarî. Esîrî: bin destî. Tewarî: veşartin û windabûn. Ben: hefsar. Seg: kûçik.

(2) Rûmet: şeref. Koh: çiya. Hêt: diwar. Dewa: derman.

(3) Xatî: Enadol.

CÊ BAX ÇÛR

Cê bax çûra birîndar Li doza xwe bibe kar Cihê te bax û ave Bi mîna şewq û tave Ev cî ne ê Tirka ye Cih û warê Kurda ye Buhîştê min dizanî Tu cahê pehlewani Bo çi niha ne xweşî kul û derdan dinoşî Birîna te xidare Bi êş û pir zirare	tu halê xwe bipirse⁽⁴⁾ ji dijminan ne tirse ji pirsar te xuya ye li ser lat û çiya ye. heya ku ser bilîzin çilo niha bê çîzin? ji partiyan tu mayî⁽⁵⁾ ji pehlo her xuya yî melûl û dil birînî? hejar û xemcivînî derman ji te dixwaze⁽⁶⁾ ser dan ji te dixwaze
Berê mirin divê tu Raçêt û teskere zu Şerab û xeste xane Duktorê jîr û zane	tevdîra wê bibînî divê jêra derînî tu jêra kar û barkî divê jêra diyar kî

(4) Cêbax çûr: ji 3 pirsan hatiye hev 1, Cê: cih. 2, Bax: bexçe. 3, Çûr: av.

(5) Mîn: wek. Şewq: ronî. Çîz: tişt.

(6) Buhîşt: cenet. Partî: pehlewî û aşkanî. Dinoşî: vedixwî.

Ne hêlî bê xudanî bê tevger û diyarî⁽¹⁾
 Di lat û burc û xanî berî didî şiyarî
 Çiko pêkê mirin va defter li dest dixwîne
 Heya tu bêjî na na dewra ew dibîne

* * *

Derman ji bo te zanîn azadî yû xebatê⁽²⁾
 Xwê bûn û kamîranîm ser bestî yû civate
 xwendegah û debîstan zanistî, dezge darî
 Çê ke pêwend û lîstan felat û restegarî
 Zarê derî bixwîne destê xwe bavê xame⁽³⁾
 Melhem tê da bibîne pirtok û tîp û name
 Darî xebat û yektî zanebûn û beranî
 Tebat û deste rastî evîn û merzebanî.
 Bi dil pakî xuya be dakev meydan û qadê⁽⁴⁾
 Li ser lat û çiya be derîne bend û madê
 Bi xwaze niştîmanê ava ke gund û şara
 Sera û berlemanê vejîn dar û bijara.

* * *

(1) Raçêt: pilêta ne xweşî. Xeste: ne xweş. Jîr: Jîhatî û bîr ber. Diyarkî: xuyakî.

(2) Burc: asê geh û koşk. Pêk: qasîd.

(3) Azadî: ser bestî. Xwêbûn: xweserî ya komela Xwêbûn. Kamêran: daxwaz û qenci û xweşî ya Kamêran Bedir Xan. Gah: cih. Dibistan: cihê torevanî. Zanistî: zanyarî yan komela zanistî. Dezge: sen't ji dest ge hatiye. Pêwend: girêk. Resegarî: xelas.

(4) Zar: zîman. Derî: ê gund û êlan. Xame: qelem. Pirtok: kitêb. Tîp: herf. Name: reş belek. Darî: derman. Tebat: hedan. Restîrizgarî. Evîn: hes kirin.

(5) Pakî: paqijî. Niştîman: welat. Şar: bajar. Berleman: Civata bijaran.

Çemê Murad û bigol	şeraba jîn û xweşî ⁽¹⁾
Di cama qencî yû hol	tu ser bestî bi noşî
Dektor sipah û leşker	kurd û xortê welate ⁽²⁾
Qelem teraş û ser wer	şêrê çiya û late.
Gernasê roja cengê	top û tîfing hilînin
Bala bikin qeşengê	dijmin ji cî derînin
Ne xweş xane dizanim	çiya û mêrg û kanî ⁽³⁾
Gul û bîstan û çanim	kewran, girê beranî.
Dewr girti ye ji daran	tevda gul û reyhanin
Ji berqef û zinaran	renga renga xuyanin
Ne xweş û dîn û haran	dibin baxê jîyanê ⁽⁴⁾
Bi tîp û pêv û zaran	dikin rav û beyanê.
Pitrol û kar û baxin	çem û der û newalin
giya û mêrg û şaxin	kortal û şîp û çalin
Şûşar û kohê menpal	horîkan û hagistan ⁽⁵⁾
Çol û kelat û kendal	dehl û rez û gulistan.
Digel vê bê xebatî	xuya nabî tu carê
Li ber ar û şewatî	xwe dibînî kinarê
Kurên te tev qelandin	koledar û sitem kar ⁽⁶⁾
Birin çolê pijandin	kirin bin dest û ber dar.
Bese xew da ne mîne	Wekî Berzan xuya be
Tola xwe zû hilîne	rengê lat û çiya be

(1) Jin: saxî. Cam: fincan. Hol: baş. Bi noşî: vexwî.

(2) Sipah: parêz ker. Qelem: xame. Teraş: nivîsandin an ku nivîskar û xwendewar. Ser wer: serok. Gernas: pehlewana. Bala: bilind. Qeşeng: qenci.

(3) Çan: navê bajarekî ye. Kerwan: navê cihekî ye dikevi Bîngolê ji av û daran dewr girti ye. Girê baranê: bi «4600» endazî bilinde û dikevi ro avayê Bîngolê. Ber qef: ber mîna.

(4) Har: ser xweş. Jîyan: xweşî. Rav: beyan kirin. Şax: çiya.

(5) Şûşar: newaleke bi «13» Km dirêje û dikeve Bîngolê. Koh: çiya. Menpal: zincîra çiyayên Bîngolê. Horîkan: bi «3150» M bilinde. Hagistan: bi «2250» M bilinde herdu dikevin Bîngolê.

(6) Sitem: zor û kotek. Pijandin: biraştin. Tol: heyf. lat: teht.

EZİR GAN

Ezir	gana	delaî	ji navê	te me	zanî ⁽¹⁾
Cihê	Kurdê	şepaî	huner	mend û	beranî
Cihê agir perestan			vejîndar û dilêran ⁽²⁾		
Berde ser xweş û mestan			bê war û kolê gêran.		
Xuya	ye canê	Arî	ji lew	bûyî	ezrigan
Çilo	dimayî	tarî	hevalê	xok û	vergan
Di	sînorê	Sîwasî	Erzirûm	û	hozatî ⁽³⁾
Gelek	şêrîn	û başî	cihê	kar û	xebatî.
Pitrol	û zêr	û komir	ji nava	te xuya	ne
Ziv	û polad	û paxir	dibînim	ronî	dane

* * *

Her	tîm	ayîne	destim	mêze	dikim	zinarê ⁽⁴⁾
Tu	wek	Daryoş	û Rîstem	şîr	dane	bê jimarê.
Mîna	tos	û	diyako	mezin	kirin	di nav xwe
Kurê	Tor	û	Hilako	berê	birin	ji nav xwe

(1) Ezir gan: dikevi ro avayê Erzirûmê tê da kanîye hesin û komira kevirî, paxir û xwê heye. Ji navê te: an ku Ezir gan ji du pirsan hev bende 1, Ezir: agir. 2, Gan: can xuya dibe ku agir li cem wan bi qedir bû ya Ezir gan navê parêzga bû pişt ra bû ye navê bajar. Şepal: qenc û bijar. Perest: parêz.

(2) Vejîndar: xudan maf û jiyan û sax ker. Dilêr: mêr û gernas. Mest: ser xweş. Xok: beraz. Verg: gur. (3) Hozat: parêz gaha Dersîm. Ayine: nênik.

(4) Daryoş: navê çend padişahên kevnarene. Rîstim: kurê Zal. Tos: navê padişakî Mîdiya ye birayê Kê Xusro kurê Siyawis. Diyako: yek ji çêkerên Mîdiya ye. Tor: toranî. Berê: ji beriya niha.

(5) Nûzer: kurê Menû çehr. Kawus: Kê Kawus kurê Kê Qubad. Muzdek: pêxemberê Kurdî kevnare. Manî: navê bavê Kurde. Zendan: cihê girtina

Te wek Nû zer û Kawûs dane dijmin belaşî⁽¹⁾
 Xudî wijdan û namûs dan ber pî yû kelaşî.
 Te wek Muzdek û Manî kirin kolê ne yaran
 Wek Zerdestê xuyanî kirin زندanê haran
 Te tetrîka ne yaran çima ser xwe qebûl kir?⁽²⁾
 Te zarê kal û bavan li ser xwe tal û kul kir.
 Çi zarê xweş û şêrîn buhîştî pey kubarin!⁽³⁾
 Çi pirsê rind û durrçîn dizanim pey bijarin
 Ji Ariyan di ma ye bi destûr û bi rêzman
 Li ser lat û çiya ye di gund û êl û xêman.
 Di bînim ku bila ye di nav komê Ariyan⁽⁴⁾
 Di Orûpa xuya ye ji bin gehê mayinan

* * *

Te zora dijminê har li ser lawê xwe dani
 Reqsa ne yarê bid kar kêfa dijmin te anî
 Te kincê bê dimarî kişandî ser serê xwe⁽⁵⁾
 Te sistî yû temarî civandî hemberê xwe.
 Tu dîlî yû xulamî şêrîn û xweş dibînî
 Tu ser hejîn û camî berê reş tê dibînî
 Tu dînê rind û nazik dispêrê fen ker û dîn⁽⁶⁾
 Tu gund û hîn û şaşik dispêrî hogirê kîn

(1) Qebûl kir: hil bijartî. Zar: ziman. Kubarin: paye darin. Bijarin: neqandine.

(2) destûr: qanûn. Rêzman: awayên ziman. Xêman: kon.

(3) Bin geh: kok. Har: ser xweş. Reqs: govend. Bid: pis.

(4) Dimarî: kokî û namûsî. Dîlî: bin destî. Xulamî: koletî. Ber: kevir.

(5) Hîn: zanîn û zanistî. Perwer: parêz ker. Qaş: birû ya qaşa hingulîskê.

(6) Bizirg: mezin. Çogan: kaşo.

Qe nabe rê berê te mitribê xwestekê şaş
 Bira û perwerê te kulingê çarik û qaş
 Carek ji bo kurê xwe ne dî rencî, ziranî⁽¹⁾
 Ji nav û hindirê xwe dike qêrîn û zarîn.
 Tu qedr û pesnê Turkan bîtir ji dîn û olê
 Dibînî tu bizirgan li ber çogan û holê
 Ev pîsî yû qirêjî ta kê hebî li ber te
 Ev dar û dest dirêjî bo çi ra nabî ser te?
 Ew êş û tol sitandin ku bûm li ser te danî⁽²⁾
 Ew talan û mirandin wihdabûn û keranî
 Te rengê kal û bavan dida rengê biyanî
 Xîp û girtok û davan hejarî yû xizanî.
 Dixwazî pey nizanî gel û welat bihêrî⁽³⁾
 Heval bendê dizanî ji bona xwe newêrî
 Çikim nayê bîra te dengê gernas û meran
 Ew seyî py nêçîra te rêza bavan û şêran
 Dengê êla Qurêşan di meydanê xuya bûn⁽⁴⁾
 Ketin hevraz û kêşan ber bi banî bala bûn.
 Pêşxe bi can û malan ser dijmin û ne yaran
 Erîlan û Çemalan zîlan û mist û alan.
 Bîne bîra xwe carek ew kuştin û xirabî⁽⁵⁾
 Ra hêje gurz û darek hilîne ser xwe tabî

(1) Tol: heyf. Bûm: Turk. Biyanî: ejnebî û dijmin. Xîp: kelem. Hejarî: belengazî û perîşanî. Xizanî: feqîrî.

(2) Gel: millet. Newêrek: tirsonek. Gernas: pehlewani. Êl: qebîle.

(3) Qurêşan: êlek ji Kurdê zazin dikevin hêla Ezir ganê. Hevraz: cihê bilind.

Kêş: kaş. Bala: bilind. Erîlan: her çar êlên din dikevin Ezir ganê.

(4) Xirabî: wêranî û xopanî. Tabî: kozik. Buhîst: cenet.

Mêze bike cihanê mîna baxê buhişte
 Di vê dewr û zemanê qencî tê da dihişte
 Bo te wêrane xweşî aşî ne maye carek⁽⁵⁾
 Xem û derdan dinoşî nîne gazî, hewarek
 Destê xwe bavê Dersîm şêrîn û gurd û Berzan
 Hengê lat û ber û hîm bi dêre tirs û lerzan.

* * *

(5) Wêran: xopan. Aşî: silamet. Dinoşî: vedixwî. Gurd: hele gurd. Şêrîn:
 zincîra çiyayên Berzan. Hîm: lat û teht. Ber: kevir.

XAR PÛT

Xar pûta sor û rengîn dema ser bestî hatî
 Çawa bin darê bengîn bê xweşî yû felatî?
 Bê tevdir û jiyani kêf û xelat û mizgîn
 Tenê li ber piyani jar û pepûk û xemgîn.
 Erê tu roj û pûtî şêrîn û xweş û rindî
 Çima bin destê hûtî xulamê mar û kundî?
 We ya tu roj û arî cihê Kurdê dilêr⁽¹⁾
 Çilo îro ne karî bin payê kole gêrî?
 Ji kevnare xuya ye cihê Kurdak û Manî
 Bo çi niha te da ye sitem kar û biyani?
 Goştê canê te dimêt darê zorê ne danî⁽²⁾
 Hiştî ber agir û pêt derd û êş û ziyani.
 Îslam mezlûm binêre çi tofan û çi are?
 Laşê Kurdan di hêre şêran istû li dare
 Bîne bîra xwe sê pî ku danî faşî yê kor⁽³⁾
 Anîn temaşe bi cî bi dar û kotek û zor.

(1) Xar pût: ji du pirsan hatiye girêdan, Xar: roj, Pût: senem an ku xuya dibe ku xelkê wî cî berê ji roj hes dîkirin lê hin dibêjin Xar pût di vir de pêt ji pêtiyên agir re tê gotin. Bengîn: ser xweş. Felat: xelat û rizgarî. Jiyani: xweşî. Jar: ne xweş. Pepûk: békêf. Hût: efrît û dêw. Mar: zîyan ker. Kund: wêran ker.

(2) Dilêr: mêr û gernas. Kole gêr: zor ker. Sitem: zor. Biyani: ejnebî.

(3) Îslam mezlûm: navê meydanekê ye tê da Kurd avêtin sê darê.

(4) Faşî: zor ker.

(5) Maf: heq. Tol: heyf. Lê: lakin. Kole dar: cî sitîn û zor ker.

Pêva kirin çil û heşt
Kirin bê can û bê dest

Bi mafê me dir bûn
Di meydanê xuya bûn

Lê agirê ne yara
Tevdîra kole dara

Kurdên wek Ristimê Zal
şêrên bi gurz û mortal

bi ceng û destê pola⁽¹⁾
distînin heyf û tola.

gur bû kefî zinara
ew dihiştin li para

* * *

Qere kazim bê dîne
Osman paşa bi kîne

Her yek li deste raçêt
Li ser laşa denabêt

Bê insaf û bê wijdan
Bê destûr û bê îman

Zaro birin îfadê
Dixwînin bend û madê

Bi pîlan û bi kêdê
Kirin girtok û qêdê

Digo: hûn kîne uxlîm
Turk sîpelerniz buldim

ser xweş û dîn û meste⁽²⁾
dara xacî li deste

da çavê xwe bibînin⁽³⁾
ne xweş û dil birînin.

tev dane hev bi zorê
hemû anîne dorê

bê qanûn û bê destûr⁽⁴⁾
dûr û dirêj, hûr û kûr.

dane hevdu girs û hûr
bi dar û kotek û şûr

kurê Kurdin bi rastî⁽⁵⁾
xper ata miz ler qaştî.

Dimane gund û malê
Di mînin kort û çalê

we em anîne ev der
bi destê dîn û ejder

(1) Qere Kazim û Osman Paşa: navê du padişehên Turkane bi kuştin û lêdanê hatine nav Kurdan. Mest: ser xweş. Dara xacî: sê dar û sêpi re tê gotin.

(2) Raçêt: kaxêfa destûrê. Denabêt: teqok.

(3) Pîlan: siyaseta. Kêd: xap.

(4) Uxlîm: kurim. Sîpe: zarok. Niz: hûn. Buldîn: hebûn (an ku hûn kurên Turkane). xêr: na. Ata: bav. Miz: me yanî bavê me. Ler: nişana komê ye. Qaşî: reviyane. Ejder: marê mezin.

(5) Hus: hiş. Edeb siz: bê edeb. Sîpe: zarok. Baq: binêre. Benî: ez. Sen: te. Ûldirim: dikeujin. Hanî: kanî. Gutur niz: bînin. zope: dar. ben: ez. Bû: ev. Çucuq: zarok. Ler: nişana komê ye. Vurim: lêxim. Nejad: kok. xerî: ker.

Hus edeb siz ler sîpe baq benî sen ûldirim⁽¹⁾
 Hanî gutur niz zope ben bû çücûq ler vûrim.
 Kuran mîna egîtan nejadê xwe ne avêt
 Turkan wekî xerîtanî xistin depo dane bêt
 Xortên ku tev depoda bi agir tev pijandin⁽²⁾
 Ên ku di av û roda ew bi avê mirandin.
 Agir berdane Kurdan bûne arî bi carek
 Li ser wan sîngo dewran nîne dad û hewarek
 Laşê wan bûne parî ji dû siya ser û çav⁽³⁾
 Ji wan na ête zarî ne pêv û gotin û lav.
 Qe nîşanek ji wana kes ne nasî di ew gav
 Winda kirin ne zana kirin kelaşê ber tav
 Xelkê bajar ser û ber derî li ber xwe girtin
 Wajî bi me kirin şer li taqa fort û zirtin.
 Li ser ban û şibakan agir berda bû Kurdan⁽⁴⁾
 Keç û kur û birakan rengê zihak û qirdan
 Di nav sûk û bajarê bû ye tofan û tarî
 Ji wê derê didan rê bê tevger û şiyarî.

* * *

Bi hîstim ku jinek çû ku lawê xwe bi bînî⁽⁵⁾
 Bi kêfan ber felek çû ku tola xwe hilînî
 Ketî nav laşê Kurdan lawê xwe wê ne dîtî
 Agir li ser da berdan reş bû ye ew ji pêtî.

depo: cihê çekan.

(6) pijandin: şewitandin. ro: çem.

(1) Siya: reş. Lav: ber ger û gotin. Qe: qet. Taq: pencere. Fort: xwe pesindan.

(2) Zihak: marê mezin û dijminê ziyan ker. Qird: mêmûn û Turk.

(3) Çû: ji Cê bax çûr. Felek: çax û dewran. To: heyf.

(4) Leş ker: esker an ku şikistin. Lew: lewre. Xizanî: hejarî, belengazî.

(5) Siya: reş. Poş: xwe kirî. Qawuş: pas geh û parêz geh. Dîlêr: gernas.

Ew ne tenê wiha bû	çend hezarên dî wek wî ⁽¹⁾
Li wir leşker bila bû	gihiştî Palo dawî
Tu tevdîrek ne danî	Ji lew Turkan sitandin
Ji birçînî, xizanî	ji meydanê bezandin.
Divê bîra xwe bînin	em vê derdê siya poş ⁽²⁾
Dijmin ji cî derînin	bikin axor û qawûş
Rengê dilêr û merdan	zar û ziman bi xwînin
Tola şehîd û nemran	bi destê xwe hilînin.
Çê kin bo xwe hevalan	dektor û jîr û zana
Tola bavan û kalan	bistînin em ji wana
Bi zorê yan bi aşî	bêne meydan û qadê ⁽³⁾
Xudî ulan û qaştî	ne hêlin erdê yadê.
Navê xwe têxin lîstê	ger çi tev da ne mînin
Herin baxê buhîştê	xudî wijdan û dînin
Eve yara dilê me	ger em hebin di mîni ⁽⁴⁾
Li ser şax û gulê me	kew û bilbil dixwîni.

* * * *

(1) Jîr: jîhati û bire wer. Aştî: hêsanî û silamet. Ulan: pîrsekî turkî ye bi daxwaza kuro. Qaşî: bi daxwaza reviya ye. Yadê: dê. Buhîşt: cenet. Melatî: di ro ava û başûrê Xar pût da ye kaniya komira kevîrî û hasin tê da ye bajarekî bi dar û ber û avan navdare.

(2) Cerg: gurçik. Ji partiyan: xelkê dewra Melatî ji nav pehlewîyan hatine vî cihî.

MELETÎ

Melatî ez dizanim c i h ê k u r d ê

Xwe naske cerg û canim ji tarîxâ dizanî

Ji partiyan tu hatî ava kirî cihê xwe⁽¹⁾
Niha tu bê felatî winda kirî mihê xwe.

Di pêra hetine wir kom û gelê Metîna
Ji Kurdistana bakur berdana komir çîna

Li tarîxê binêre nişanê wan xuyane⁽²⁾
Bi rindî guh bidêre ku ew xelkê çiyane.

Sed û pêncî ji salan berê bûnê çend hezar
Li ser erdê te halan kirin Kurdê vejîndar

Tu atma rake ser pî da wek betal û mistew⁽³⁾
Kurê Cewdet bike cî Xilûsî bîne zew zew

Ji aqçe dax û yame vejîne mêrê Kurdan
Şiyar ke bîne ba me egîd û şêr û merdan

Bixwîn tarîx û name cihê xwe jê derîne
Ji Adem xîza da xame nejadê te dibîne.

(3) Felat: xelas. Metîna: lewra tarîx dibêje nişanê wan di Melatî û Palo da ne «150» î salan di van hêlan de ferman darî kirine. Komir: Turk. Mih: bi daxwaza mezin dirbaz bû ye.

(4) Bûn: bûna Mesih. Atma: navê êlekî bi mêrani nav û denge.

(5) Betal û Mistew: navê du gernasên Melatîne. Aqçe dax û Yama: navê du çiyane.

Gelek dewrê cihanî li ser te çûne ava⁽¹⁾
 Zar diz û biyanî tu xistî tor û dava
 Digel va xîpê diwar koh û newal û her tîşt
 Bi Kurdî nave bê çar cih û warê ew hîşt.
 Çek û xanî yû sincî bi kurdî ew xuyane⁽²⁾
 Erê sêv û turincî di nav te bê bihane
 Ku ser destî li te kir ne yar û hem Mexûlan
 Zarê te lal û ker kir Turkê bê dîn û wijdan.
 Zarê ku Zend avista pey hayiye nûsandin⁽³⁾
 Zarê Zer deşt û hosta jê hati ye nqandin
 Zarê xudê daye te ew zarê xweş û şêrîn
 Çilo di bûyi xeste herro ji ber wî qêrîn.
 Va ye dijmin hilanî bi kotek û bi zorê⁽⁴⁾
 Zarê xwe dewsê danî ber xwe daye torê
 Navê gundê te yek car guhertin ey Melatî
 tu xistî bin çek û dar bê jin û bê felatî.
 Bi destê ser gilokan dixwazin te hilînin⁽⁵⁾
 Bi xî ber darê golan ji meydana derînin
 Çawa mîna bûnî⁽⁵⁾ hemî bax û gul û dar?
 Ji bo dîna nivîştî tu xweşiya birîndar.
 Erê lawê te mîre ji nav pehlo xuya ye
 Pîling û Kurdî û şêre ji partiyan di ma ye

(1) Xîz: xet. Xame: qelem. Nejad: kok. Zar: ziman. Biyanî: ejnebî. Tor: masî gêr. Koh: çiya.

(2) Sincî: exlaq. Zend avista: kitêba Zara bi daxwaza jina şandî. Turincî: ji narinc hatiye ku purteqale. Mexûlan: Turkan. Ker kir: hûr kir.

(3) Zend avista: kitêba zeradête. Nusandin: nivisandin.

(4) Jin: xweşî. Felat: xelas.

(5) Mîn: wek. Bûnîşt: cenet. (1) Pehlo: aşkanî û parti.

Dibînim	bê	civate	ne xweş û bê ked û kar ⁽¹⁾
Bê	tevger	û xebate	di di gund û êl û bajar
Zarê	ji	Arî	haî da ye zarê zebanî
Rengê	rojê	helatî	na bînî ser miyanî
Zarê	ku	xelkê	cenet pey paye dar û ser kar ⁽²⁾
Naka	dibû	ye qet qet	tu pey dibî birîndar.
Wek	te	jev tar û mare	bê xwendin û dibîstan
Bê	gazî	yû heware	ber agir û ber destan
Çilo	komir	dibêjî:	cihê minî Melatî? ⁽³⁾
Gelo	ne	dîn û gêjî	ne hala vî welatî?
Va	ye	dezga	Metînan dide zanîn ku ew der
Cihê	Kurd	û xudînan	li dewrê pişt û kember
Navê	Kurd	û Kurdistan	tê da pirin bi xweşî ⁽⁴⁾
Ger	çi	kurê turkistan	tê da bade di noşî.

* * * *

Ked: kesp. Zar: ziman. Zebanî: Turk.

(2) Naka: niha. Qet qet: parçe parçe. Jev: ji hev. Tar û mar: bila wila. Debistan: hîn geh.

(3) Komir: Turk. Dezga: sene't ku nîşanê Metînane di Melatî de. Xudînan: Kurdên ku xudî yê cihin.

(4) Bade: mê û eraq. Dinoşî: vedixwî.

DERSÎM

Derê zîvî ji bo min kelat û koh û xarî
 Herro hîvî ji bo min felat û restegarî
 Alîkî nerdewanî rexî dî kort û çalî⁽⁵⁾
 Xuyayî ber bi banî tev hêrik û newalî.
 Ji dewra pêşyan tu bi nav û deng xuyayî
 Kanî niha mayî ku çilo tu bê bihayî?
 Bese bo te temarî ne mîne jar û bin dest
 Bi xwaze restegarî bi be zana û ser best.
 Dizanim ku eger tu xuyabî wek Diyako⁽¹⁾
 Dîkî dîl û Geber ru kurê Tor û Hilako
 Kurê cengîz û temûr ta bigêjî Kemalî
 Ji warê xwe bike dûr hilîne pîsî, talî.
 Gelo nabînî derban ji komie hatie der⁽²⁾
 Zîyan û êş û kerban divaya kund û nû ker
 Dez û eywan û xanî ji lawan kirne vala
 Der û bîstan û kanî ketin destê decala.

(5) Derîyê: an ku pîrsa Dersîm zaravê Zazî de bi daxwaza derîyê zîvî ye. Koh: çiya. Xar: şikeft û mixare. Rese garî: xelas û felat.

(1) Temarî: xewa bê hişî. Jar: nexweş zeîf û perîşan. Restegarî: xelas û rizgarî. Ser best: aza. Diyako: yek ji ser û ber kerê dewleta Mêdiya bû. Dîl: bin dest. Gerber: winda kirin û mirandin. Tor: Turk dibêjin em Torîne. Hilako: niviyê Cingîz Xane.

(2) Komir: navê bavê Turkane. Zîyan: zerar. Kerb: kovan. Der: dever û newal.

Çemê Menzûr bi xwîne
Sore di nav me dîne

Heya kirin wekî pir
Bi dîn û ol û axir

tijî xort û tijî nas⁽¹⁾
egîd û mêr û gernas

li ser dirbaz dibûne
goştê laşim dicûne.

* * *

Keçê delal û rû geş
Laşê xuya perî weş

Zikê wan tev qelaştin
Di nav agir biraştin

Pakîze û jinê baş
Ber destê bûm û ewbaş

Tev birane ji bo hev
Xulam û dîl û ber dev

xwe tavêtin çemê av⁽²⁾
xira bûne li ber tav

zaro girtin di kuştin
li ber hewa dixistin.

mane bî yû belengaz⁽³⁾
Kurmanc û Ermen û Zaz

ne ku ji hev cudane
ji lewra bê bihane.

* * *

Berê bi te welatin
Bê tevger û civatim

Te dest ji ber xwe berdan
Te ser xwe danî lêdan

Te pişt daye ne yaran
Li ser te berf û baran

ve bû çima dimînî?
di rêza ser hejînî

bû yî nexweş û sêwî⁽⁴⁾
jar û pepûk û rêwî.

berê xwe da ye agir
dî jor û jêr û bakur

(2)Der: dever. Kêndal: newal û kortal. Derbend: deriyê teng û kûr. Xar: mixare û şikeft.

(3) Nas: mirûv. Egîd: gernas. Axir: roja dawî. Cûn: ji cûtin hatiye.

(4) Perî weş: wek perî.

(5) Pakîze: paqij. Bî: bê mêr. Bûm: kund. Ewabaş: pis û nezan.

Li ber firok û bazok	gerok û teng û topan ⁽¹⁾
Bi sewlegan û kaşok	şeqam û dar û zopan.
Keç û kur û dilawer	bira û ap û pismam
ZBûne arî sera ser	digel bapîr û dotmam
Ji te pir dane kuştin	huner baz û tekane ⁽²⁾
Di nav warê te hiştin	tabî, kozik ve dane.
Rîza Xan ka li kûye	di gorê da dinale
Dibê kurim diçû ye	bi dijamin ra hevale
Osman çav ber hewa ye	Nûrî gelek hezîne ⁽³⁾
Xort û keşan newa ye	di tîrbê dîn û tîne.
Fewzî hêsir dirêje	Remzî dikî hewarê
Xeyrî kulan dibîje	ji ber derd û zîrarê
Zaro wekî pilingan	çûne sê pî wekî şêr ⁽⁴⁾
Va narîn û çelengan	dest bazin û sitû zêr.
Li ber qehra ne yara	tevda xwe dane kuştin
Di nav lat û zinaran	ev mîranî di hiştin
Da ku bînin bîra xwe	derd û êşa ne yara
Zû çê kin tevdîra xwe	di koh û burc û xara.
Dewra nîzam û xame	pêş xistine hemî kes ⁽⁵⁾
Tîp û qelem herame	ji bo te mayî bê kes
Divê tu cî bibînî	bi ser bestî bi jîrî
Xerzik têda diçînî	hişînî kole gîrî.

(1) Bêrê: beriya niha welatê minve dibû çima niha deng ji te nayî. Pepûk: xemgîn. Rêwî: ê ku diçe namîne.

(2) Firok: balafir. Gerok: meşoke û tirumpêlê. Teng: debabe. Sewlegan: sewlecan û kaşok. Zope: darê lêdanê. Dilawer: pehlewani. Sera ser: tev û hemî. Bapîr: kalik. dotmam: qîz ap.

(3) Tekane: bê hember. Rîza: Rîza xan serekê êla Koçan. Osman: yek ji gernasê Dersîme.

(4) Newaye: qêr û girîne. Tîrb: gor.

(5) Sê pî: dara xeniqandinê. Narîn: sipehî. Çeleng: sivik û jîhatî û mîr.

Ne yarê bê cih û war bi xap û fen dihat⁽¹⁾
Di gund û êl û bajar bi nav û dengê xatî.

* * * *

(1) Koh: çiya. Burc: asê geh. Xar: mixare û şikeft. Nizam: destûr. Xame: qelem. Tîp: herf. Xerzik: şitil. Kole giri: zor keri.

(2) Xatî: Anadolî. Tûcîk: Tûjik çiyakî bi «2500» endazan bilinde û dikevi ro helatê Dersîm. Ber: kevir û fîkî. Yaqût: lale. Der: dever û newal.

ÇIYAYÊN DERSÎM

Tûcîk ger çî dirêje tijî dar û tijî ber
Dur û yaqût di rêje kelat û kozik û der
Bi Uksufêr himbêze tijî der bend û pale⁽³⁾
Bi tirs û hirs û hêze bax û bistan û çale.
Va ye ne ma dihêle nav da bikî ceng û şer
Ger çî şikeft û rêle dijmin leşker birî ser
Bilgîş çekê ne yara li xwe kirî dinêre⁽⁴⁾
Cihê jîn û hewara lat û çiv û şikêre.
Xidir her tim bi pûke dijwar û teng û tarî
Naçî ser kes bi zûke berf tim li ser dibarî
Ji dûrî va dibînin rengê Xidir xuya ye⁽⁵⁾
Bi vê pirsê ne dînin rewş û ronî di daye.
Çal û Molpat birane destê xwe na din siya
Ji lewra bê bihane mane destê bê ciya
Maran ger çî bilinde çiyayê sipî xuya ye
Çil çiya delal û rind şêrîn û pir bihaye.

(3) Ukusfurd: wek tûjik bilinde. Hirs: xeyd. Hêz: huner. Rêl: dehl û dar.
Bilgîş: dewr «2000» M bilinde.

(4) Çekê neyaran: bi zarê turkî hatine nav dan. Jîn: xweşî. Çiv: xaçê rê. Şikêr:
kavil. Xidir: bi «3250» M bilinde.

(5) Xidir: Xidir pêxember. Çal: «2107» M bilinde û dikevi jêrî Kemah. Molpat:
bi «3600» M bilinde. Siya: reş.

(1) Maran: zincîra çiyayên ro belatê Dersîmê ne û hemberî li çiyayên Menzûr
dikin bi hindikayî bilindayiya wan bi «2000» M. Zil: bi «2500» endazan
bilinde.

Zilçiya tijî newale tirb û mezar û gore⁽¹⁾
 Gelek xweş û delale tijî kulîk û tore
 Gurgur bilind û berze her mêwe tê xuyane
 Er mistefa bi derze cihê şer û berane.
 Lê bê xebat û tevger çûna li ser evana⁽²⁾
 Ne hêja ye birader li cem edîb û zana
 Baxir bi mêrg û vaşe Qere çakî devîne
 Çewt û bogir bi kaşe Çaxilan tev hêline.
 Mîrcan û Rîza, Tosîk ditirsînin ne yaran⁽³⁾
 Kêsmûr û Çal û Xurlîk di lerzînin diyaran
 Çikim di min li ser wan bi kêf û dîn û hare
 Di ke govend û sêran lewend û pir zirare.
 Bo bê cî û xidaran cihê şer û civatin⁽⁴⁾
 Ji bo tûpişk û maran cihê kar û xebatin
 Navê hina bi arin tîra cîgê derîne
 Bî zaravê ne yarin dilê me ber birîne.
 Divê winda bikin me bi vê doz û tevdirê⁽⁵⁾
 Di ber jêr û di qême di girtin û zincîrê
 Gur û hirç û berazin dilovanî nizanin
 Ji lew em kaze kazin perîşan û xizanin.

Mezar: mezel, ziyaret. Tore: texlît û edeb. Gurgur: bi «3000» M bilinde. Berze: bilinde. Mêwe: ber û fîkî. Er mistefa: navê çiyakî ye.

(2) Edîb: torevan. Baxir: navê çiyakî ye. Vaş: giya. Qere çakî: navê çiyakî ye. Çewt: xwehr.

(3) Mîrcan: bi «3100» endazan bilinde. Rîza: bi «2750» M bilinde û dikevi başûrê Ewacgê. Tosîk: bi «2650» M bilinde. Kêsmûr û Çal û Xurlîk: navê sê çyane. Har: ser xweş.

(4) Navê: an ku bî zarê di jîminane. Derî: zîmanê kurdi.

(5) Qême: banî. Dilovanî: dil nermî.

ÊLÊN DERSIM

Koç gîrê bake Îbo Paşa Mirad u Dîbo Rengê Restem xuya be Wek şêr û ejdeha be Ne mîne dîl û bin dest Bibe zana û ser best Destê xwe bide Kerîman Kulîkan û Zemîkan Îsolan û Masikan Xurşîdan û Sadiqan Hiran û hem Şikakan Nezîkan û Furatan Koçan û Laçinan tev Milan û Findikan tev Zulfan û Keşke horan Bêtan û Barnesoran	hem Heyder û Eîf şan destê xwe bid genîsan dijmin ji ci derîne⁽¹⁾ kêsa xwe zû bibîne perîşan û belengaz huner mend û ser ifraz Kitin û Mistikan hem⁽²⁾ Çekan û Rasikan hem Axoçan û Çarekan Lertîkan û Can began Batan û hem Balikan Şiwalan û Şiwakan zengan û hem Holikan⁽²⁾ Soran û hem Şemîkan Gewran û hem Xurmekan Meqsûdan û Porîkan
--	--

(1) Îbo: gernasê êla koçgîrê bû. Ejdeha: marê mezin. Kêsa: ferzend.

(2) Kerîma: evên ha heya dawî navê çend êlên welatê Dersîmêne.

Şimdînan û Garisan
Bazan û hem Yûsifan

Gotan û Parçikan tev
Haman û Halifan tev

Kodan û hem Kumsoran
Şêxan û hem Aşûran

Tevda sozê didin hev
Bê tirs û bê bez û rev

Ew daweta Demînan
Qebûl ne kin tucaran

Bi Kurdanî xuya bin
Rengê lat û çiya bin

Pîran û hem Heyderan
Mîrzan û hem Şatiran

Kemalan û Keçelan tev
Bamiran û Sendalan

Firhadan û Şadiyan
Surgêç û Girt û Mûran

bi yek dest û dil û can
ser bestî werne meydan

diyariya Heyderan
ji dijmin û ne yaran

Kurdistanê ava kin
dijminan jev bila kin

* * * *

ERZURÛM

Erzurûma	birîndar	tu her daxwaza Rûmî
Cihê Kurdê	sitêambar	niha bin destê bûmî
Ji pirsên	te dibînim	rewş û çirax û mûmî ⁽¹⁾
Gul û mêwe	diçînim	ne war û koza Rûmî
Ji hêlên	te xuya ye	cihê Kurdak û Madî
Te ronî	tê veda ye	bi dîlan û bi şadî
Dar û ber	ûzîv û zêr	bax û bîstan û kanî
Zad û giya,	xeyr û bêr	dewrê dibin xuyanî
Çemê Furat	û Aras	çorûq jê tene ber jêr
Ji warê jî	û gernas	xudan mertai û şimşêr
Kohên	bilind û ava	wek Dumlu dax û Ala ⁽²⁾
Tê da	nêçîr û rava	dîkin di xar û pala
Qop û tazî	bi nêre	bi kurdî nav û dengin
Bi rindî	guh bidêre	ê ku tê da çelengin
Ziyaret	û Qere gul	digel Şetan û Qasim ⁽³⁾
Kew û şalûl	û bilbil	dixwînin ez dinasim

(1) Erzurûm: jî du pirsan hev bende, Aezû: daxwaz, Rûm; ku mîletekî nav û denge an ku erzû rûm pîrsekî kurdî ye ne ku turkiye yan erebî ye û ne cihê rome bê weku daxwaza rûm bûku bistinî. Û tê da kanî ya kar: komir, paxir, xwê û tûtiya, zîy û zêr heye. Sitem: zor. Bûm: Turk.

(2) Ber: mêwe û fîkî. Çorûq: çemê çorûq. Gernas: mîr. Şimşêr: şûr. Koh: çiya.

(3) Dumlû dax: çiyê Dumlû. Ala: ala goz bi «3255» M jî rûyê derya bilind tire dikevi ro avayê Tendûrek. Qop: çiyakî bi «2500» endaziya de ro avayê Erzurûm daye. Tazî: bi «2700» M di bakurê Erzurûm e. Çeleng: mîr xas.

(4) Ziyaret: bi «2700» M di başûrê Erzurûm da ye. Qere gul: bi «3200» M dikevi jêrê Erzurûm. Şetan û Qasim: navê du çiyane.

Çiyayên Pîvaz û kêvûr ji bajarê Terebzûn
 Didin aî, dîkin dûr Türkê bê war û mêmûn
 Çima nayî bîra te şerê mezin hemî der?
 Ew seyd û nêçîra te xort û çeleng û serwer
 Zorê birin ceng û şer bê gazî yû hewarê⁽¹⁾
 Dane kuştin sera ser bê texmîn û jimarê
 Tim û tim bendewarî ser sînora gilîdî
 Bo dijaminan şiyarî huner mend û egîdî
 Ji bona xwe ne karî xwe dibînî biyanî⁽²⁾
 Li ber êşan di arî bê xebat û jiyanî
 Ew te dikî perîşan jêra tim dergevanî
 Bi te her kar û îşan dikî nabî xuyanî
 Hê tu dijamin dibînî seyda û şêx û sofî⁽³⁾
 Ji bona wî emînî her ew ji bo te rovî
 Sed şêx û sed efendî na dî yekê ne yara
 Ji bo xwe pir dibendî rengê hov û dewara
 Çarik didî serê xwe ser jêr dikî tim û tim⁽⁴⁾
 Na nêrî hemberî xwe dengê topan gume gum
 Zarê derî te da ye zarê diz û biyanî
 Ew ne rind û biha ye lewra zarê zebanî
 Bi pey wînda dibî tu digêjî kole dara⁽⁵⁾
 Diçî ber ba dibî tu di mînî ber dewara

(1) Çeleng: mêr xas û sivik û jîr. Ser wer: serok û ser dar. Sera ser: hemî di koka xwe da ji serî. Texmîn: guman. Bende war: ber bend. Egîd: pehlewana.

(2) Ne karî: ne hazirî û ne ber bendî. Di arî: têsê. Jiyan: xweşî. Perîşan: şepirze, belengaz.

(3) Seyda: mamusta. Rovî: fen ker. Efendî: mezin.

(4) Zar: zimman. Derî: ê gund û newalan. Biyanî: ejnebi. Zebanî: dergevanê dojehê.

(5) Kole dar: zor ker. Tîp: herf.

Tîp û qelem û na mînî bi zarê Kurdê Arî
 Xîp û kelem diçînî li her çol û beyarî
 Erebo axa kirin der digel êl û hevalan
 Ridwan axa bera ber hemî tev kirine talan
 Xalid beg bo çi kuştin ji ber ku dîn pereste⁽¹⁾
 Jêra rûmet ne hîştin ê ku nezan û meste
 Serek darê Humeydî genralê leşkerê gel
 Gelo ev rê çilo dî zihak û mar û qertel?
 Ev ne tenê wihane belengaz û perîşan
 Gelek jîr û tekane li ber dar û kul û jan
 Gelê tev dibû bir hevalê kole dare
 Ji bona hev xir û cir li ber dar û zirare
 Ji rêva tu nizanî diçî asê ne yara⁽²⁾
 Li bin dar û biyanî xulamê dîn û hare
 Bi zarê diz dixwînî ji bo xwe bê zimanî
 Pepûk û dil birînî bê war û ser miyanî
 Ji hev sed parî parî dibê diçme buhîştê
 Di koxik û di xarî di razî ser tenîştê
 Neqşî diçin Buxara cenet bo xwe dibînin
 Dikîn qêr û hewara wekî ser xweş û dînin
 Sofîne bê welatin naçin dêr û keNîştê
 Bê dewlet û felatin berî dane nivîştê

(1) Erebo axa: yek ji axayên Erzurûme ew û digel «140» hebî ji êla wî ji cihê wan derxistin û birin Asparta. Ridwan: û di gel «150» hebî ji êla wî dîr kirin birin Asparta. Xalid: begê Cibri û koman darê Humêdî. Perest: parêz û dîn dar û welat parêz. Rûmet: qedir û şeref. Mest: ser xweş. General: ser hêz. Zihak: marê mezin. Qertel: kelaş xur.

(2) Belengaz: hejar û reben. Perîşan: şepirze. Tekane: bê hember.

(3) Biyanî: ejnebî. Xulam: kole. Har: gezo ker û ser xweş. Buhîşt: cenet. Neqşî: neqîşandî.

Pîr û şêxê xwe nadin	welat û dîn û dewlet ⁽¹⁾
Divê gurzê xwe badin	ne ki tu kar û xizmet
Şî'e Eî perestin	li ser mala peyamber
Ne xweş û dîl û mestin	dibin gorî sera ser
Hingî bigir ta niha	reş dipoşin bê serî ⁽²⁾
Mane bê qedr û biha	jevra dîkin ber berî
Bazî bexa dibînin	civata dîn perestî
Îman bi bazê tînin	dîkin xudanê restî
Dîkin gorî hemî tîşt	keç û kur û birader ⁽³⁾
Ji bona xwe dîkin pişt	heval û yar û rêber
Seher werdî xuyane	betal û kund û kovî
Çestî yarê dizane	hevalê hirç û kovî
Rêçik riya diyanet	di rê çûnê dibînin ⁽⁴⁾
Dîkin engaz û alet	bê hiş tê da di mînin
Nûrî ger çi bi olê	di nav me bû xuyanî
Suxte bi darê holê	berî daye ziyânî
Ne te bîrê gel û êl	xebat û nav û nişan ⁽⁵⁾
Li ba dijmin dîkin mêl	xwe dane ber kul û jan
Kêfa diz û ne yara	bi vê kar û tevdirê
Ger çi dimane para	dibin seyd û nêçirê
Ev dewr û çax û tevdir	ev pîlan û siyaset
Ev bend û qeyd û zincîr	ev zanîn û dirayet

(1) Felat: xelas. Nivîst: wek haz bend û ber bejn. Pîr: şêx ji pîl hatiye. Şî'e: ên ku ser kurê Fatma ber berî dîkin. Perest: parêz. Peyamber: pêxember. Dîl: girtî. Mest: ser xweş. Gorî: qurban. Sera ser: hemî.

(2) Dipoşin: li xwe dîkin. Bazî: qadiri. Bexa: Bexdad. Îman: bawerî. Restî: rizgarî.

(3) Betal: bê kar. Kund: wêran ker. Kovî: hov. Çestî: riya çestî. Rovî: xapînok.

(4) Rêçik: mezahîb. Engaz: halet. Nûrî: mela Se'îdê Nûrsî. Ol: dîn. Suxte: şagird. Hol: lîzka bi gokê. Ziyânî: zirarî. (5) Ne tê bîrê: nayê bîrê.

Oî û dîn û bawerî	bend û komel, ber berî ⁽¹⁾
Kole gêrî, ser werî	kevne karê, nû kerî
Tev da bi hev ne xweşin	nadin destê me jîrî
Kul û derdan di poşin	dibin darê esîrî
Kî ev kirî milê me	bê xudan û hevalî ⁽²⁾
Tev rakirî kulê me	da ser me betalî
Ev ne fehêt û şerme	tenê hovê dinê bin?
Rûyê me tar û çerme	ber ar û dar û kê bin
Nêçîra me ne dûre	çilo em rê nabin ser? ⁽³⁾
Deryaê me ne kûre	çima em dur nadin der?
Gazî ji bo me zû tê	divê rabin bi hember
Tazî ji nav me da rê	divê em zû bibin ser
Bextê me bo me yare	kewê me her dixwîne ⁽⁴⁾
Textê me kar û bare	şûrê me cî dibîne
ger em yektî rabin	dijmin dikin tar û mar
Rengê lat û çiya bin	dibin zana û huşyar
Wek kunbeda cihanê	warê me şîn û ava ⁽⁵⁾
Digî hîn û jiyane	rengê çirax û tava
Destê xwe em didin hev	diçin govend û dîlan
Li ser me radibî şev	dek û tevdir û pîlan

(1) Pîlan: xelek bendî. Bend: girtin û girêk. Diyarê: ber ketin û zanîn. Bend: civîn. Komel: civat. Kole gêrî: zor kerî. Nû kerî: dîvik perestî. Jîrî: jihat bûnî. Dipoşin: li xwe dikin. Esîrî: bin destî.

(2) Tar: wek tarê bêjîngê. Kê: dax.

(3) Derya: behr. Durr: gewherên mezin û biha.

(4) Bext: şans. Tar û mar: bila wila.

(5) Kunbed: qube. Cihan: koma cihe. War: welat. Hîn: zanistî û zanîn. Jîyan: xweşî. Çirax: çira. Dek: xap. Pîlan: siyaset.

MÛŞ Û WAN

Mûşim bi nêre Wanê çî agir ser dibarî
 Maye li ber ziyane bi qêrîn û bi zarî
 Li bax û dar û mêwe dinêre dil birîne⁽¹⁾
 Bi zar û tîp û şewe dibînim xem civîne
 Wekî te ser bi jêre bê hogir û hevale
 Ger çî dibê dilêre wek Ristimê di Zale?
 Ji dewra dîn perestan heya noka esîre⁽²⁾
 Di qeyda dîn û mestan belengaz û feqîre
 Bi navê dîn û îman xulam û dergevane
 Di çol û deşt û hîman ji bo dijmin şivane
 Ji nav we dane kuştin welat parêz û serwer⁽³⁾
 Di şûnê hevî hiştin diz û kevnar û nû ker
 Hûn bi navê Kurdanî têne meydan û ravê
 Mad û Mûjik û Manî bi we têne peravê
 Ji warê xweş û şêrîn kirin der jîr û zane⁽³⁾
 Ji mal û êl û hêlîn kur û bav û tekane

(1) Mûş: ji mûk hatiye di ro helatê kenc û başûrê Bedlis da ye û cihê hesin û paxir, komir a kevirî ye û wan koma wî ye. Ziyani: zirarî. Mêwe: fîkî. Tîp: herf. Şewe: zarav û nazikî û delalî. hogir: hevgir. Heval: di ala yêda yekî. Dibê: dibêjî. Dilêr: pehlewî.

(2) Perest: parêz. Esîr: bin dest. Mest: ser xweş. Belengez: hejar û perîşan. Hîm: lat.

(3) Serwer: serok. Nû ker: kerê nû, dûvik.

Gelek axa, gelek mîr
Kîrîn nîşan û nêçîr

Berê wan dane Bordor
Hinek saxî kîrîn gor

Ji Mexûlan xuya bû
Rengê mar û ziha bû

Ji bo te dur dirêjim
Li pey hev ez dibêjim

Yûsîf axa û Ce'fer
Di Bordorê dilawer

Digel Kamil ne xweşin
Kul û derdan di noşin

Ji Nadîr beg bi pirse
Digel Qasîm di tirse

Li cem Hemze dirûnin
Kul û derdan dihûnin

Diçin destê Smaîl
Heval û hogîr û pîl

Here şaşê bi pirse
Lefa wê pîl û girse

Rî yû tîzbî dizanin
Bi hev ra tim xizanin

birin xistin Enadol
serê hinan kîrîn hol

di Asparta kîrîn dîl
ne yarê lawê ber gîl

Turkê bê dîn û îman⁽¹⁾
berê we da ye ferman

doza xwe jê bibîne
jê şîretê hilîne

bi Cindî ra hevalin⁽²⁾
digel Hemdî dinalin

di çola teng û tarî
ketin destê ne yarî

çiye derdê te axa?⁽³⁾
kîrîn ber ar û daxa

bi Necmedîn û Qotas
egîd û mêr û gernas

digel Yasîn û Mîsto
delalîn rengê Xusro

çiye êşa me Kurdan?⁽³⁾
nîzanî jan û derdan

kul û derd û hejarî
di koxa teng û tarî

(1) Bor dor: navê bajarekî Turkî ye li ser gola çurk sê ye. Asparta: navê bajarekî Turkî ye di ro helatê Bor dor û ro avayê Qunya daye. Dîl: bin dest û girtî. Bergil: ji bar gir hatiye, qantir.

(2) Yûsîf axa: yek ji axayê Wanê ye ew û digel «370» hebî ji êla wî ji cî dîr kîrîn û birin Asparta. Ce'fer: yek ji axayên Mûsê ye ew û digel «150» hebî ji êla wî birin Bor dorê. Cindî: yek ji axayên Wanê ye ew û digel «80» hebî ji êla wî birin Bor dorê. Dilawer: gernas. Hemdî: yek ji axayên Bedlîse ew û digel «130» hebî ji êla wî birin Bor dorê. Kamil: yek ji koman darê êla bû ew û digel «100» hebî birin Bor dorê. Dîpoşe: li xwe dike.

(3) Nadîr: begê Heyderanî ew û digel çend heban birin Bor dorê. Qasîm: yek ji axayên Wanê ye ew û digel «190» hebî birin Bor dorê. Hemze: ji mezinên

Didin dîtin ne yarî ji bo Kurdê belengaz⁽¹⁾
 Digel hev alî karî wekî şêr û huner baz
 Xuyane nan dixwazin dizin bona gel û dîn
 Serê gemar û tozin hevalê dûvik û kîn
 Herê şaşê dibînim sitem anî cihê me⁽²⁾
 Bi vê pirsê ne dînim li kû ma ye mihê me?
 Dewra Wanê bi bîne tev da koh û kelatin
 Rengê kewan bi xwîne cihê jîn û felatin
 Çinar û hem Bîlekan Xar edîb û Mengene⁽³⁾
 Tendûrek û Melekan ketin destê cengene
 Cihin bona ceng û şer şikeft û xar û latin
 Civat û hîn û tevger hev dîtin û xebatin
 Çilo tolê nastînin ji bê cî yû setem kar?⁽⁴⁾
 Tê da ferzend nabînim dijmin nakin tar û mar
 Di mînin dîl û bê par xwendegah û berleman
 Bê xwendin û kar û par xwendewar û ser miyan

Wanê ye ew û digel «220» hebî birin Bordorê. Necmedîn: ji mezinên Mûşê ye ew û digel «150» hebî birin Bordorê. Qotas: ji mezinên Wanê ye ew û digel «280» hebî birin Bordorê. Egîd: gernas û pehlewani.

(1) Sima'îl: yek ji axayên Wanê ye ew û digel «40» hebî birin Bordorê. Yasîn: yek ji axayên Wanê ye ew û digel «90» hebî birin Asparta. Misto: yek ji mezinên Mûşê ye ew û digel «100» hebî birin Bordorê. Pîl: mezin. hejarî: xizani û belengazî.

(2) Belengaz: perîşan. Dûvik: tîrî.

(3) Sitem: zor û kotek. Mih: mezin. Koh: çiya. Jîn: xweşî. Felat: xelas.

(4) Çinar: navê çiyakî ye di ro helatê gola Wanê da ye bi «2980» endazî bilinde. Xar ebîd: çiyakî dikevi ro helatê Wanê bi «3550» M bilinde. Mengene: di ro helatê Wanê da ye bi «3610» M bilinde. Tendûrek: bakur û ro helatê Wanê bi «3200» M bilinde. Bîlekan û Melekan: navê du çiyane. Cengene: mitîrb.

(5) Tol: heyf. Dîl: girtî. Gah: cih.

BEDLÎS

Bedlîsê min dizanî	li ser te ceng û şer bû
Cih û warê beranî	ne yarê te Teter bû
Berê Osmanî hatin	bi kuştin û bi talan ⁽¹⁾
Tev agir û şewatin	ber ba dîkin jiyanê
Wek Cengîz û Hilako	Têmûr kirin ziyânî
Wek Nûzer û Diyako	winda kirin biyanî
Wajî wekî Mexûlan	xwarin welatê şêrîn ⁽²⁾
Xendeq dizî di kolan	dikin welat û hêlîn
Padîşahên sitem kar	pey hev hatin cihê te
Girtin ji te der û xar	ber ba kirin mihê te
Ev pêt û ev arê ha	li ser te tim xuyane ⁽³⁾
Ev dar û ev barê ha	li ser te bê dewane
Herê şaxê xwe ber dan	di nav can û dilê te
Di nava ceng û lêdan	tev ra kirin kulê te
Te xweşî qet ne dîtî	heya noka hejarî ⁽⁴⁾
Di nav dewran û gîfî	tenê bê tîp û zarî

(1) Bedlîs: xuya dibe ku ji pêt lis hati ye dikevi ro avayê Wanê têda çiyayên bilind û dijwar hene. Teter: pêşî teter hahatin û ketin petlîsê dîra Osmanî. Jiyan: xweşî. Cengîz: xan cengar û şer ker çê kerê dewleta Mexûlan. Hilako: niviyê Cengîz xane. Nû zer û Diyako: navê du padîşahên Mêdiyane lê daxwaz pey gernasên Kurdane.

(2) Wajî: Osmaniyan. Xendeq: kortal û kozik. Xar: mixare û şikeft. Mih: mezin. (3) Dewa: derman.

(4) Noka: niha. hejarî: perîşanî belengazî. Gîfî: cihan. Tîp: herf. Zar: ziman.

Ji ber derdên kurê xwe	tu mayî nav nivînan
Ji nav û hindirê xwe	di nalînî esîran
Gelo carek ji hebsan	tu nayî der bi mêrî? ⁽¹⁾
Bidê dijmin tu dersan	bi merdanî, dilêrî
Dakev kelatê Ker kor	Nemrûd û ham Mengene ⁽²⁾
Ne yarê xwe biike kor	jev ke rengê tentene
Heya kê tê wihabî	melûl û jar û bê çar? ⁽³⁾
Di nav te çal û tabî	li ser te dijminê har
Ta wek Beyar û Ednan	ser te pîl û serek bin
Na bînî tu çu derdan	ta dijminê pîs derek bin
Şeref xan va di tirbê	li hawîr xwe dinêre ⁽³⁾
Ji ber nalîn û kerbê	ji çavan xwîn didêre
Dibînî ku welat tev	kefî destê ne yaran
Keç û law û kelat tev	di bin destê xidaran
Dibê xelkê dinê tev	xudî zar û zimanin ⁽³⁾
Tenê Kurmancî ber dev	xulam û dergevanin
Şeref beg dil birîne	di gorê bê tebate
Ne xweş û xem civîne	li ber bendê welate
Bi dismal hêsirê xwîn	li ser çavan dimale ⁽³⁾
Bi rengê malik û dîn	ji nava dil dinale
Şihabiddîn dibêje	Silahiddîn şiyarbe
Ne bê hê dem dirêje	Ji Hîzanê diyar be

(5) Hebs: zindan. Merdanî û dilêrî: gernasî û mêr xasî.

(1) Kelat: asê geh. Kerkor: navê çiyakî ye bi «2613» endazan ji rûyê derya bilind tire di ro helatê Nûrşîn da ye. Nemrûd: bi «3050» endazî bilinde di ro avayê Bedlis da ye. Mengene: di kevi ro helatê Wanê.

(2) Melûl: bê kêf. Jar: zeif û nexweş. Çar: tevdîr. Tabî: kozik. Har: gezo ker ji hêranê hatiye. Beyar: ser komarê tirkan 15 gulanê di 1883 an de bû ye di 1834 an gulanê sala 1950 hem di 1954 an hatiye bijartin. Pîl: mezin. Çu: tu an ku tiştek ji tiştan.

(3) Şeref Xan: xwedî yê şeref namê di 1834 an de hemberî Turkan rabû ye lê doza wî ne çû serî. Kerb: kovan.

Ji dijmîn heyf û tola	me carek tu hiîne
Ji meydan gok û hola	me carek tu derîne
Selîm şêxê huner mend	ji doza xwe ve nabe ⁽¹⁾
Ne yaran ew dike bend	cihê wî ger wiha be
Bi mîna xwe dînasim	bi namûs û bi xîret
Li vê pîrsê ne şaşim	xuya ye doz û şîret
Ji yek rengî ve nabim	ne wek komel perestan ⁽²⁾
Ji bê dînî di gazim	ne wek ser xweş û mestan
Ji lewra tal û tûjim	li cem komel prestan
Ne yeksan û bi sûcim	li cem dîndar û sîstan
Ji ber ku ew wiha bû	xwe da kuştin ji bo min ⁽⁴⁾
Çiko mêr û xuya bû	ne bû bê war û xain
Cihê xwe va didîti	di bîstana buhîştê
Xwe kir bê parê gîti	navê xwe kir di lîstê
Heya noka xuya ye	navê delal û şêrîn ⁽⁵⁾
Serê me ber bi ba ye	bo me xelat û mîzgîn
Seyd Elî ji kalê	xwe te zanî diyanet
Çi kim îro mecalê	li te rakir qiyamet
Dijmîn ne dîti wijdan	tu xistî dar û sê pî ⁽¹⁾
Jê ra tu nîne îman	bi nav û dengê bê cî
Kengî fedî dîkin ew	ji îzdan û piyam ber?
Kengî xwedî dîkin ew	Kurdê jîr û dilawer

(4) Şeref beg: yek ji mîrekên Ezîzan bû û soz û peyman Şeref Xan ra da bû. Tebat: hedan.

(5) Malik: Malik hezîn navê firindekî ye. Şîhabiddîn: di 1913 ê zanê Şîhabiddîn û mela Selîm, Seyid Elî di Bedlîsê rabûn doza kurdîti kirin, Şîhabiddîn û Seyid Elî anîn Diyar bekîr û xistin sê darê û mela selîm qunsil xana Rûsiya da girtin û xistin eê darê û kuştin. Silahiddîn: Silahiddînê mala Xews.

(1) HOLA: di vir da daxwaz pey goke. Selîm: mela Selîmê Dumilî serekê şewreşa 1913 an di Bedlîsê. Bend: qeyd û girêdan. Ger wihabe: wiha bin dest bi minî.

(2) Komel: kom û ciyat. Perest: parêz. Mest: ser xweş. Yeksan: wek hev. Sûc: guneh. (3) Ew: mela Selîm. Buhîşt: cenet. Gîti: cihan û دنیا.

Bi destûra xudanî tola xwe em distînin⁽¹⁾
 Ji dijmin û biyanî ê ku ser xweş û dînî
 Xwedê heskî ne dûre ala kurdî xuya bî
 Gurê dijmin bi zûre dijmin bi mergê şabî
 Em di şûnê bi mînin ser bilind û paye dar
 Tovê jînê bi çînin jîr û zana, xwende war
 Bi tevdîr û bi raman evîn û restegarî⁽²⁾
 Diçin baxê niştêman bi tevger û şiyarî

* * * *

(1) Tol: heyf. Biyanî: ejnebî. merg: mirin. Tov: bizir. Jîn: xweşî.

(2) Raman: armanc û tevdîr. Evîn: heskirin. Restegarî: xelas.

(4) Noka: niha. Seyid Eli: yek ji gernasên şewreşa 1913 di Bedlîsê. Qiyamet: roja dawî.

(5) Sê pî: dara xeqê. Îman: bawerî. Ew: dijmin. Îzdan: xwedê. Jîr: jîhatî. Dilawer: pehlewan.

DÛR KIRINA ÇEND MEZINÊN BEDLÎSÊ

Ji te sirgûm kirin pîr mela û şêx û begler⁽¹⁾
 Kirin qefle, kirin bir edîb û mîr û serwer
 Didane ber gem û dar berî dane Anadol
 Birin bê çek sera ser di dane ber pî yû sol
 Digel bav û keç û dê kur û ap û birder
 Bi agir hin kirin kê ji cî tevda kirin der
 Digel lêdan û kuştin birçî bûn û hejarî⁽²⁾
 Li ber sator û xiştin jev kirin parî parî
 Binê Sadûn û Gulşen di Asparta dinalin
 Kirin hebsê, kirin ben ji çavan xwîn dimalin
 Meia Se'îd efendi di Asparta ne xweşe⁽³⁾
 Dibê Hemdî efendî di dilda xem dinoşe
 Were cern min birader navê xwe têxe listê
 Da em hemî bera ber herin baxê buhîştê
 Ji Bordorê were der bi min ra her bi nale⁽⁴⁾
 Binê yarê dilawer kekê te pîr û kale

(1) Ber ber: pevra. Buhîşt: cenet. Binê: binêre. Dilawer: pehlewani. Kek: bira.

Çeleng: jîr û gernas. Şehîd: nemran. Rûmet: qedir û şeref.

(3) Sirgûm: dûrkirina ji welat. Begler: koma bege. Qefle: kom kom. Bêçek: pêxwas û tazi. Sera ser: tev. Kê: dax.

(4) Hejarî: belengazî. Bine: binêre. Sadûn: yek ji axayên Bedlîsê ye ew û digel «280» hebî ji êla wî birin Asparta di 30. 4. 1919 an de. Gulşen. ku yek ji axayên Bedlîsê bû digel «125» hebî ji êla wî birin Asparta. Mela Se'îd: yek ji mezinên Bedlîsê bû ew û digel «80» hebî birin Asparta ne ku ew tenê hatin dîr kirin. Asparta: bajarekî tureka ye di ro avayê Qunye û ro helatê Bordewrda ye. Ehmed Efendî: yek ji mezinên Bedlîsê bû ew û digel «100» hebî di 30. 4. 1919 an de birin Bordorê. Dinoşe: vedixwe. Dilawer: pehlewani.

Effî kanî li kû ye	Şehîdê	Heyderanî
Xortê çeleng û nû ye	wekî şêr û	beranî
Xwe da kuştin ji bo me	ji bona dîn û dewlet ⁽²⁾	
Di da hiştin ji bo me	welat û nav û rûmet	
Reşîd axa di gorê	nexweş û	dilbirîne
Civatek dane dorê	dibê qê	ejnebîne
Ji Nesredîn bi pirse	çima tu pir	dinalî?
Gelo ew dil bi tirse	we ya ma bê	hevalî?
Dibê ez dil birînim	ji ber doza	welatê
Nexweş û mest û dînim	ji ber gel û	felatê
Nizanim ev çi derde	tenê li ser me	kare? ⁽³⁾
Bû ye zinar û perde	ronî ne kar û	bare
Çilo xelkê cihanê	xudî zar û	zimanin?
Berî dane jiyanê	em bê hiş û	nezanin
Eve ku ez dinalim	nexweş û dil	birînim
Çiko bê zar û lalim	bê xwendin û	bê hînim
Xebat û berlemanim	kitêb û tîp û	name
Civîn û xwendevanim	felat û çep û	xame

* * * *

(2) Reşîd axa: ew û digel «130» hebî ji Bedlisê di 30. 4. 1919 an birin Bordorê.

Nesreddîn: ew û digel «475» hebî ji Bedlisê di 30. 4. 1919 an birin Asparta.

Mest: ser xweş. Felat: rizgarî û xelas.

(3) Jiyan: xweşî. Zar: ziman. Hîn: zanîn û zanistî. Berleman: ji pir lêman hatiye civata bijara ra tê gotin. Tîp: herf. Name: mektûb û kitêb. Çap: tebî'.

Xame: qelem.

SÊRT

Sêrtê wiha diyanet Buhîşt û hem hidayet Dîlovanî dixwîne Mirûvî tê dibîne Heval bendî diçîne Bi xweşî xwe digînî Ji çol û deşt û zozan Ji berf û ba û baran Ji îzdan û ji quran Ji destê pîr û dînan Bi namûs û bi xîret Bi însaf û bi rûmet Bi nermî heq perestî Hewar û zû helestî Kê em heram dibînin Zîyan em jê diçînin	tête diyar û ravê ji derya tê peravê ol û wijdan û dadî⁽¹⁾ cihan û kêf û şadî gul û beybûn û reyhan bax û kelat û meydan her tê zad û ber û jîn⁽²⁾ gul û giya dibîn şîn dîne me xweş xuyaye bê zar û bê biha ye tu rabe ser bilindî⁽³⁾ xuya be xweş û rindî dilovanî bide pê rewalê xwe nede kê ku havil jê nebî kar⁽⁴⁾ digotî me: serek dar
--	--

(1) Sêrt: di koka xwe da Kurdê kevnare ra tê gotin lê navê bajarekî kurdî ye dikevi ro helat û başûrî Wanê. Tête diyar: xuya dibe. Rav: te'bîr. Derya: behr. Perav: perê avê. Dîlovanî: dil nermî û dil tenikî. Ol: dîn. Dadî: edalet.

(2) Jîn: xweşî. Bêr: fîkî û mêwe. Îzdan: xwedê. Pîr: şêx.

(3) Însaf: wijdan. rûmet: qedir. Heq: maf. Perestî: parêzî. Helestî: rabûn. Rewal: kur. Kê: dax.

(4) Havil: feyde. Zîyan: zirar. Serek dar: pêxeber.

Agir dadan û hovî ji iblîs hatî berdan
 Xwe nav hildan û kovî kare ji bo ne merdan
 Xiştê bi tûj û xişxiş karê geda dizanim⁽¹⁾
 Sur ketina bi fişfiş ez sofî yê filanîm
 Pîrê firok û rê ber qutbê di nav cihanê
 Roja dawî dilawer xuya dike jiyanê
 Ser şaş û ser tix û mix karê betal û kovî
 Fort û xapandin û çix karê ne yar û rovî
 Maçê bi ling û destan dînê me pê nehatî⁽²⁾
 Xaçê filan û mestan kî pê didî beratî?
 Atlas li ser qed û bal taca bilind û keskî
 Zarê bi halê tercal şorba bi tas û heskî
 Nalîn û dengê sofî dîn jê cuda ye rê ber⁽³⁾
 Dismal û şal û kofî huner jê tê gula zer
 Lê dîn bi top û napal bi destê şêr û rimbaz
 Bi tevger û tox û al bi leşker û bi serbaz
 Bi xwendin û bi zanîn bi yektî yû şiyarî⁽⁴⁾
 Bi dad û dest helanî bi hîn û restegarî
 Ji destê kafir û dîn ji pîsî hem ji derdan
 Ji bin darê kul û kîn ji tarî hatî berdan
 Bi rist û torevanî bi hevdîn û hevalî⁽⁵⁾
 Bi hîn û ser miyanî bi êş û tirs û talî

(5) Geda: koma geye ku parseke. Sur: cizbe. Dilawer: pehlewan.

(1) tix û mix: rengîn. Çix: dek û xapandin. Fort: nav xwedan. Mestan: ser xweşan. Qed û bal: bejn. Zarê: zarê ku sofî bi pey dipeyivin ku bê daxwaze.

(2) Cuda: ciyawaz. Tevger: xebat. Al: nişana xweserî. Ser abz: leşker.

(3) Dad: edalet. Hîn: zanistî. restegarî: xelas.

(4) Rist: şî'ir. Torevan: toredarî. Jin: xweşî. civakî: civîndarî. Çakî: qenci.

Bi zarê xweş û şêrîn	bi yek dest û civakî
Bi bend û tevger û jîn	bi mêranî, bi çakî
Bi doz û pend û şîret	bi ferman û bi dewlet ⁽⁵⁾
Ji dîlî herî ji hîret	tê der ji bend û sewlet
Bo me baxê buhare	ev dînê rind û şêrîn
Li cem îzdan hinare	ev gewherê hunerçîn
Hatî warê me Kurdan	bi zanîn û bijarî
Bi tîp û şêr û merdan	bi dad û restegarî
Divê bi destê hasin	bi parêzin bi rindî ⁽¹⁾
Diz û ne yar û bê bin	derînin ser bilindî
Ne wek pîrê zemanê	bidin ber xap û xiştan
Xirafat û gumanê	bi kulm û dar û miştan
Ne ku bi nan û xorin	bila kin nav gel û war ⁽²⁾
Bi vê daxwazê korin	ne dîndar û ne huşyar
Bi xewn û fort û pesnan	bi xirq û bi tizbî
Bi ser hejîn û parsan	bi kîn û bend û hizbî
Ne başe bête zanîn	ev dînê rind û nazik ⁽³⁾
Divê ew bête danîn	bi kok û êl û bavik
Lewra pêşî me danî	bi ber hîmî û bi zara
Qencî ji nav helanî	dî alet û burc û xara
Ji Maj û Mûj û Manî	ji Kurdak û ji Madan ⁽⁴⁾
Helatî ber bibanî	ev agir hatî dadan

(5) Pend: şîret. Dîlî: bîr destî. Hîret: şaş bûn. Bend: girêdan. Sewlet: dijwarî. Îzdan: xwedê. Hinare: hatiye şandin.

(1) Bijarî: neqandî. Tîp: herf. Merdan: mêran. Dad: însaf. Restegarî: rizgarî û xelas. Bin: kok. Pîr: şêx. Xirafat: direw. Mişt: kulm.

(2) Gel: millet. War: welat. Fort: xwe pesindan. Xirqe: nişanên sofîyên kevnare. Bend: ber berî. Hizbî: komelayetî.

(3) Berhîm: Bîrahîm. Zara: Zeradeş ji ber ku pîr dizanî jêra gotin zara. Bûrc: asê geh. Xar: mixare.

(4) Maj û muj: manî û mad navê Kurdê kevnarene. Kêdan: daxdan.

Dûre ji êş û lêdan	ji bê hişî, dewarî
Bi xîşt û dax û kêdan	maye di koxa tarî
Ne ku em jê dîkin rev	çawa ku hûn dibêjin ⁽⁵⁾
Ne bin xulam û ber dev	ne xweş û dil qirêjin
Wiha tene mirandin	ji kurdanî dibin dûr
Bi pîsî tene çandin	di kort û ber qefên kûr

* * * *

(5) Xulam: kole. Qef:

MÊR DÎN

Mêrdîna gewr û rengîn taca serê Cizîr⁽¹⁾
 Reyhan û misk û nesrîn roj û mih û nedîrî
 Gelek şêrîn û xweşî zozan û havîn gahî
 Cihê zanîn û hoşî parastin û penahî
 Tevda şikeft û latî kendal û sirt û çalî
 Civîn geha felatî rêç û çix û newalî
 Kofî kelat û ber paş koh û zinar û late⁽²⁾
 Pî ser der û ber û kaş çol û çiya civate
 Ber û fikî di navê bi xurtanî xuyane
 Rengê çirax û tavê konê geşî vedane
 Ser Kenciham didîne mêjo dizanê inglo⁽³⁾
 Cihê te gewherîne tu cahê Kurd û Lolo
 Kurdak û Mêd û Manî di vê qadê xuya bûn
 Bi mêranî, merdanî di vî warî bila bûn
 Bêne baxê buhîştê ber hêla te difûrî⁽⁴⁾
 Kember li nav û piştê hor û zerî di bûrî

(1) nedîr: çir û ronahî. Hoş: hiş û bîr. Penah: parastin. kendal: kort û çal. Çix: xaçe rê.

(2) Koh: çiya. Ber: kevir. Ber: mêwe. Xurtanî: piranî.

(3) Ser: jor û raser. Kenciham: navê cî kî ye di bajarê Koto da ye di Emrika jêrîn de. Mêjo: tarîx. Inglo: inglîzî. Cah: cih. Lolo: navê komekî ji Kurdane. Qad: zevî. Merdanî: gernasî.

(4) Hor: qîzên çav reş û gewr. Dêman: eûwan. Rone: rojin. Çîrîz: şewq û pirisk.

Xwîna zelal û şêrîn li ser dêman dilîzî
 Çavê reş û zer û şîn rone didin çirîzî
 Lêvê bi sor û nazik her jê şkir dibarî⁽⁵⁾
 Gerden bilûre navik misk û ember diyarî
 Der tîne qehremanî ji navê te me zanî
 Tu dêwê ser cihanî çilo li ber zîyanî?
 Ji navê te xuya ye cihê Kurdê huner baz
 Ji bo te pir seza ye bibî îro ser ifraz
 Bi navî te deng da çi Mêrdî û çi Mardîn⁽¹⁾
 Ji bo Manî te reng da lawê te Kurd û yadîn
 Ne komir û ne torê ne tazî yû kuî xwar
 Bi kotek û bi zorê tu xistî ber dek û twar
 Tu danî ber pî yû dest kurê Hemdûn û Merwan⁽²⁾
 Selçûqîyan kemr best kirin ber darê ferman
 Toran û Turk û Paris li ser te ceng û halan
 Têmûr û hirç û garis kirin ber darê talan
 Ji lo zarê te lale derî da ye zebanî⁽³⁾
 Di kortal û di çale ketî destê biyanî
 Ji xew rabe binêre ji nav te rakirin dîn
 Dijmin mêran dihêrî li bin derd û kul û kîn
 Tabî li her derê te dikole ew tim û tim⁽⁴⁾
 Qamçî li ser serê te bi qarîn û bi şildan

(5) Gerden: isto û qirk. Navê te: Mêrdîn du pirsîn, Mêr: mûv ya gernase, Dîn: lîtin ya pehlewana. Dêw: gernas.

(1) Ji navê te: çawa ku dirbaz bû ye. Seza: şaye, la'îq. Ifraz: bilind. Mardîn: mar dîtine. Mêr dîn: mêr û gernas dîtine an ku xuya dibe ku xelkê Mêrdîne li ber dijminan dest hilanîne ji lewra jêra hatiye gotin Mêrdîn. Yadîn: navê yekî ji mîrekên Cê bax çûre. Komir: navê bavê Turka ye.

(2) Hemdûn û Merwan: ger çîqa koka xwe da Kurdin lê di 970 zayî de bi navê dîn ser destî lê kirin. Selçûqî: di pê Merwaniyan heyani 1395 ser destî lê kirin.

Rê buwar û rêçikên te	ji bumban hilweşandin
Gelek xort û qîzên te	bi wana ew mirandîn
Xeta tirên heram kir	ji bo te dijaminê har ⁽¹⁾
Zarê te ker û lal kir	ne yarê bê cih û war
Bi çavê xwe dibînin	li ber xeta tirênê
Laşê xortan diçînin	di hêlin ber tirênê
Dikin bin cêb û teksî	qeçax çîyan bi saxî
Bi qundax û bi qamçî	bi zor û hem bi taxî
Hinek xortê te kuştin	xistin li nav çemê av ⁽²⁾
Hinek li çolê hiştin	genî bûne li ber tav
Bi çend salan dimînin	kes nikarî derîni
Bîrîn edab û xwînin	bê xudan û civîni
Pirin nayên jimarê	ê ku hatin mirandin ⁽³⁾
Bê gazî yû hewarê	tevda hatin qelandin
Hin birçîna diçin jêr	hin ser tazî yû pê xas
Dijmin li wan dide dêr	ulan gêt me hanî pas
Sen hêç bîsî anmez	eskî qefa bulonur
Adem lere benze mez	bo yerinde oturur
Ta ben senî oldurem	kurt mî sen ey edeb siz
Cehennem gonderem	kîm dir benim kîm dir bîz
Wiha rengê ji vir de	destûre me tunî ne ⁽³⁾
Gûneh nîne lew Kurde	dêrd û tore dibîne

(5) Har: gezo ker û ser xweş.

(1) Cêb û teksî: gerokene. Qundax: dûvê tîfîngê. Taxî: ser destî. Edeb: rêm.

(2) Ulan: kuro (ji uxlim kin bûye). Gêtime: neçe, meçe. Hanî: kanî û li kû ye. Pas: rê buwar ji parastin hatiye. Sn: tu. Hêç: qet. Bîsî: ji bîrşê kin bû ye, tiştêk. Anamez: fêr nakî. Eskî: kevin. Qefa: serî. Bulonur: xuya dibî. Adem: mirûv. Ler: nişana komê ye. Benze mez: ne wekî ne mîni. Bo yerinde: li vî cihî. Otorur: rûne. Ben: ez. Senî: te. Oldirim: bi kujim. Kurtmî sen: qê tu Kurdî. Edebsiz: bê tore. Gundireme: te dişînim. Kîm: ez kîme û em kîne.

(3) Tore: edeb. Naçarî: bivê nevê.

Tên û diçin ji ber nan	ne xweş û zik valane
Hin naçarî didin can	xwedîyê derd û belane
Hin ber êşa birînê	dikin naîn û zarî ⁽¹⁾
Hin ber kela girînê	xwîn ji çavan dibarî
Hinan canê xwe tavêt	ber qemberan bi dîlî
Hin di kuştin denabêt	hin ber beran bi pîlî
Hela tu van bihêle	were derdan bi xwîne
Xwedê dijmin ne hêle	xidar û dil bi kîne
Bo te hinan dibêjim	birayê niştemani ⁽²⁾
Derdê giran dirêjim	dîlî dikim xuyanî
Da tu ne mînî bê kar	ji tevdîra ne yara
Ber bi kelat û zinar	koh û şikeft û xara
Ar û ziyan û lêdan	bi çavê xwe bi bînî ⁽²⁾
Di çol û deşt û zozan	çilo didêre kînî?

* * * *

(4) Qemberan: narincokan. Dîlî: bin destî, yesirî. Beran: gullan. Pîlî: mezinatî.

(1) Hela: ji bo şiyar kirin tê. Dîlî: bin destî. Koh: çiya. Xar: mixare.

(2) Ar: agir. Ziyan: zirar. Zor bar: zor lê hatî kirin. Didêre: çê dike.

JINA ZOR BAR

Jinek digel keça xwe çû serdana mirûvan
 Ser mil danî keça xwe xet dirbaz kir bi lîngan
 Bumbakî lê teqa bû can ji qalib deranî⁽³⁾
 Keç li ser sîngê ma bû qêrîn da erşê banî
 Kes ne wêra herî cem keç ji mirin kuta kî
 Zarîn dikir dida dem ji derdê ejdehakî
 Wêjî serê xwe danî li dadê bû ye mêvan⁽⁴⁾
 Rewşen dida ber anî dîsan wer ser xeberdan
 Guman dikin ku pîran jêra ev rê deranî
 Hatî ji deste gîran ya ji pirsê biyanî
 Eve karê me Kurdan heya niha wihane⁽⁵⁾
 Mane ber êş û derdan ji lewra bê bihane
 Ne bûne jîr û zana xudanê dewlet û dîn
 Li ber dest û piyana pepûk û jar û xemgîn

(3) Bumba: narincok. Qalib: laş. Kutakî: rizgarkî, xelaskî. Dem: nefes. Ejdehakî: zor kariyê.

(4) Rewşen: nişanê nemiranî. Pîran: şêxan. Biyanî: ejnebî, dijmin.

(5) Jîr: çeleng, Jihatî. Pepûk: melûl. Jar: zeif, perişan.

MIRÛVÊ BIRÎNDAR

Ji rast goyan bihîstim ku mirûvek birîndar
 Bi çavê xwe ne dîtim kelaşek bê his û kar
 Wiha dihate zanîn ku hejarê perîşan⁽¹⁾
 Li ber wan dest helanî ji bona kar û îşan
 Derbek wiha lê ketî nikaî rabî ser xwe
 Bê tevdir û rûmetî tîşteke ne danî ber xwe
 Çend rojan ew ulo ma li ser xeta aradê⁽²⁾
 Bê av û nan û cî ma dibê heware dadê
 ma ye li ber kul û xem pepûk û jar û birçî
 Jin û zaro hatin cem ku tasek av bidin wî
 Hinan gotin bi zorê Turkan ev anîne cem⁽³⁾
 Xelek dane li dorê li ber dar û ben û gem
 Bê zar û bê zimanin belengaz û ne xweşin
 Tevda li ser piyanin xuyane reş dipoşin
 Komandar gotî leşker ulan sen bonî uldir⁽⁴⁾
 Kiri nîşan ser esker kuştin serî danî wir

(1) Kelaş: gewde û laş. Hejar: feqîr, belengaz. Perîşan: şepirze. Wan: Turkan. Rûmet: qedritî.

(2) Ulo: wiha. Erad: dikevi hêla serê kanî. Dadê: yadê. Pepûk: bê kêf.

(3) Belengaz: perîşan. Dipoşin: li xwe dîkin.

(4) Koman dar: serekê koman. Leşker: ji du pîrsan, Leş: laş, Ker: ji ker ker hatiye. Ulan: oxlim, kuro. Sen: tu. Bonî: evê ha. Uldir: bi kuje. Har: ser xweş.

Ehlê wî ev karê ha bi çavê xwe didîtin
 Ev zor û ev darê ha ji harê xwe didîtin
 Ku ber çavan dikuştin bê însaf û bê wijdan⁽⁵⁾
 Bê qerqere di hiştin li ber lêdan û derdan
 Kanî kî ye wiha kir ji vê hêla cihanê?
 Şînî ji erdê ra kir di vê dewra zemanê?
 Ev ne tenê wihane gelek mîna eva bûn
 Li bin darê zihanê li ber êş û bela bûn
 Hin birçîna dicûne ku qemberan derînin⁽¹⁾
 Goştê wana dicûne di çolê ew dimînin
 Cihê ku tê dibûne tev agir û duxane
 Wiha ber dar û tûne bê qedr û bê bihane
 Ev sînore ku danîn tev mayin û narincok⁽²⁾
 Ji ku derxist û tanîn bi destê ejder û xok
 Ji me zanim birader ev pîsî yû qirêjî
 Dimane bê ser û ber bê tevdir û bê mêjî
 Ji xênî xwe nizanin hîn û zanîn û destûr⁽³⁾
 Timî dîl û xizanin li dîwanê zûre zûr

* * * *

(5) Însaf: edalet. Qerqere: kefen.

(1) Zih: marê mezin, ejder û ejdeha ji wiha ne. Dicûne: dicûtine.

(2) Mayin: qemberê mezin. Narincokê piçûk. Ejder: ejdiha. Xok: beraz. Mêjî: di virde di daxwaza hişê.

(3) Hin: zanistî. Dîl: bin dest. Xizan: hejar. Çeleng: jihatî, sivik. Egît: pehlewani.

HACÎYÊ BÊ HIŞ

Were dîsa bi nale ku çend hacî me dîtin
 Xwîn ji çavan bi male çeleng û hem egîtin
 Hatin Amûda rengîn çend rojan ew li wir man⁽⁴⁾
 Tevan şora xwe danîn ne dîtin bo xwe derman
 meger ku tevda rabin berî bidin li malê
 Da ku cihê şa bin herin war û mecalê
 Tevan da bû li ser rê çûne ser xet bi şahî⁽⁵⁾
 Li wan gur bû ye arê dojah bi zor û dahî
 Li wir tevda biraştin kirin kebab û arî
 Tune bo wan veşartin ne dîne aî karî
 Ne dîne hacî yê dîn ku tê ne bî edalet
 Çi dîne tê hebî kîn ji bo zor darî halet?
 Çima bê hiş didî ser dibî sed parî parî?
 Diçî ber barê nû ker bi qêrîn û bi zarî
 Xwedê destûr ne da ye ku xwe têxî zirarê
 Kengî bo te rewşa ye bi xwe herî mezarê?

(4) Şor: tevdir. . Meger: engazê veqetandinê ye xuya dibe ku eve tevdir.

(5) Dojah: cehenem. Dahî: dijiwarî. Kebab: goştê biraştî. Arî: xulî.

(1) Edalet: wijdan û însaf. Halet: alet, rê ber. Nû ker: dîvik. Rewaye: diruste.

Mezar: mezel û gor.

Ey hacî yê sitem bar	kî go heye hîdayet ⁽²⁾
Herî ber ar û ber dar	ev ne ol û diyanet
Çi dînê vê dibêji	ne raste ey birader?
Xwîn û agir dirêji	ne wijdane biqî ser
Qelem lale ji gotin	nikarî zorê bêji ⁽³⁾
Ji bo me ar û sotin	li vir kurtî dirêji
Hingî bigir ta niha	ev rê dijwar û xore
Ev gel ma ye bê biha	ber agir û ber zore
Digel vê dijminê xwe	ji xwe çê tir dibînin ⁽⁴⁾
Xidar û xainê xwe	li xwe ser tir dibînin
Ev bê hişî heya kê	bê we hebî tim û tim
Pê hev ji bo we her tê	dar û kuştin, ben û rim
Ji we pir dane kuştin	zan û mîr û ser kar
Li sê piyan di hiştin	jîr û bijar û huşyar
Hovî heya niha ma	di vê hêlê ne zanîn
Kirin girtok û dama	Mîna Se'îd û yadîn
Serê xwe danî ber pî	li şêxan ew dinêre
Tenê bê war û bê cî	dijmin ewan dihêre
Ez bawerim ji hêlê	Kurdan tenê bê jîni ⁽⁵⁾
Bo xwe nîşan û kêlê	dibînin bê civînî
Serê te ber bi jêre	kuda diqî binêre?
Cihê te xeyr û bêre	gelê te ber bi kêre

(2) Sitem: zor û kotek. Hîdayet: kuta kirin. Ol: dîn.

(3) Qelem: xame. Gel: millet.

(4) Ser tîr: bilind tîr. Kê: kengî. Xidar: dijwar. Mîr: ji mîr hatiye. Bijar: neqandî. Girtok: dav.

(5) Serê xwe: Şêx Se'îd. Jîni: xweşî yî: Mêrdin. Kêl: nîşan. Jêre: xwe dixî rengê bê ciyan.

Çima nabî wek Berzan doza kûrdanî nakî?⁽²⁾
 Dihêlî tirs û lerzan bo komiran birakî
 Zarê derî dihêlî zarê bê cî dixwînî
 Bi vî rengî qirêlî gemar û ser hejînî
 Ji lat û koh û kendal ziving û bax û bîstan⁽³⁾
 Kelat û xar û ber pal Çem û dar û gulîstan
 Fedî nakî tu cara ji bajarê cihanê
 Çilo dimînî para divê çax û zemanê?
 Di rêza şermisara belengaz û perîşan⁽⁴⁾
 Hejar û bendewara li ber derd û kul û jan
 Xwe dibînî biyanî bi tîp û pirsê vala
 Nabînî ser miyanî di ber qef û newala
 Çawa ku ser bilindî xwe dibînî paye dar⁽⁴⁾
 Wiha bin darê kundî bê heval û bê hewar
 Ev pir xelet xuya ye divê xwe jê bidî paş
 Hawîrê te çiya ye ne mîne kortik û kaş

* * * *

(2) Komiran: Turkan. Zar: ziman. Derî: ê gund û newalan.

(3) Koh: çiya. Kendal: kort û çal. Ziving: şikeft. Kelat: asê geh. Xar: mixare.

(4) Şermisar: fehêt ker. Belengaz: hejar. perîşan: şepirze. Bendewar: ber bend. Biyanî: ejnebî. Tîp: herf. Paye dar: difre dar. Kund: wêran ker.

RIHA – URFA

Riha çawa riha bû Wekî lat û çiya bû Birahîmê پیام ber Çeleng û jîr û serwer Xwedê ji bo gelan tev Hilanî tarî û şev Çilo li ber ne yaran Li ber kelat û xaran Berî da pût perestan dîn û ser xweş û mestan Digo: hûn bê kemalîn Ji rê winda û dalîn Dirûste yan tinaze Xuya ye lîz û baze Ê ku jêra parastin Di vê daxwazê rastin	ji destê pîrê Nemrûd? li hember tîrê Nemrûd dîlovan û ser ifraz⁽¹⁾ vejîndar û huner baz kirî dest gêr û rê ber bi kar û hîn û tevger serî ra kir wekî hîm? xuyanî bû Birahîm kirî qêrîn û awaz⁽²⁾ hatî Nemrûd wekî baz digel bapîr û bavan tevan kir qêr û halan te ev pîrsê digotî⁽³⁾ dilê me ber disotî dîkin ew jî xuda ye bo me destûr ne daye
--	---

Riha: ya riha. Kuta bû: xelas bû. Birahîm: kirde kere ji bo riha bû yanî riha di zîmanê kurdî de bi daxwaze xelase gava ku Birahîm birin û xistin nav agir Nemrûd mirûvek şand ka çilo ye di ku ji agir xelas bû hate gote Nemrûd riha û dûra Riha bû navê bajarê Urfa. Nemrûd: ji nemir ya nîroz hatiye. Biyamber: bêxem ber. Dîlovan: dil nerm. Çeleng: jîhatî, pehlewana. Hîn: zanîn. Hîm: lat. Dîn: berî da dîna. Halan: dengê bilind. Baze: heneka, lîza. Dîkin: xwe dide rex parastin. Jar: belengaz, nexweş. Pepûk: bê keyf. Haf: hizûr. Birah: rast.

Ku jêra bibne kole	piristar û kemer bend ^(*)
Jar û pepûk û tole	her tim di hafê ber bend
Birah tu rast dibêji	vê gotina bê daxwaz?
Xuya ye dîn û gêji	were ba me bide soz
Digo: rastî dibêjim	li ser raman û dozim
Ne dîn û lal û gêjim	bi peyman û bi sozim
Divê pûtan bi hêlin	piristarê xwedê bin ^(*)
Divaya xwe veşêrin	di olê rind û çê bin
Bi Îzdanê dilo van	bi çim pûtan bi hêrim
Dema ku ew tenê man	li ber ba ez bidêrim
Bi mêranî kemer best	birî êrîş ne yaran ^(*)
Ewî balte kirî dest	diçû pûtan bi xaran
Timî ber çav û hazir	ne dîl û ne beta bû
Ne dî tirsek ji kafir	wekî şêran xuya bû
Dema hatin didîtin	divê halê perîşan ^(*)
Gur û zor dar û şîtin	mirin ber derd û êşan
Kirin agir bi zorê	ne yar û pût perestan
Xelek girtin li dorê	wekî ser xweş û mestan
Bi Îzdan bawerê kir	agir di bû gulistan ^(*)
Ewî sar û zerî kir	li ber bû bax û bîstan
Ji tarîxê deranî	ji berham û ji berhîm
Kurê Kurde me zanî	ji lew gotin: Bira hîm

Raman: tevdir û daxwaz. Peyman: gotina ku mirov pey dimîne. Pût: senem.
 Bihêlin: dev jê berdin. Divaya: daxwaza. Ol: dîn. Çê: :qenc
 Îzdan: Xwedê, an ku bi alikariya Xudayê dil nerm. Best: girêda. Xar: lez. Dîl:
 bindest. Bete: winda. Perîşan: şepirze. Şî: pis. Mest: serxweş. Tarîx: mêju,
 dirok. Beram û Berhîm: pirsin kurdîne. Zar: ziman. Mîn: wek. Berq: birûsk.
 Dilawer: mên û gernas. Egîd: pehlewani. Azer: navê bavê Bira hîme.

Ji nava kal û bavan	bi zarê Kurdî rabû ^(?)
Bî mîna berq û tavan	cihê ku tê xuya bû
Cihê Kurdê dilawer	egîd û pehlewani
Cihê Nemrûd û Azer	huner baz û beranî
Çawa ji dest Sikender	riha bû yî bi çakî
Selcoqî yê kezeb ker	nedî ser te zihakî
Ji destê Rûm û Sabûr	Ezînat û Zenûbî ^(?)
Ji emrê imberator	serk darê Selîbî
Ji bin darê Hilako	ne dîndar û setem kar
Ji Toran û ji Bako	xuya bû ew gurê har
Wiha ji destê dijmin	bi êrîşî, ser bilindî ^(?)
diz û bê bext û xain	bi ser bestî, bi rindî
Riha dikî tu Kurdan	ji destê kole daran
Wekî şêran û merdan	xuyane ser zinaran
Cihê Kurmanc û Kurdî	ji navê te diyarî ^(?)
Ne şarê hov û qirdî	ne cîgahê dewarî
Tu bawerke bi rastî	Birahîmin kurê Kurd
Ne yarê put perestî	hemî şêr û huner burd
Di xakê pehlewani	wekî Rustem xuyane ^(?)
Qubad û merzebanin	ber û lat û çiyane
Ne bêje winda bûne	bûne Turk û biyanî
Ji warê xwe diçûne	na bînin ser miyanî

Sikender: Mekdûnî. Riha: xelas. Çakî: qencî. Selûqî: navê yekî ji komandarên Sikender bû di / 320 / salî berî ya zanê (M) Riha istand bû. Zihakî: zor darî. Sitem: zor û kotek Toran: turkên teter. Har: gezo ker. Riha dikî: xelas dikî. Merdan: gernasana. Kurmanç: kurê manç û majin. Diyarî: xwuya dibe. Şar: bajar. Qird: turk. Perestî: parêzî. Burd: birin. Biyanî: ejnebi. Belengaz: hejar û perîşan. Bend: girêdan.

Tim û tim bê bihane di mînin bê kes û kar^(*)
Kul û derd û belane belengaz û sitem bar
Va ye fikra Kurdanî di nav me bû ye pêda
Di gêje nîştamanî dişkîne bend û qeyda

* * *

ANTAB Û MERAŞ

Ayin tabî delalî Çima dostê Kemalî Meraş bi navê gernas Wekî lat û der û kaş Tirko dibê qehreman Niha ma ye bê ziman Tu wek tavê xuyayî Çima tu bê bihayî Ya tu oia bi rewşî Ne xurt û jî û bewşî Herê tu warê minî Li bin destê bê binî Hişîne xîşt û şaşê Destê xwe bid Meraşê Pevra bikin hevalî Ne kin doza Kemalî	destê xwe nadî Meraş çilo mayî bera paş? xuya ye ber bi çava⁽¹⁾ tîfing û şûr û dava gumanim ku wiha ye bê qedr û bê biha ye ayîna roja minî⁽²⁾ qê tu ne soza minî? ronî na dî cihê min? nayî destê mihê min? ji navê te dizanim⁽³⁾ were der cerg û çanim here zozan û latan li ser koh û kelatan li der bend û newalan⁽⁴⁾ ne çin kortal û çalan
---	---

Ayin: dîn ya ayin, ayne: nê nîk. Tab: tav, ronî xuya dibe ku berê xelkê wî cihî jî ro hes dîkirin. Der: dever, newal. Jîr: çeleng. Bewş: pir. Mih: mezin. Bin: kok. Cerg: dîl û gurçik. Koh: çiya. Kelat: asê geh. Derbend: cihê kûr û teng. Newêrin: dîtirsîn. Esîr: girtî, bin dest. Feqîr: hejar. War: welat.

Demek rûnin binêrin cihan tev bû ye ava
 Ku hûn tenê ne wêrin herin cem kal û bava
 Xuya ye hûn esîrin di nav hov û nezana^(*)
 Belengaz û feqîran li nav pencê dizana
 Herdu pevra binalin bi kin gazî yû hewar
 Lewra hûn bê hevalin mane bê mal û bê war
 Mîr û serê we tev çûn hûn mane bê kes û kar
 Xortê we tev beta bûn mane bê dewlet û par
 Mîrê Milan di tirbê çavnêr û bendewar^(*)
 Li ber daxan û derbê dibê rabin heware
 Eger hûn tev xuya bin bi yek dest û dil û can
 Pevra mîna bira bin bi rastî yû wijdan
 Dê hûn cihê xwe şa bin wekî xelkê cihanê^(*)
 Li ser dijmin peya bin na mînin ber zîyanê
 Bi ser bestî diçin pêş huner mend û vejîndar
 Ber ba dîkin kul û êş ji nav gel û êl û war
 Binêrin Por se'îdê li ber sê goşe dijmin^(*)
 Misrê dida cirîdê ji hev xistin ser û bin
 Cenga îraq bi destê E'bdîl kerîm xuya bû
 Kirin newal û bestê paşa bi mergê şa bû
 Kevnarî jev bila kir şûnê danî hevparî^(*)
 Gel ê Îraqê şa kir bi hev dîn û rizgarî

Ser: serok. Beta: wînda. Tirb: gor. Bendwar: ber bend. Derb: lêdan. Dibê: dibêje. Zîyan: zirar. Vejîndar: ava ker û xweş ker. War: welat. Sê goş e: Inglîz, Fernas, Israîl. Best: newal û karêz. Paşa: feysel. Merg: mirin. Kevnarî: paşmayî. Hevparî: îştirakî. Rizgarî: xelasî. Mazîni: navê mezinêkê Îtalî ya bûbû destê kavûr ku yek ji pîlan gêrên mezin bû. Jîn: xweşî.

Kî mazînî xuya kir deranî jîn bi Kafûr
 Xarî destê xwe ba kir dijmin ji cî kirî der
 Sûrî bi sê milyona Firensa derxistî der⁽¹⁾
 Digel canbaz û kona kirî bê jîn û tevger
 Çawa dibêjî Turkim zarê deri na xwînî
 Bo welatê xwe gurkim dewar û ser hejînî
 Pirs û pêvê te yek car wekî pirsê ne yarin
 Bi van dibî birîndar gelê te ber zîrarin
 Ma qey dinê na bînî tevda ji xew şiyarin?⁽²⁾
 Kîn û rikê û rikê di çînî kurên te tev dewarin
 Zarê kok û maderî didî zarê çir û vir
 Yek pehlewî yek derî didî zaravê komir
 Ev agirê tu dadî ronî na dî welatim⁽³⁾
 Ling û destê xwe radî pir tir dibî şewatim

* * * *

Canbaz: ê ku bi canê xwe dilîze. Jir: çeleng. Kone: jihatî fenas ker.

Zar: ziman. Maerî: zikmakî. Pehlewî: ê ba jaran. Derî: ê gund û êlan. Zarav:

şewe Komer: Tirk. Radî: dirêjkî. Kilis: bajarekî kurdî ye dikevi bakurê Helebê

KILIS

Kilis nayê bîra te ew kuştin û ceng û şer
 Ber bar û zincîra te bi destê Turkê ejder
 Turkê bê bext û wijdan divê Toranî bînî^(*)
 Nû kî jan û derdan lêdan û bend û kînî
 Divê kurdanî rakî bi zaravê turkanî
 Da ku ji hev bilakî bi kî bê ser miyanî
 Ez bawerim tu şêrî cihê Kurdê kevnare^(*)
 Vejîn dar û dilêrî dewrê bax û zinare
 Nizanim bo çi mayî di kortala wêranî?
 Serî ber jêr û bayî perîşan û xizanî
 Tirsonêk û newêrî berî bidî jiyanê^(*)
 Li ber sator û kêrî mayî di bendexanê
 Ne nokaye wihayî ji dewra Osmaniyan
 Bê qedr û bê bihayî ketî ber dest û piyan
 Berê lawên te ra bûn ji bo mafê gel û war
 Piling û ejdiha bûn huner baz û vejîn dar

di çerxa / 17 / an doza xweserî kirye ku ji bin destê Osmaniyan derkevi. Ejder:
 marê mezin. Bend: zindan û girêdan. Vjîndar: saxker û jîn ker. Dilêr: mêr û
 gernas. Wêranî: xobanî, kavilî. Perîşan: şepirze. Xizanî: hejarî. Jiyan: xweşî.
 Bendexan: hebs. Noka: niha.

Ketin meydana cengê	bi azadî, şiyarî ^(*)
Didin dîtin qeşengê	felat û restegarî
Ehmed kurê can pola	Huseyn mîrê huner mînd
Alî pîlan di kolâ	ku Osmanî bikî zend
Ra bû ser xwe bi jîrî	ber dijminê kevmare ^(*)
Dihêrin kole gîrî	li ber qêr û heware
Lat û çiya hejandin	wekî şêra xuya bûn
Tirkê bê cî bezandin	ber êrişan bilabûn
Tereblis û Hims û Şam	ji dijminan sitandin ^(*)
Dixistin kortik û dam	bi mêranî tewandin
Lê xain bûne perde	ji daxwazê şikandin
Berê dan jan û derde	ev agir û kelandin
Niha jê bê gumanî	xwe dibînî biyanî ^(*)
Heval bendê dizanî	na bêjî ka tu kanî?
Kurdî digrî dihêrî	turkanî çê dibînî
Bo dijminan dilêrî	ji bo xwe ser hejînî
Ev ne wijdan û dîne	ne kurdanî, perwerî ^(*)
Bo dijminan civîne	kar û bend û rê berî
Ku em bibin bir û bêş	dîlê destê neyarin
Li ber derd û kul û êş	bê cî tim paye darin

Law: kur. Maf: heq. War: welat. Ejdiha: gernas. Vejindar: ava kerê welat. Azadî: ser bestî. Qeşeng: qencî. Felat: rizgarî, xelas. Kolegêrî: koledarî. Terablîs: dikevi Libnanê. Berêda: ne niha. Biyanî: ejinebiye. Çê: qenc. Dilêr: behlewî, welat parêzî. Bêş: parçe parçe. Dîl: bin dest, girtî. Payedar: difredar.

CİZİR ✕

Ey Cizîra bê heval cihê tevda zêra
 Karê di nav nale nal hemî bi xeyr û bêre
 Dicle di ber te bûrî diçe, digî Furatê⁽¹⁾
 Dewrê Sobar û Hûrî berî dane felatê
 Niha bê kar û barî Tirko na dî Kurdanî
 Bê tevger û hewarî xebat û ser miyanî
 Pirsa te zarê kurde bi zêr û cî hatî hev⁽²⁾
 Gelê têda ne qirde ne kole û ne ber dev
 Bi Muj û Maj xuya bû Mûjik û Manc û Manî
 Li dewra te bila bû bi gernasî, merdanî
 Niha bi dengê Botan ji buxtê hatine der⁽³⁾
 Bi pirs û pêvê gotan gotî dibûne ser wer
 Berê mêjo dizanim koka cihê kurdayî
 Bi vê ser gumanin delal û bê bihayî
 Ger çi mêjo dibêje Zagrose ya Ararat⁽⁴⁾
 Lal û durran dirêje nizanî ka ji kû hat

Cizîr: cizîra Botan di rohelatê Mardîn û başûrê Şernax daye. Karê: pitrolê.
 Sabûr û Hûrî: nave du êlên kurdî bû di çaxa xwe da bûne dewlet. Felat: xelas.
 Bi zêr: an ku cizîr ji du pirsan hatiye hev (1)ci: cih, cî (2)zerya ji gîzî hatiye ku
 nabêna axa û êla daye herwekî cizîr nabêna Fîrat û Dicle daye. Qird: turk.
 Maj, Mûj: bavê kurdî keynarene. Merdanî: gernasî û pehelwanî. Mêjo: tarix.
 Arart: çiyayê Agirî. Lal: yaqût. Şêrîn: zincîra çiyayên dewra Berzanê. Nedîr:
 çîra. Godî: cûdî, cûdî. Nûh: pêxemerê Gotiyan. Bê: bêjî Gel: millet.

Çi Agrî yû çî Zagros herdu têne Cizîrê
 Wekî Şêrîn û Toros dikin rewş û nedîrê
 Ka bê gûdî li kûye Nûh û Gotî ka kîne?⁽¹⁾
 Ev cî kevne ne nûye ê bê nûye ew dîne
 Tofan li kû çê bû yê kîyê zana kîyê mîr
 Ar û duxan û dû ye li ser gelê bê tevdir
 Bi navê Buxt û Botan ne noka ew xuya ye
 Bi gal gal û bi gotan di tarî da di maye
 Bi ol û pîr perestî ketî kortal û çalê⁽²⁾
 Bi girtin û pêwestî qe na gêje mecalê
 Kurê Umer dihatî çilo pey hatî navdan?
 Kî pey didî beratî wajî arê xwe dadan?
 Gerçe ewan sitandî lê nabî cî ji bo wan⁽³⁾
 Gelê me pey tewandî di bû şivan û gawan.
 Diçe aşê ne yaran li ser dike ceng û şer
 Di kozik û di xaran maye bê jîn û tevger
 Bi pîr û ol û ayin bi zar û pêv û şêwe⁽⁴⁾
 Di bû bê war û xain nedîti bax û mêwe
 Ev bajarê kevnare cihê Kurdê dilawer
 Gelek rind û bijare tevda dirav û gewher
 Tijî dar û şinahî çemê mezin têne ser⁽⁵⁾
 Rewşen ji bo bînahî wekî xelat û govder

But bot: xuyaye ku buxt û bot di kokê yekin. Gotan: gotinan. Ditarî: an ku bi
 pîrsê biyanî paş maye. Ol: dîn. Pîr: şêx. Perestî: parêzî. Pêwest: girêdan.
 Mecal: dewran. Hatî navdan: xuya ye biyanî û dîndaran ev nav lêkirî ye.
 Gawan: gavan. Xar: mixare. Şêwe: zarav. Mêwe: fikî. Dilawer: pehlewani.
 Bijar: neqûdî. Bînahî: dîtina çavan. Govder: di rohelatê gundê me daye. Cejn:
 îd. Jiyan: xweşî. Hale: sîwana dewra heyvêye. Eşq: heskirin.

Cihê cejn û seyranê	jiyan û kêf û geşî
Dicle ketî meydanê	têda ber jêr dirneşî
Rengê hale li dewrê	xelek daye dinalî ^(*)
Ji Serhed ji Tewrê	gend û gemar dimalî
Ji bo îşq û evînê	gulîstana geş û şîn
Mane li ber birînê	Cizîrî yû Mem û Zîn
Cihê dîndar û pîran	edîb û tore daran
Dilêr û dese gêran	vejîn dar û bijaran
Rengê melê Cizîrî	mela têda xuya bûn ^(*)
Bi rist û pendegîrî	jîr û zana di rabûn
Huner mend û pehlewana	xudan destûr û dadî
Xwende war û merzeban	Xebat û hîn û şadî
Mîna êla Ezîzan	gelek zana dane pêş ^(*)
Serek dar û berîzan	xudan dek û xudan hêş
Rengê mîrê Bedir xan	ra bû ji ber ne yara
Da kutakî Kurdistan	ber êriş û ber xara
Şêr û gernasê Kurdan	dora xwe tev dane hev ^(*)
Ketin kelat û burcan	dane dijmin bez û rev
Di heşt sed û bist û yek	heya heftê û çaran
Bi sed xap û fen û dek	ra bûne alê Osman
Ditin bi xwe nikarin	bibin ser destê Kurdan ^(*)
Bi Kurda kar û barin	digrin kelat û burcan

Pîran: şêxan. Dilêr: pehlewana. Vejîndar: avakerê welat. Bijar: qenc. Rist: şir.
 Pendegêrî: şîret karî. Jîr: jîhatî. Berêz: ezîz. Dek: xap. Kutakî: xelaskî.
 Gernas: mîr. Burc: asêgeh. Dûv: tîrî. Dest: heval bend. Jan: êşa giran. Ejdeha:
 marê mezin, dijminê ziyanker.

Pîs û xain xapandin	bi mal û zêr û dînar
Doza me da mirandin	bî dûv û dest û kevnar
Eve karê me Kurdan	ji pêşî yê ta niha ^(*)
Ketin ber êş û derdan	ji lew mane bê biha
Nizanim ev çi jane	tenê ji bo me Kurdan
Çi tevdîr û gumane	ketî laş û dil û can?
Heya kengî wiha bin	qê ibretê na girin
Bin darê ejdeha bin	ber şewat û agirin

* * * *

HEKARÊ

Hekarê wek buharê hişîn kirî der û ber
 Bi petrol û bi karê bi kanî yû bi gewher
 Bi derbend û bi laleş kelat û burc û xara^(*)
 Bi bîstan û gulê geş gulîstan û zinara
 Ronî dayî welatim rengê rojê xuyayî
 Di zozan û di latim dibînim bê bihayî
 Dewrê tev mêrg û kanî dehl û dar û şînahî^(*)
 Di ber jêr û di banî bo çav û dil bînahî
 Ma ne bese Hekarê ev berberî, dibendî
 Dakev koh û zinarê ne mîne der nependî
 Dewra dibendî ra bû niha dewra felate^(*)
 Her kes warê xwe şabû xwedî doz û xebate
 Xwedî zar û xame ye dibîstan û xwende war
 Nav û deng û name ye tore dar û dezge dar
 Binê dewra cihanê jê bizane rêz û xet^(*)
 Di vê çax û zemanê kes ne maye bê dewlet

Hekar: dikevi başûrê Wanê. Der: dever, newal. Ber: mêwe. Kar: pitrol. Kanî: maden. Derbend: cihê kûr û teng. Lales: navê Çiyakî ye didariya Yezidiyan. Burc: asê geh. Xar: mixare. Banî: berjor. Binahî: ditin. Koh: çiya. Felat: xweşî. Debîstan: di koka xwe de edebistan: cihê torevanî. Xame: qelem. Name: nav, mektûb. Dezge: ji dest geh hatiye, senet. Binê: binêre. Gerende: meşoke. Balafir: firoke. Pîran: şêxan Jar: zeif, nêxweş. Feqîr: hejar.

Sarûx û top û napal Gerende û balafir
 Va ye dîkin nalenal mayî di nava agir
 Gelê te hê dibêjî werin ber destê pîran⁽¹⁾
 Bila bi minî gêjî li ser jar û feqîran
 Dijmin bi paye darî serî rakî binêrî
 Xuyakî kole darî lat û çîyan bihêrî
 Ê ku diçin buhîştê zana û dezge darin
 Xudanê pars û xîştê her di çola beyarin
 Ê ku dibin tore dar vaye welat dixwazin⁽²⁾
 Tim hazir û bende war li ser doz û daxwazin
 Ew şayestê buhîştin heqe bêne pesindan
 Qencî şûn xwe dihîştin ketin tirad û meydan
 Xudanê şaş û tîzbî ka bê çî dîkin ew?⁽³⁾
 Bi ser hejîn û hizbî bi tew tew û bi çew çew
 Di lîrsînî hejaran dibê qê can otînin
 rengê hov û dewaran pepûk û jar û dînin
 Ji bel razan û xwarin tu tîştî dî nîzanin⁽⁴⁾
 Dibîni qore qwarin heval bendê dizanin
 Ê ku welat dixwazin ewin dindar û rê ber
 Bi peyman û bi sozin bi tevçîr û bi tevger
 Ne mîna zik tilêran dîn daye destê ewbaş⁽⁵⁾
 Dil gemar û qirêlan xistin tayê rî yû şaş

Buhîşt: cenet. Bendewar: ber bend. Şayest: laîq û seza. Heqe: raste. Hizbî: komel, bendî. Pepûk: melûl û bê kêf û xengîn. Jar: nexweş. Ji bel: ji xên. Peyman: qirar, soz. Têvger: liv, xebat. Ewbaş: nezan û pîs. Qirê: qirêj. Waye: wîhayê. Mer zeban: welat parêz. Restegarî: xelasi.

Di bèn maça pî yû dest rê yin bona buhîştê
 Bila bibî kemer best ger çi herî kenîştê
 Nizanin ku ne maye tîştêk ji dîn nizanin⁽¹⁾
 Dîn bo dinê bira ye herdu jî mezrebanîn
 Dewra dîn û şiyarî pevra têne civatê
 Dixwazin restegarî pêşketin û biratî
 Rabe ser xwe delalê mîna berê xuya be
 Deyne kêş û fesalê rengê lat û çiya be
 Cengê giran û dijar berê te pir dane pêş⁽²⁾
 Çilo mayî birîn dar di kortal û der û kêş?
 Nîşanê te xuya bûn di tarîx û mêjuwan
 Ew êrîşê te dab ûn c#ira deng nayê ji wan?
 Ma qey nayî bîra te Qizil baş û Osmanî?⁽³⁾
 Tev hatin nêçîra te di xwstin ser miyanî
 Bi te file dîkuştin da ku ferzend bi binin
 Bê wijdanî dihiştin di nav te har û dînin
 Bi pîlan û bi tevdir bi destê şah û sultan⁽⁴⁾
 Di mayî tu li ber nîr li bin dar û kul û jan
 Herdu bi hev ne yarin li ser te hatine hev
 Hevalê kole darin ne dî ji ber ewan rev
 Te pir dîbû hejarî bi destê Turk û Faris⁽⁵⁾
 Zîyan û bende warî ji destê pîs û caris

Der: dever. Kêş: kaş. Mêjuwan: koma mêjû ye. Qizil baş: ser sor nîşanê
 Elîperestane. File: mesîhî, xuya dibe ku ji felah hatiye. Ferzend: fîrset. Har:
 ser xweş. Pîlan: siyasê, tevdir. Şah: şahê Îranê. Sultan: sultanê Osmanî.
 Hejarî: belengazî. Bendeawarî: ber bendî. Caris: pîs, kirêt. Çaldêran:
 merkeza Hekarê ye dikevi bakur û ro helatê gola Wanê, têda di çerxa
 "16" yanî di "1514" é zayide Kurdistan kete bin destê Turkan piştî ku zora
 Îraniyan birin. Ewbaş: rihgêr, nezan û pîs. Burc: kelat, asêgeh. Xar: şikeft û
 mixare.

Binê di Çaldêranê
Ketin ceng û meydanê

Mîr û begê te yek car
Ewin ewbaş û kevnar

Divê çavê xwe kildî
Zerid û destê xwe hildî

Gelek zana û ser dar
Ji bo gel û ji bo war

Nûrî beg û Fetah beg
Dijmin didane ber şek

Kanî kurê Gulabî
Dijmin tev xistin tabî

Ka Bû daq û ka Ristem
Rengê Guhderz û Dêsem

Dijmin kirin tar û mar
Mixûl û Turkê Tetr

Lê dem ji bo ewan tev
Dewrek dimane ber dev

Herdu ciyan em xwarin
Li ser me darê zorin

Dibê qê tu nabînî
Qe carek xwe nagînî

Osmanî û Sefewî
ka kî sist û kî qewî?

bi navan kirne bin dest⁽¹⁾
bi te ew bûne ser best

berî bidî ne yaran
di lat û burc û xaran

ji nav te bûne pêda
ketin newal û xêda

digel mîrê Bedir xan⁽²⁾
rengê piling û merdan

Zêrîn çengê dilawer?
per çe kirin sera ser

Zênîl beg û Bayezîd⁽³⁾
ketin meydan û cîrîd

birin dar û perîşan
dane ber derd û êşan

carek reş û carek şa⁽⁴⁾
dewrek wezîr û paşa

heya noka em dimînin
dibê qey dil birinin

cihana şîn û ava⁽⁵⁾
xebata kal û bava

War: welat. Xeyd: dehl û devî. Nûrî Fetah di sala "1821" heval bendê Bedir Xan beg mîrê Botan bûn. Merdan: mêran Gulabî di "1422" zayî de Esedidîn kurê Gulabî ferman darê Hekarê bû. Dilawer: pehlewan. Tabî: kortal. Seraser: hemî. Guhderz, Deysem: gernasê kurdê kevnarene. Tarmar: bilawila. Şa: bi kêf. Paşa: ji padişa hatiye. Herdu: Turk û Îran. Dîlêr: mêr û gernas. Hilako: neviyê Cengîz xan.

Guman dikim tu mênî xuya yî - rengê Berzan
 Cihê Kurdê dilênî derîne tirs û lerzan
 Li ser lawê Hilako kurê Cengîz û komir^(*)
 Wek Rustem û Diyako bide ber top û agîr
 Destê Berzanî bigre bi xwaze dîn û dewlet
 Li ser daxwazê bimre bi hêle nav û rûmet
 Mirin carek xuya ye nav û nîşan dimînî
 Roje ronî dida ye xebat û dest hilînî 7

* * * *

Komir: navê bavê Tirkane. Diyako: yek ji çêkerên
 dewleta Médiya bû. Rûmet: şeref.

REWAN

Rewanim cerg û canim ev çi tevdir û bire?⁽¹⁾
 Bi te ger çi xuyanim aî kî bend û nîre
 Bi te ne ser miyanim girêdan û zincîre
 Ne lawikê bavanim ne serok û pezîre
 Bê welat û ramanim êl û gel û kurdanî
 Qedr û ol û jiyanim felat û kamêranî
 Te xistiye milê xwe dixapînî hejaran⁽²⁾
 Na bînî bilbilê xwe li ser lat û zinaran
 Çi daxwaz û çi doze di nava te xuya ye?
 Çi peyman û çi soze te pey ronî ne daye?
 Çi dolab û pîlane wekî pêlê deryane?⁽³⁾
 Çi govend û dîlane çi serab û lêlane?
 Ber pey diçi dinêrî dibê qê av û kanî?
 Bi hafa xwe dilêrî çeleng û pehlewani
 Çi agirê diwar dibê qey tevda xwîne?⁽⁴⁾
 Ji bo te kar û bare bê ronî yû bê tîne

Rewan: êrîvana niha ye. Cerg: gurçik. Bezîr: bijar û neqandî. Raman: armanç
 û daxwaz. Êl: eşîr. Gel: millet. Ol: dîn. Jiyan: xweşî. Felat: rizgarî. Kamêranî:
 bextyarî. Hejarî: belengazî. Peyman: qirar. Pîlan: siyaset. Derya: koma
 derîye, behr. Haf: cem. Dilêr: pehlewani. Çeleng: jîr, sivik. Tîn: germayî.
 Dîrok: ji dîtîyên rojê ra tê gotin.

Kûr û dirêj binêre ku ew tevde şewate
 Kokê kurdî dihêre ger çi di rû berate
 Kok û tarîx û dîrok dixê tayê însanî^(*)
 Ben û hefsar û girtok dixê serê merdanî
 Na hêlê qedr û qîmet ji bo Kurdê birîn dar
 Pend û xelat û şîret ji hev dike tar û mar
 Ger çi sorî nişana ala te ye dizanim
 Gora te tê vedana di navê da xuyanim
 Sorî navek şêrîne her kes pey bawer mending^(*)
 Zerî tê da ne dîne ê bi lat uder û bendin
 Bi koh û deşt û zozan kelat û burc û xanî
 Xudanê kar û dozan dixwazin ser miyanî
 Gewr û keskî bi carek dewra ez nabînim^(*)
 Bo xwe nakî tu karek ber vê ne xweş û dînim
 Çi soriya kokê min tê da ne bî na xwazim
 Winda dibim hin û hin bê tevdir û bê dozim
 Ew tevgera dijminan dîn û welat na bîne^(*)
 Bê nejad û ayînan gulê bê cî di çîne
 Karê ku bê rê berî werî meydan û qadê
 Na bînim tê bawerî di tevger û mezadê
 Kole darê sor û erş ne maldar û ne dîn dar^(*)
 Bi te îro dibû beş divê te bînî ber dar

Însanî: mirûvî. Girok: dav, kelbetan.

Merdanî: mîranî. Pend: şîret. Tar û mar: bilawîla.

Sorî: xwîn rijîn. Ala: bilind, nişana xweserî. Gor: tîrb. Zerî: kurdanî. lat: teht. Derbend: cihê kûr û teng. Koh: çiya. Burc: asê geh. Gewr: yek ji nişana ala me ye. Tevgerî: xebat, liv. Nejad: kok. Ayîn: dîn. Qad: zevî, meydan. Koledar-

Bi xweşî pey nizanî	dibînî qenc û başe
Di tariya xizanî	berê te ber bi kaşe
Pîs û ne çê kirîne	xistin di nav gel û war ⁽¹⁾
Ji daxwazê birîne	kirin jar û birîn dar
Ji lew bûne bir û bêş	pevra dikin ber berî
mane paşî na din pêş	bê tevdir û bê serî
Va ye Daşnaq dibêjin	ê pir cihê Ermene
Xîp û kelem dirêjin	çawa em pey ewlene?
Ji Yûnanê ta qizwîn	berjor berjor dinêrin ⁽²⁾
Suryan berjêr bo xwe dîn	bi dar û sûr û kêrin
Herdu mîna bê ciyan	dixwazin me winda bilin
Em na kin tu hêviyan	çilo em vê du ta kin?
Ermîn kurê Îrece	Îrec kurê Ferîdon ⁽³⁾
Deşnaq çilo lec lece	guman dikim eve xewn
Ger bêjin em filene	ev ayine ne koke
Ger bêjin em kolene	ne kanî yû ne coke
Ger bêjin lawê Kurdin	ev çi çax û çi rêne? ⁽⁴⁾
Xuya ye mîna qirdin	bê welat û bê dêne
Va ye Kurd û Kurdistan	ne noka têne xandin
Kanî navê Hayistan	tu dar û ber ne çandin
Navê kevn û kenare	tev bi zarê Kurdîne ⁽⁵⁾
Nêroz bo me buhare	tê da Ermen ne dîne

zorker. Dibû beş; xuta bû. Xizanî: hejari. Çê: qenc. War: welat, koçer ga. Dabaş. Birîn: qut kirin. Jar: bê kêf. Bêş: parçe.

Kelem: bêjîjîyê daran. Ewle: bawermend û êmîn. Herdu: Suryan û Ermen. Du ta: du parçe. Leç: berberî, cidal. Eve: daxwaza wan. Ayîn: dîn û ol. Kok: esil. Law: kur. Qirdîn: Turkin. Xandin: Kevn: ji beriya koçê heya zanê. Kevnare: ji zanê heya beriya dîrokê çi ku kevnare ji kevn dûrtire. Zar: ziman. Hayistan: Ermenistan. Cistan: ji du pirsan hev bende () Ci: cî (2) sitan: cih ey cih eyhê haldin.

Ev jî wek Israîle dixwazî cî bistînî
 Tevdîra hirç û file di nav me cî dibînî
 Bila herin Hayistan navê ku nû çê kirin^(*)
 Di nav Kurd û Kurdistan divê nê ne cî kirin
 Bawerdikim Hayistan ew jî cihê Kurda ye
 Bi Halida bû cistan niha tarî di ma ye
 Çiqa navê dibînim di nava Kurdistanî
 Ji bel Kurdî nabînim di vî bax û bistanî
 Tev bi zarê Kurdakin berê bûne çend hezar^(*)
 Ne zarê ejdeha kin da pey bibin birîndar
 Ger nejadek ne dirêj tê da heba çir niha?
 Xuya na bî bû qirêj di gund û êl û ciha?
 Navê gund û newala çiya û deşt û lata^(*)
 Zinar û sirt û pala bax û dehl û kelata
 Cobar û cok û kanî keç û qîz û rewala
 Burc û eywan û xanî bav û bapîr û kala
 Bi zaravê bê ciyan mîna zarê Kurdistan^(*)
 Qey dimane ber piyan ya ketin çal û bestan?
 Navê ku nû çê dibin ber ba diçin bê serî
 Winda dibin hin û hin der xebat û xweserî
 Bê cî binav û xapan çawa dibe Kurdistan?^(*)
 Bi law û kal û bavan ew na mîne ber destan

Ji bel ya ji bil: ji xeyn. Zar: ziman. Kurdak: kurdan. Bûn: zana Mesîh.
 Ejdehak: marê mezin, dijminê ziyanker. Nejadek: kokek. Têda: Kurdistanê
 da. Sirt: serjor. Cobar: coka ava baranê ya buharê. Rewal: kur, xort. Burc:
 asêgeh. Zarav: şêwe. Best: newal. nehêl. Law: kur. Ew: Kurdistan. Merdanî:
 mîranî. Maf: heq. Peyman: qirar.

Lewra fikra kurdanî	ronî da ye her derê
Pehlewani, merdanî	va dixwînin defterê
Mafê welat dixwazin	bi dest û çengê pola ^(*)
Bi peyman û bi sozin	ku derxin pîs û kola
Hew dihêlim bi mînin	di Kurd û Kurdistan
Xerzik tê da bi çînin	me bihêlin ber destan
Ey dijminê nav guhêr	dewra te pir ne ma ye
Va ye lehî tê ber jêr	navê te rengê ka ye
Dimalîne qirş û qal	tevda li ber xwe dibe ^(*)
Rengê Ednan û Kemal	ber bi ava ro dibe
Na mîne der welatim	bi pêl û şîpê diwar
Hem bi kar û xebatim	bi jîr û baş û rizgar
Gelê ku sî milyone	di vê çaxa şîyanî ^(*)
Guman neke di xewne	dixwaze kole darî
Bi çend pirsê biyanî	ji binva na be wînda
Bi zor dar û ziyânî	bi pêv û pirsê kunda
Digel vê dewra diwar	ka kî heye nîzanî? ^(*)
Xudan kok û xudan war	bi mînî bê jîyanî
Çep bi zane cihan gêr	ne bê tim tê wîhame
Va ye gelan hêre hêr	dest dibin top û xame
Gelê Kurdî di navê	ji xew rabû ye ser xwe ^(*)
Rengê bahoz û tavê	pîsî dine li ber xwe

Qêrîn û nale nale cihê xwe her dixwaze
 Kurê Cemşîd û Zale li ser daxwaz û doze
 Bi tîp û pirsê vala ji warê xwe neçe der^(*)
 Bi bavik û bi kala bi pitril û bi gewher
 Bi zend û destê pola welatê xwe distîne
 Digêje heyf û tola bi xweşî tê dimîne

* * * *

Guhêr: kirde kar ê ku tiştan diguehê. Qirş û qal: pûş, pelax. Ednan: Menderis.
 Kemal paşa. Ro: çemê mezin, derya. Jir: jihatî. Di xewne: razayîne. Biyanî:
 ejnebî. Dijminê Kurda: wêran kera. Jiyanî: xweşîti. (tîp: herf (xame : qelem.
 bahoz: bayê xurt û dijwar ya pûke (Cemşîd: bayê Ferîdon (zal: bayê Rustem
 pitrol: gaz û mazot (tol: heyf ?

BERZAN

Di 1. 2. 1974. an de saz bû ye

Tu Berzanî, bilindî paytxta Kurdistanî
Gelek şêrîn û rindî hemî bax û bîstanî
Dewrê mêrg û zozanî zinar û koh û latî⁽¹⁾
Cobar û cok û kanî civîn gah û kelatî
Cihê hîn û jiyani dilovanî, şiyarî
Tu dê rengê te nanî di çax û rûzîgarî
Cihê zar û zimanî felat û restegarî⁽²⁾
Divê dewr û zemanî ji bona me diyarî
Ji navê te xuaye Cihê Kurdê dilêrî
Bi te min ronî da ye ji bo min deste gêrî
Dewrê giran û dijwar hatin serê te Berzan⁽³⁾
Bi navê şêrê cengar didêrî tirs û lerzan
Serê xwe ne tewînî ji bo ne yar û dijmin
Bo min evîn û jînî ne hêle pîs û xain
Derîne pate xwaran ker û daşê ne yaran⁽⁴⁾
Ziyan û derd û zoran ser bi jêr û xewaran

-Barzan: dikeve roholat û bakurê Akra di koka çiyayê Şêrandeye.

(2) zar: ziman (restegarî: rizgarî û felat (dilêr:pehlewani.(3) cengar:şer ker (evîn:hekirin (4) pate: parî (ziyan: zîrar (kolar : zorker. (5) çap: aletêderxistina kitêban (pirtok:kitêb (zende ga :chêxweşî.(rikêb: zengo (qad: zevî (berleman: civata bijaran (ser cem: ser:kom.

Xwe firoş û ser hejîn dûv û destê kole dar
 Bê xudan û bê civîn bo ne yaran bende war
 Çap û tîp û xwende ga zar û pirtok û kitêb⁽¹⁾
 Deyne mala zende ga lingê xwe têxe rikêb
 Dakeve meydan û qad ber bi jîn û berleman
 Kok û tarîx û nejad hîn û dîn û ser ceman
 Divê axa cihê te bikin dermanê derdan
 Serek dar û mihê te bo me derîni ferman
 Kêfê dikin hûr û gir ber emrê te naçin der⁽²⁾
 Mêr û jîn û keç û kur dijamin dikin ker bi ker
 Destê Berzanî digrin mafê xwe her dixwazin
 Ya hebûn û ya mirin li ser peyman û sozin
 Zab û Xabûr û Sêrwan bi te govend û dîlan⁽³⁾
 Lat û kelat û meydan cihin bo ceng û pîlan
 Bi te ew pesne darin divê bêne pesindan
 Çiqa koh û zinarin cihin bo şêr û merdan
 Hemedan û Mihabad xokê tene dizanim⁽⁴⁾
 Buhar û Xurem abad kelat û Erdehanim
 Cihê wijdan û dadî mêranî yû xebatî
 Diya Kurdak û Madî roja nû ser helatî
 Ger çi berê paytextin parêz gehê Kurdane⁽⁵⁾
 Îro xudanê bextin bi te ronî didane

(1) mih: mezin (emir: ferman (ker bi ker: parçe parçe ûhûr hûr .(maf:(heq)
 peyman: qirar (2) zab:ji zû ab: av hatiye an ku ava xîzûdiherkênave du çemaye
 1 mezin ji hêla hekarêtê xabûra serê kanî (sêrwa:ji kurdîstana Îranê.(pîlan-
 :tevdîr û siyaseta (koh:çiya (merdan: mêran.

Pesnê te bê jimarîn na yin kitêb û dîfter⁽¹⁾
 Lawên te tev bijarin bo me rêzan û rê ber
 Di roja ceng û lêdan rengê Rustem xuyane
 Di çin ke,at û xêdan piling û ejdehane
 Te navê me bila kir dida dewra cihanê
 Gelê me qenc û şa kir bi xwêbûn û jiyanê
 Te deng da ye cihanê bi gernas û bi zana⁽¹⁾
 Ketî qad û meydanê bi ser dar û berana
 Dilerzînî diyare kelat û koh û tabî
 Dibizdînî ne yara li ber dijmin dirabî
 Te pir cengê dilawer ji bo me kirne pêda⁽¹⁾
 Di kendal û dar û ber di ber pal û di xêda
 Di sala neh sed û neh kurê te yê dilawer
 Ji bo Tirka ne go eh ne hatî ber pî yû der
 Erd û ezman hejandin birayê şêrê Berzan⁽¹⁾
 Ne yarê xwe tewandin na xwaze êş û derdan
 Ketî meydana cengê dike qêrîn û halan
 Dide dîtin qeşengê di gund û êl û malan
 Lê bi destê Suleyman nezîfe lê ne paqij⁽¹⁾
 Kurdê bê dîn û îman jêra di bû qelawiz
 Faris axayê Zibar xuya bû pîs û casûs
 Dûv û destê sitemkar ew jî Kurdê bê namûs

(1) xwêbûn: xweserî(jiyan: xweşî (mêr xas (qad: zevî (koh: çiya (tabî: 1909 an
 de (dilawer: pehlwan şex ebdsilam birayê berzanîkete cegê. (eh herê(der:deri
 190

Girtin birin Mûsilê kuştin bi dar û sê pî⁽¹⁾
 Berê da bax û gulê bi xweşî hêdî hêdî
 Bi daxwazê ne bû şa dima jar û dil bi kul
 Bi fikra hov û şaşa bê tevdîr û pişt û mil
 Di zozan û di Ser hed rengê biirûsk û bahoz
 Şera dînê Muhemed jêra peyman û daxwaz
 Divê êş û neçarî li ser Kurdan hilînî⁽²⁾
 Bilakî xwendewarî ne hêlî dil birînî
 Di neh sed û hejdada şêx Ehmedê huner mend
 Di cî arê xwe dada ketî kelat û derbend
 Bi tevdîr û bi tevger bi peyman û bi soze⁽³⁾
 Wek Rustemê dilawer mafê Kurdan dixwaze
 Êşê digîne dijmin da ji kînê dakevî
 Dimrîne pîs û bê bin bi kom û bend û tevî
 Di mêrge sor û Şêrwan kirin ceng û kirin şer⁽⁴⁾
 Şikandî pîrê Lolan ew cî girtin sera ser
 Ew jî kure ji bo te rengê Berhîm xuya bû
 Lal û durre ji bo te şêrê her du çiya bû
 Di neh sed û bîst û sê dikir qêrîn û halan⁽⁵⁾
 Ji bo dijmin ne go: hê deranîne ji malan
 Ger çi banî firokan dikir nafîn û xumxum
 Mîna gok û gilokan berê topan gume gum

(1) sî yû şeq: di miha sibtesala 1936 an piştî ku şêx ehmed reviya çû turkiye
 berzani dest bi cengêkir (cirdan: guneh karan ya cirdan: xiltan (ew: ew cengên
 ku pêşî dirbaz bûne (2) şew: şev (şape: lehiya herfê. (qubad: kê qubadêkurd
 (qirêlî: qirêjî (qendil: navê çiyakiye dibaz bûye (potin: (8300) pêbilnide dikeve
 bakur bakur û ro helatê berzan. 190

Ne ket dilê wî tirsek	serê xwê qet ne danî ⁽¹⁾
Ne kir gu hê xwe pîrsek	ji dijmin û biyanî
Demek dirêj hejandin	burcê ne yar û dijmin
Bi mêranî tewandin	ji hev kirin ser û bin
Di neh sed û sî û şeş	kurê tê yê Berzanî ⁽²⁾
Rûyê dijmin kirî reş	li ber wî dest hilanî
Dixwestî ser miyanî	ji bo Kurd û Kurdistan
Da ku bikî xuyanî	rengê bax û gulistan
Êl û eşîrê Kurdan	dewra wî xwe dane hev
Rê ne dane tu cerdan	da bazbidin bikin rev
Ne çû serî ev û ew	qeder jêra ne bû yar ⁽³⁾
Di ma tarî dima şew	bê tevdir û kar û bar
Li raserê ne yaran	wekî şape dimale
Şêrê derbend û xaran	kurê Qubad û Zale
Pîs û gend û gemaî	divê cî da ne hêlî ⁽⁴⁾
Tevdira kole darî	kevnarî yû qirêlî
Ketî Qendîl û Potîn	Newaxîn û Xelîfan
Zab û Seîfîn û Şêrîn	burc û kelat û Pîran
Di neh sed û çil û çar	dîsa ketî meydanê ⁽⁵⁾
Berî da ye sîtem kar	qe na xwaze ziyanê
Ewe hîmê Kurdistan	bi pey tînin bawerî
Me na hêle bin destan	zû digîne xweserî

(1) heq: maf(bahoz:bayê dijwar (şer e: şerîl , destûr (peyman :qirar (neçarî belengazi(2) dilawer:pehlewani (bin: kok (3) mîrge sor: gundek ji gundên şêrwan e(pîrêlolan: şêx reşîdê lolan ser:hemî(berhim:bîrahim.

Soz û peyman dida ye ku tev bikî gul û dar⁽¹⁾
 Roje ronî ve da ye dijmîn dikî tar û mar
 Cî bi cî ew distîne paqij dike ew ji pîsan
 Wiha dijmîn dertîne dike bê war û lîsan
 Di sala çil û pêncan arê cengê gur kirî
 dişkîne qeyd û bendan berê dijmîn da girî
 Ketî nava gel û war dibê destê min bigrin⁽²⁾
 berî didn sitem kar li ser daxwazê bimrin
 Dixwaze hêz û himet jî derva û jî hindir
 Bi vê tevdîrê serket di jêr û jor û bakur
 Kom bi kom û lek bi lek jî her derê Kurdistan⁽³⁾
 Bi rext û xincer û çek jî lat û koh û bestan
 Dewrê komin bir bi bir jîr û ser karê Kurdan
 Bi kêf û qedr û xatir ra dîkin êş û derdan
 Rev û hej dane dijmîn Kurdê gernas û cengar⁽⁴⁾
 Winda dîkin hin û hin bend û lîzê segê har
 Lê bi destê Kurdê pîs rengê Reşîd û Qadir
 Bûne hevalê bê lîs dadane pêtê agir
 Xwe firoşê ne yarin pate xwar û daşikin⁽⁵⁾
 Bo me tim bende warin xuya ye kîn û rikîn
 Gelê cihan na bînin xwedê zar û civatîn
 Çilo wiha di mînin bê rûmet û felatîn?

(1) çil û pêncan: di / 25 / 12 / 1945 an de berzanî dest bi cengê kir û bêra ne çû serî
 û da ef çûcem qadî (bend: girê dan(dibê :dibêje. (2) lek: kom (koh:çiya ,best
 ,newal (jîr: çeleng û jîhatî (3)gernas: mêr. (cengar): şer ker (seg:kûçik
 (har)gezo ker (reşîd)
 : şêx reşîdelolan.

Çiqa ku em radibin ku bigêjin xweser⁽¹⁾
 Pîsê me ta ta dibin bi me dikin ber berî
 Dibin yerê dijminan nizanin bê bihane
 Eve karê xainan wekî mar û zihane
 Na hêlin bibne dewlet welatê xwe bistînin
 Timî bin darê minnet pepûk û jar û dînin
 Ne hiştin ku xuyabî berî dida Îranê⁽²⁾
 Da ku dijmin bihabî bi gêjî ser miyanî
 Lê ênîşê merdane dane dijmin di virda
 Serbest û pehlewane Kurdistan û bakurda
 Çi kim dem bê wefa bû bi destê Kurdê kevnar⁽³⁾
 Gelê me bê biha bû ma ye bê jîn û bê par
 Demek li wir didêra pîlan û ser fîrazî
 Wekî piling û şêran bi xap û bende bazî
 di neh sed û çil û şeş partî kirî diyarî⁽⁴⁾
 Kurdê delal û zer keş pey çê kirî şiyarî
 Xap û dekê pir giran li Îranê xuya bûn
 Bende warê hogirin bê qedr û bê biha bûn
 Piştî çûna Mihabad ji deftera kurdanî⁽⁵⁾
 Bê hîn û zafîn û dad destê xwe ber xwe danî
 Bi na çarî ketî şer ji ber Îraq û Îran
 Veşîndarê dilawer na bîne destê giran

(1) pepûk: melûl û reben (jar: belengaz û ne xweş (mêrdane: mîrane (2) jîn: xweş (pîlan: siyaset û tevdir (3) çil û şeş: an ku di sala 1946 an de, komel partîya dîmûkratî ser û ber kir (diyarî: yadigarî, ber çavî. (hogir: hev gir (zer keş: welat parêz (pey: bi partî: (4) mîhabad: ji du pirsan hev bende (1) mîh: mez. (2) abad: ava berê navêpêxemberê hate şandin li bal kurdan ve niha bûye navê bajar

Li ser serê sînoran wekî gawe dide deng⁽¹⁾
 dirake derd û zoran bê guman û bê dereng
 Gava di ku nikarî bê xwarin û nan û çek
 Di wî lat û zinarî bi mînî ber şek û dek
 Berî da ber bi banî di Rûsiya bû mêvan
 Divê hîn û jiyani xuyakî bînî meydan
 Demek bin dest Sofyêt di ma bê qedr û qîmet⁽²⁾
 Deranî bo wî raçêt bi pey ji wir daket
 Di pêncî û heştî da berê xwe da bû welat
 Guez û darê xwe ba da ketî der bend û kelat
 Erd û ezman hejandin deng da dewra cihanê⁽³⁾
 Be cî hemî tewandin dixwazî kamêranê
 Dibizdîne ne yara lat û çiya tîne xwar
 Dilerzîne diyara dimrîne kotek û zor
 Kok û bunyadê Kurdan da ye ber çavê cihan⁽⁴⁾
 Na hêlê êş û derdan nû dike warê Kurdan
 Bi tevger û bi doze ketî qad û mêdanê
 Çekê cengê dixwaze ji her derê cihanê
 Heya hebî di nav me ji dijminan na tirsîn⁽⁵⁾
 Bi xwînî bend û name bi guhdar û bi pirsîn
 Bi vî rengî bi mînî nebî pale heval bend
 Welatê me bi gîrî riya ronî, gul û qend

(1) banî: yektî ya sofyêt (hîn: zanyarî (jiyanî: xweştî (jiwir: ji nav sofyêt (bêncî
 yû heştan: an ku di sala 1958 an (der bend: cihê kûr û teng. kelat: asê geh (2)
 kamêrani: qencî , bext yari (dibizdîne: ditirsîne (diyara:, welat

Delal û rind û ava ji kar û dezge darî^(*)
Bînahiya di çava civata reste garî

Jêra xulam û yarin evîn darin sera ser
Heval û bende warin dikin rêzan û rêber

* * * *

ŞEHRE ZOR – SULEYMANÎ

Şehre zora şîn û ava	tu Suleymanî bi navî
Rengê roj û şewq û tava	roniya der çeşm û çavî
Ez gumanim wek te nîne	der cihanê baş û rind ⁽¹⁾
Roniya rojê dizîne	ji gulên te rewş û find
Te çi qa gernas û zane	tore dar û xwendewar
Şêr û jîndar û tekane	bo welatim bende war
Dane ber çavê ne yaran	feylesûf û rê bijar ⁽²⁾
Ser serê lat û zinaran	tabî û der bend û xar
Her dixwazin ku derînin	te ji destê koledar
Bax û bîstana bi çînin	wek buhîştê nû buhar
Cok û cobarê te şîrin	hingivin şêrîn û xweş ⁽³⁾
Têne berjêr xwe digînin	Dicleya ku coşe coş
Nav çiya û deşt û zozan	hale hal û nale nal
Qê gelo tevdir û dozan	çê dike ya bê heval?
Her der û çol û beyarê	te tijîne pende gêr ⁽⁴⁾
Ber qef û pal û kinarê	te hemî yaqût û zêr

(1) suleymanî: bi suleyman beg hatiye navdan(çeşm: çav (gernas: behlewan (tore: wêje, edeb (jîdar: xudan jîn (bendewar: ber bend (2) bijar: neqanok (tabî: kozik (xar: mîxare, şikeft (kole dar: zor ker (buhîşt: cenet. (3) cobar: coka av buharê ya ava baranê (coş: livandin, ûxebat (hereke). (hale hal: qare qar (4) pendegêr: şîretkar (ber qef: talde (xêd: dehl (qirar: tebat, hedan (5) diyarin: xuyane (mewe: fîkî (vaş: giya (koh: çiya.

Xêd û dehlê te hişînin ji gul û reyhan û dar
 Şaxê dara ser hejînin bê tebat û bê qerar
 Dexl û danê te diyarin fikî û mêwe pirin⁽¹⁾
 Tûtî û pembû li karin ber bi qedr û xatirin
 Sosin û reyhan û lala nêrgiz û vaş û nefel
 Badibin ber koh û pala ber bi banî tûj û bel
 Lawê te hember ne yara radibûne bê jimar
 Destê xwe dane bijara her xuyane kâr û bar
 Mêzeke pîlan û ravê tu dibînî cenge baz⁽¹⁾
 Ber bej û lat û peravê ser bilind û ser firaz
 Mêrî Baban nav û dengîn rê ne dane dijaminan
 Jîr û ser kar û çelengin bende warê ayinan
 Dest bi dest hatin hewara Kurdê bê jîn û hejar⁽¹⁾
 Her di gund û êl û şara bê cî kirr tar û mar
 Ev di pey hev cî sitînin dewletin rengê cihan
 Lê ne xweş û dil birînin mane ber dest û piyan
 Ber ku azadî ne danî bo gel û war û welat⁽¹⁾
 Her dixwestin ser miyanî bê xebat û bê civat
 Ta gihîştî pîrê zane şêxê cengar û dilêr
 Êrişê dijwarî dane dijaminê xeyr û bêr
 Xwe kirî ser dar û paşa her dixwazî niştîman⁽¹⁾
 Tîne cem xwe qenc û başa jîr û şêr û pehlewani

(1) bijara: qencan (mêzeke: binêre (bilan: tevdir û siyasat (rav: nêçir. (bej: ber
 , cihê bê av (perav: kinarê avê (hajar : belengaz, perîşan (beyman: qirar

Neh sed û nozda da rabû dest birî ceng û şeran
 Hemberê inglîz xuya bû tev dixistin şev deran
 Dewra te qêr û heware lê dikomin hûr û gir⁽¹⁾
 Şêrê derbend û zinare kozik û lat û kevîr
 Mafê kurdanî dixwaze ku xuyabî der cihan
 Sund û peyman û bi soze da bi gînî berleman
 di ku hew -karî xuyabî ber şekê Kurdê dilêr
 Her divê ku jev bilabî dakevî kort û şêr
 Ya bidî mafê me Kurdan ya bîmînî der mezel⁽²⁾
 Xwe ne kî wek Turk û qirdan pîs û murdar û çepel
 Ger wihakî hew dirazî nabî xort û ser miyan
 Lê bi xap û hîle bazî danî tevdir û guman
 Her divê razîkî Kurdan da neçin lat û zinar⁽³⁾
 Dest nebin top û tîfingen ra serê der bend û xar
 Rabû fermanek deranî bona Kurdan xweserî
 Hêzê xwe ser me hilanî hew di kêşe ber berî
 Şêxê merdan di rakir bir bû Hindê anî vir⁽⁴⁾
 Ew bi ser xwe bûnê şa kir agirê me kirye gur
 Kir xudanê hêz û leşker dewlet û koma bijar
 Jêra danî lîz û tevger pêle kî bû bendewar
 Neh sed û bîst û şeşada dest birî top û tîfing⁽⁵⁾
 Agirê pevçûnê da da ser serê lat û ziving

(berleman: civata bijaran)

(1) di: inglîz dît (jev: ji hev (maf (heq) mezel: goristan (çepel: gemar (2) lat: teht
 (xar: şikeft û mixare (3) merdan e: mêrane (hez: huner (bijar: wezîr (4) neh
 sed: an ku di 1922 an de hate berdan û 1926 ande dest bi şerkir (ziving: şikeft
 (derî: berde (qirdan: turkan (5) sî: an ku di çirya bêşînde sala 1930 î de heya 13
 de 6 gulani şer bê inglîz û irgêra dikir 1931

Ta ku dijmîn mafê Kurdan
Can û dil da rengê qordan

daye dîtin bê derî
her dixwazin berberî

Lê di sala neh sed û şî
Pîrê zane maye bê cî

pirs û gotin bûne vir^(*)
nû ve bûne qal û qir

Carekî din dest bi cengê
Her divê jîn û qeşengê

kir ji ber zor û ziyan
bo welat û nîştîman

Lê felek çep hafî danîn
Lew ji meydana deranîn

tev dimane bê xudan
kirin destê bê binan

* * *

SENEN DAC – SENE DIZ α

Senen dacê binêre dewrê girani û dijar
 Li ser te hêr hêre bê texmîn û bê jimar
 Heye hezar û neh sed tu bin darê zihayî⁽¹⁾
 Gelê te maye bê ked tu bê qedr û bihayî
 Rêjîma şahê kevnar koreş heya pehlewî
 Tu hiştî ber şek û dar digel vê qet na tewî
 Ji Senen û kelatê tu hatî tev Senendac⁽¹⁾
 Ketî ar û şewatê Bi şaşik û rî yû tac
 divê destê xwe rakî maf û xame bi xwazî
 Delal û rind û çakî bi peyman û bi sozî
 Ne mîne kunc û qozî melûl û jar û bê çar⁽¹⁾
 Bi daxwaz û bi dozî bîmrîne kotek û dar
 Destûra şanişaha bê nîzam û bê destûr
 Digel tac û kulaha ji warê bike dûr
 Payî texta Kurdistanî berê Îran û paris⁽¹⁾
 Cihê hîn û jiyani derîne pîs û caris

(1) senen dac: ya sne diz ji sinan ku ser tîre û diz: kelate ya Senan navê ferman
 darekî kurde ji Sasani hatiye çî wiha û çî wiha berê bigir heya niha tê gotin:
 barêzgeha kurdan (ked: kar ûkesp (rijem: qanûn (şah: ji şahîha tê hatiye 197

Parêzgaḥ û penahî bi zanîne xuya be
Civîna keyf û şahî ji bo Kurda kulabe

Bi xweşî dest hilîne bi gernas û şiyara⁽ⁿ⁾
Cihê derbê bi bîne di canê kole dara

Niha dewra xebate ne ya xewn û temarî
Ser xwe bûn û felate ziman û restegarî

* * *

ÇEND CIHÊN KURD TÊDA CÎ DIBIN

Were Kurdê sitem bar cihê xwe tu bizane
 Ketî ber payê zor dar mîna hirç û gurane
 Gelê te bê felate civîn gah û dibîstan⁽¹⁾
 Bê tevger û xebate li bin darê destane
 Ji lew jar û ne xweşe birîndar û melûle
 Kul û derdan di poşe tenê bê ser miyane
 Tenê bê tîp û xame xwendegah û kitêbe⁽²⁾
 Sera û çap û name civat û berlemane
 Ji xeynî şaş û tizbî ne dî carek şiyarî
 Zîrar û bende hizbî ji bo wî tercimane
 Ji dewra ol perestan mela û şêx û sofî⁽³⁾
 Diz û ser xweş û mestan xulam û dergevene
 Hejarê dîn û hare qeder jêra ne yare
 Bi qêrîn û heware dibê rabe emane
 Dibê rabe derenge xudanê dîn û wijdan⁽⁴⁾
 Li ser te herb û cenge dema şêr û berane

(1) sitem bar: zor lê hati (mîn: wek (felat: xelas (tevger: livandin melûl: bê keyf
 (dipoşe: li xwe dike (2) tîp: herf (xame: qelem (xwendegah: cihê xwendinê (çap:
 derxistoka kitêban (name: mektûb û kitêb

Dema doz û xebate	tifing û top û leşker
Gel û jîn û berate	welat û nîştimane
Evim ez min bibîne	bi rindî, ser bilindî ⁽¹⁾
Ji tarîxê derîne	eve bo te jiyane
Ji bo ta nav û denge	hevgirtin û hevalî
Ne bêje hê derenge	berq û birûsk vedane
Ebu cisre Erarat	Eran û Erdebîl
Tijî dar û tijî lat	piling û pehlewane
Alaşgird û Ehmadî	Melaz kurd û Elaştir ⁽¹⁾
civanê hîn û dadî	edîb û jîr û zane
Erenca, Erzirûme	Enadol û Emanos
Esîrê hirç û bûme	xwedê nav û nîşane
Egîn û Çemçemale	Orman û Şewntir ⁽¹⁾
Gelek xweş û delale	gula baxê cihane
Ereb gîr û era kis	Esed abad û Urmî
Gulab û pirsû paris	Xelat û Erdelane
Gelek şêrîn û rindin	tijî bax û buhîştin ⁽¹⁾
Rengê çirax û findin	ji bo me ro vedane
Biro Cirdo bihistî	Cerîr û çole mergin
Xwedî zarê buhîştî	çikim para dizane
Ciwan rod û Xelîlan	Xurrem abad û Dênûr ⁽¹⁾
Xurasan û Heîlan	Kevan û şehre bane

(1) Erarat: çiyayê agirî (eran: kekûk (Erdebîl: dikeve azir beycan, Alasgird: dikeve ro ava û bakuerê qere kosê (melaz kurd: dikevi bedlîsê. (elaştir: dikevi ro ava û bakurêloristanê erenca : kerkûk (emanos: nizîkî çenê halîsê (2) egîn: di bagîr daye oramnos: nizîlî çemê halîsê. xozistanê (dulab: dikeve ro avyê îranê jêra tégotin: kurdîstana farîs (biro cird: werîgurd (bihîstî: dikeve elezîzê.

Rawendiz û rewan ser	Sine xerpût û Selmas
Kelat û Wan û Govder	Sxur û Erdehane
Qerej dax û Şeref xan	silvan û Bişêrî
Sibistan û Ferahî	rewan û aspihane
Ji kevnare dizanim	cihin bona me Kurdan ⁽¹⁾
Bi vê ne ser gumanim	ne noka tê dimane
Cihê doz û xebatin	ziman û tîp û xwendin
Tijî koh û kelatin	gelek giran bihane
Herîr û Zab û Zara	Zihab û Senger û Cam
Dihok û Miks û Dara	Herran û Deylemane
Merax û Mûş û Bedîs	Miya Farqîn û Mereş
Qizil êrmak û Teffîs	Zinar û Mergewane
tijî pitrol û karin	gul û ryhan û kanî ⁽²⁾
Ber û mêwe û barin	li ser daran xuyane
Ezir baycan û Erbîl	Sirûc û Qesrê Şêrîn
Merend û Surek û Zîl	Egîl û Karibane
Hekar û Meret û Sincar	Qere çox û Melatî ⁽³⁾
Heleb çe Sind û Berwar	Şîraz û Lahîcane
Kela şayîn û Gêlan	Kela Harûn û Kurman
Celewla, Tor û Xêlan	Hero Mazinderane
Bera dost û Nisêbîn	Qere şehr û Til Ermen
Bitan û Bab û Qizwîn	Nifat û Kurde wane

(1) sibistan: scisan (ferah: herdu dikevin sultan abdê (rewan: êrîvana niha ra tê gotin (noka: niha (tip: çiya (kelat: asê geh (2) herîr dikeve hewlêrê (zara: navê bajarekî kurde dikeve îranê (Miks: di hekarê daye (heran: dikeve naêna riha û ri qaye di koka xwe da haran bû navê biraye birahim evîn darê xwedêwer geradine û kirine heran (merax:ji hêlên kurman şahe (qizil êrmaq: haliste (tiffîs: dikeve ro avayê berze e(mergewan: nizîkâ çole merge (3) Sirûc: di ro avayê bêrecûk mert: nizîkî îşno ye (lahican: di başûrê îşno daye (kela şayîn: dikeve bakurê rayit (hero: dikeve loristanê ?

Kilîs û Meşhed û xwê	Xinûs û Kehrê Dwûd ⁽¹⁾
Riha û Balik û kwê	Sîwan û Zerdelane
Tijî gewr û şepalin	gulî sor û çelengin
Rewal û xort û zalin	giran û bê bihane
Rumêlan û Nihawend	Sultan abad û Ercan ⁽²⁾
Qere bax û Demawend	Erûx û Bacîlane
Zeradeşt û pilingin	Kişan û Qers û Erciş
Cê bax çûr û Ezirgan	Sîwas û Xalîkane
Elîştar û Diyala	Ciwan şêr û Qezanî ⁽³⁾
Hezar û las û kala	buhar û balîkane
Terebzûn û Xurato	Berz gurd û Şemarnik
Hemedan û Civato	Terîz û kalîvane
Qere qoçan û Dêrik	Erad û Feyd û Entab ⁽⁴⁾
Gelî goyan û hêrik	di bin darê dizane
Ji destê dîn û hara	derîne ey huner mend
Bixe destê bijara	pezîr û qehremane
Ne mîne jar û bin dest	perîşan û belengaz
Xuyabe jîr û ser best	li ser lat û çiyane
Hilîne dijminê har bi mêranî, şiyarî	
Bibe aza û rizgar ji bona te jiyane	

(1) Bitan: bajarekî piçûka dikvehêla heranê (nîfat: tor abidîne kurdewan kurdewîn dikevin her çemê arsê/sîwan: di ro helatê sêraçûr daye (şepal: sipêhî (rewl: kur (zal: ser dest (nihawend: dikeve jêrê hemedanê (2) qere bax: dikeve gurgistanê (demawend: dikeve îranê(erox: navê kelatekî ye (bacîlan: dikeve xaniqînê(pilingan: dikeve Îranê.

(3) elîştêr: dikeve loristanê (ciwan şêr: dikevezenge zorê (qezanî: dikeve mendelî (buhar: paytexta kurdistanê yedi çaxin bûrî de dikeve baurê hemedanê (balikan: dikeve rewandiz ê (4) har :serxweş(bijar: qenc û neqandî (pezîr: hêja,baş (perîşan :şepirze (rizgar: ser best.

HIN CIHÊN DÎN

Ez birîn dar û ne xweşim ber cihê xwe bê guman
 Jan û derdan her dinoşim bê welat û niştêman
 Lew ketî destê ne yaran ber bi wêranî diçe⁽¹⁾
 Merkeza dîn û dewaran parsek û xwar û liçe
 Ber bi te qêr û heware jîn û azadî divê
 Her timî ew bende ware kok û bunyadî divê
 Xîret û wijdan û rûmet her dixwazî bînî pêş⁽²⁾
 Dad û şîret, dîn û dewlet hîn û zanîn, bîr û hêş
 Her wekî xelkê cihanê ala deynî ser milan
 Tîp û pirtok û zimanê xwe bikî baxê gulan
 Xwende gah û xwende vana çê kî ser best her bijî⁽³⁾
 Bend û girtok û kevana hilweşînî her tu bijî
 Kevne karî, hebs û زندان têxî warê dijminan
 Şerme zarî, qeyd û bendan berdî payê bê binan
 Heyf û tola pehlewana tu bi gurzê Ristimî⁽⁴⁾
 Doz û armanca berana zû xuyakî her timî

(1) dipişim: li xwe dikim (niştêman: ji du pirsan hev bende /1/ nişte:zevî /2/
 man: em an ku welatê me (lew: lewra(wêran: xopan (merkez: kûnger (liç:bi
 ali xwehr (jîn:xweşî (bunyad: kok (2)rûmet: şeref:(dad:edalet.(hîn: zanistî: (
 pirtok:kitêb (3) gah: cih (bend:girêdan (bin:kok (armanc: tevdîr û daxwaz (4)
 nemran: şehîd (qad: zevî, meydan (qirdan: turkan (5)mujde: mizgîn .(jar: bê
 keyf ,zeif(hejar: belengaz.

Hêviya nerranê kurdan	bînî qada niştiman
Ku bi destê pîs û qirdan	çûne mane bê guman
Mijde û mizgîn û şadî	çêkî bo jar û hejar ⁽¹⁾
xweşî yû destûr û qadî	deynî baxê kurd û war
Min bi çave xwe bibînî	ku dinalim her zeman
Bin pîyê bê cî derînî	ev ezim Kurdê xîzan
Tarim û bisdaq û Botan	Zenge zor û Xaniqîn
Bêder û Bilwar û Gotin	Xeftiyan û Dergizîn
Dimdim û zozan û Şernax	Tawîq û Mexmûr û lar ⁽²⁾
Sore burd û Gence Rîstaq	Gurdewên û Haşîmar
Harim û Zengan û Araş	Mahî deşt û Zarikan
Zerde koh û Mûk û Laxaş	Mahê Besrê Herweman
Erzen û Elwend û Gurgan	Ser hed û Xerzan û Çan ⁽³⁾
Aşkela, Lêlaq û Leylan	Maden û Derbendî xan
Çaxir û Amûd û Mêrdîn	Bayezîd û Berde e
Dasin û Derteng û horîn	Baziyan û Berze e
Gir kevir, Zirgan û çermûk	Qemesîn û Zêmirî ⁽⁴⁾
Bakin û Dokan û Termûk	Pencewîn û Kagiñ
Textê Cemşîd û Suleyman	Babexîş û Erxiyan
Ez bek û bayê burt û şewan	Kaşiwan û Haliman
Halîs û Dinar û Wizne	ok seford û Baxilan ⁽⁵⁾
Erxen û Xizxêr û Xizne	Şehrîyar û Samîxan

(1) bisqad: dikeve hêla Azir bayêcan (zenge zor:dikeye Erminiya. (bêder:bêde ebas dikeve îranê (bilwar:di jêrê sine deye (xeftiyan: Rawindizê daye (dergizîn: dikeve hemedanê. (Dimdim: navê kelatekî bi nav û denge (zozan (navê cîkiya di nabêne mosil û selmas da ye. tawîq:li cem kefrê ye (mexmûr: di îraq daye (lar: di îran da ye. (sore burd: di zencanê da ye (gence:di bedlîs da ye(rîstaq:dikeye jêrê şemdinan (gurdewîn: bajareke li ser çemê Arase(haşîmar: di hêla lolo da ye (zengan(navê herêmekî kurdiye dikeve bakurê îraqê û navêbajarekî ye di nabêna Qizwîn û tebrîz da ye. Araş: dikeve Erminiya. Mahê deşt:dikeye kurman şahê(zarikan: dikeve şewan gara (zerde koh:dikeye baxtiyarî (2) çan: dikeve cê bax çûr e (aşkela: dikeve bkurî Erzîrûm. berze e: dikeye ro hate tîflîsê (3) qermesîn: kurman şara tê gotin. termûk: dikeye nabêne Mko û Hekarê(zêmirî: parêzgâha Lolo ye kevne. (4) halîs: qizil êrmaq e (wizne: dikeye îranê (şehrîyar:mizîkê esfîhan e(adyeman: dikeye başûrê meletî (nexciwan (dikeye erminiya.

Adyeman û Nexciwane
Sorpelak û Balîkane

Nexşê Ristim, Mukrîyan
Şemdinan û Girdiyan

Koh û deşt û burc û terhan
Pişte koh û Kêş û Tercan

sos û kirkar û çinar
Ebher û Zilm û Çihar

Bismil û Çatax û Dîze
tengûş û Qelp û Huwîze

Çat û Tikman û Kemax⁽¹⁾
Dewr û Bayiqan û Şetax

Raniye, Kê kûr û Bako
Pijdar û Kaşan û Mako

Bêre cûg û Solexan
Êstil û Çal û Keban

Gumrik û Laxab û Lara
Tertum û Tewrêz û Bara

Nafişan û Sofiyan⁽¹⁾
Erxewan û Qertelan

Ev hemî tev bende warin
Her ji te ew hîvî karin

da bigêjin xweserî
ser xwe rakî ber berî

Rengê Kawe dest hilînî
Dijminan nav xwe derînî

xwe bigînî kê Qubad⁽¹⁾
bînî dewrê Kurd û Mad

Her wekî Rustem xuyabî
Mîna şêr û ejdeha bî

ser serê lat û zinar
jîr û ser best û şiyar

Xwende gah û xwende war
Dezge û pitrol û kara

pirkî nav warê delal⁽¹⁾
kaniyên rind û şepal

Bîr û ramanê bijare
Tevger û tevdîr û çare

yekî û dil paqijî
min ne noka ew mijî

Nû xuyake bîne dewrê
der kelat û rêl û tewrê

Kurdê gernasê cihan⁽¹⁾
cî gehê bav û diyan

Hingî zanim tu bihayî
Rewşen û roj û çirayî

lawê
raste

Daryosê zer
ronî perwer

(1) kohê deşt: navê cîkî ye ji bo koçeriya zivistanêye (terhan : ji wekwiye dikevin pist kohê loristan (sos dikeve xozistan ê(çinar: dikeve Diyar,bekir (piste koh: ciyayên (sos: dikeve xozisan û esfehanê (kêş: dikeve sicistan ê (ebher: dikeve na bêne qizwîn û hemadn ê.

DAWÎ α

Ev hemî tev der gumanê Min bi xweşî dane zanê Ger bi kêmanî xuyane Min ji dûrî lêkvedane Gund bi gund û êl bi êla Ber çern û derya û pêla Ez dibînim bê hevalin Zare zar û nale nalin Mane bin destê ne yara Dûv û destê kole dara Ez bi huşyarî ne çû me Xwe didî ber ar û dû me Tê ra zor darî dibînim Her divê ku xwe bi gînim Ger bi çûma sed kitêban Min ji bazdan û rikêban	hetine bîr û hişim bê rik û bê qayişim lê bi bûre Kurdê baş⁽¹⁾ ma me der kortal û kaş şar û bajarê welat ber qef û koh û kelat der cihanê dîl û jar⁽¹⁾ bê tebat û bê hedar bê cih û bê dewletin tev ji dûrî rê ketin dîtina warê bilind⁽¹⁾ pêşîya min mûm û find dil disozî bê jimar jîr û gernas û bijar ne dixistin rû pelan⁽¹⁾ derd û êşa û xer gelan
---	--

(1) qayiş: berberî (lê kvedan: bîr anîn.(sar, bajar(derya: behir,qef, mîna,talde,dîl, bindest,jar,nexews.hedar:hedan,tebat.mûm,çira sima,xergel, koma keran,bend: girêdan: tê di welat,kezeb, ceger(ber: berê xwe.xar: mixare, sikeft.

Dane ber çavê cihanê	pêşiya zanê emin
Ger çi ber nîr û mijanê	girtî û bend û gemin
Ejnebî hatin bi zorê	tê dimane bê sebeb ⁽¹⁾
Ketne bax û deşt û torê	êşê da can û kezeb
Bê hişî rabûme ser xwe	ber didame burc û xar
Çar kinarî dame ber xwe	lat û der bend û zinar
Agirê canê birîn dar	gur bû ket laş û tenim
Ber ziyana Kurdê bê par	bes tunîne nû jenim
Ez ne gura mêjo vana	Fêlesûf û xwende war ⁽¹⁾
Tême meydan û civana	ser bilind û bende war
Lê ji ber jana dilê xwe	dest birim tîp û qelem
Bax û bîstan û gulê xwe	kir me wek baxê îrem
Hê sedî min yek ne gotî	tîştê ku dîtin welat ⁽¹⁾
Can û cergê min di sotî	ma me bê kar û xebat
Ket me kendal û diyara	lat û der bend û çiya
Hêrik û deşt û zinara	dehl û mêrg û kaniya
Ka çi dine çi xuyane	çi di şûne hiştine
Çi gehe bav u diyane	tev ji dozê xiştine
Dane ber top u tîngan	dijmine zor û xidar
Hiştine kortal u tîngan	pehlewani u toredar
Bê cî hiştin Kurdê Manî	lawê Daryoş û Qubad ⁽¹⁾
Tê da danî ser miyanî	rakirin wijdan û dad

(1) ten: las, gewde (ziyan: zarar(nû jen: tîştên nû wek dezgedarî zanyai. û abûrî ,pêşktin ,maden ,pitrol ênêdin (tîp :herf (cerg: dil û gurcîk. (2)kendal: newal û kortal.

pate: pari (jiyani xwesîti (vî: vikiêbî (dîl bin dest (hejar : belengaz.

Jê me jê mame di çolê	ew dixwin pitrol û kar
Hatine min destê olê	rêçikên jev tar û mar
Bû me kole ber xizani	xwe firoş û pate xwar ⁽ⁿ⁾
Ser hejîn û bê jiyani	kevniî, lêdan û zor
Vi hinek jê dane dîtin	bo gelê dîl û hejar
Ê di mayî ber kiltin	mane destê kole dar

Pê Gistok

awirek di jiyana Mela Ehmedê Palo	
gera Welat	1
bersiva welat	3
gera gelê welat	8
bilbilê xemgîn welatê şêrîn	14
cihê min ber dida xwîne	17
hêlek ji kurdistan	18
dengê bê gazî	20
rojek bê wijdan	23
gundê bê wijdan	26
diçim hicrê berî nadim dê	28
bela begar	34
medresa pîrê geroke	36
bin destî ya kur û dê	39
welatparêzî	42
welat	44
Evîna welat û digel xwîna nemiran	47
diya welat	49
kurê welat	51
bindestiya kurê mezin	57
tevdîra bê nejadî	59
kurê diwan-2-	62
kurê siyan -3-	67
tevgera xainan	71
kurê çaran	72
kurê pêncan	74
dîna warê bilind	77
Firat	83
Dicle	92
Palo	99
Dîtina Palo daxwaza mine	104

hin çiyayên kurdistan	107
Erarat?	109
Dersîm	112
Diyar bekir	123
Mihabad	128
Palo	138
Cêbax çûr	142
Ezirgan	145
* Xarpût	149
Melatî	153
Dersîm	156
çiyayên Dêrsim	160
ÊLêDERSÎM	162
Erzurûm	164
Mûş û wan	169
Bedlîs	172
Dûrkirina çend mezinê Bedlîsê	176
Sêrt	178
Mêrdîn	182
jina zor baz	186
mirovê birîndar	187
heciyê bê his	189
Riha Urfa	192
Antab û Mere's	196
Kilis	199
Cizîr	201
Hekarê	205
Rewan	210
Berzan	216
Şehrezor	225
Senen' dac – Sine	229
çend cihên ku kurd tê de cî dibin	231
Hin cihên din	235
dawî	239

DERSÎM



kelat û koh û xarî
felat û restegarî
rexî dî kort û çarî^(*)
tev hêrik û newalî.
bi nav û deng xuyayî
çilo tu bê bihayî?
ne mîne jar û bin dest
bi be zana û ser best.
xuyabî wek Diyako^(*)
kurê Tor û Hilako
ta bigêjî Kemaî
hilîne pîsî, talî.
ji komie hatie der^(*)
divaya kund û nû ker
ji lawan kirne vala
ketin destê decala.
tijî xort û tijî nas^(*)
egîd û mêr û gernas
li ser dirbaz dibûne
goştê laşim dicûne.

Derê zîvî ji bo min
Herro hîvî ji bo min
Alîkî nêrdewanî
Xuyayî ber bi banî
Ji dewra pêşyan tu
Kanî niha mayî ku
Bese bo te temarî
Bi xwaze restegarî
Dizanim ku eger tu
Dikî dîl û Geber ru
Kurê cengîz û temûr
Ji warê xwe bike dûr
Gelo nabînî derban
Ziyan û êş û kerban
Dez û eywan û xanî
Der û bîstan û kanî
Çemê Menzûr bi xwîne
Sore di nav me dîne
Heya kirin wekî pir
Bi dîn û ol û axir